


Abdulreqîb Yûsuf

Hunerê Tabloyên Şerefnamê



JN Weşanên Jîna nû

Weşanên Jîna Nû: 24
Beşê hunerî: 1
Çapa Yekem: Tebax 1991

© Hemû mafên tabloyên di vê pirtûkê de parastî ne. Bê îzna Jîna Nû li tu derê bi tu awayî nikarin bîn çap kirin.

Navnîşan:
Jîna Nû Förlaget
Box: 30
740 22 Bälinge-SWEDEN

Postgiro: 503799-9

ISBN: 9188054-047

Abdulreqîb Yûsuf

**Hunerê Tabloyên
Şerefnamê**

Wergêr: Elîşêr

JN Weşanên Jîna nû

NAVEROK

Daxuyanîya Weşanxanê.....	9
Hunerê Tabloyên Şerefname.....	11
Tarîxa Dawî ya Nivîsandina Şerefname.....	18
Destxeta Nusxayê.....	19
Nusxa Şerefname ya Yekemîn.....	21
Tabloyên Şerefname.....	26
Ev Tabloyên Han Karê Kê ne?.....	40
Tablo û Rîya Hunermendîya Hunermendê wan	45
Tabloya Yekem - Menzereke Nêçîrê li Hekarîyê.....	49
Tabloya Diduyan - Dagîrkirina Kela Dêzê.....	52
Tabloya Sisfyan - Amediyê.....	56
li Tabloya Çaran - Dibistaneke Nexweşxanê û Bizîşkîyê.....	59
Dêmena Duduyan : Lîstika Qaşwanê.....	62
Tabloya Pêncan - Cizîra Botan û "Mem û Zîn".....	64
Tabloya Şeşan - Meclisa Mîrê Botan	70
Tabloya Heftan - Kela Hesenkêfê	72
Tabloya Heştan - Bajarê Hesenkêfê.....	73
Tabloya Nehan - Kela Egilê (Gêl).....	74
Tabloya Dehan - Cardin Egil.....	77
Tabloya Yanzdehan - Bajarê Hîzanê.....	79
Problemeke Avasazîyê.....	80

Tabloya Donzdehan - Hîzan.....	84
Tabloya Sêzdehan - Nexweşîya Demargirîyê (Esabî-Sinîr) Çareserkirina Wê Ya bi Dua.....	88
Tabloya Çardehan - Abloqa Kela Bedlîsê ji Alîyê Akko yunluyan ve.....	90
Tabloya Panzdehan - Meclisa Şerefxanê Bedlîsî.....	94
Tabloya Şanzdehan - Şah Tehmasb li Bajarê Xelatê.....	99
Tabloya Hevdehan (Beşa Yekem) - Sultan Osman.....	103
Tabloya Hevdehan - Beşa Diduyan.....	105
Tabloya Hejdehan - Şerê Edirneyê.....	109
Tabloya Nozdehan - Sultan Mehmed Fatih û Stenbol....	111
Tabloya Bîstan - Şerê Çaldiranê.....	114
Perawêz.....	118

Daxuyaniya Weşanxanê

Ev pirtûk ji lêkolîneka du beş a Abdulreşîb Yûsuf pêk tê. Beşê pêşîn ê lêkolînê di kovara Rewşenbîrî newe, hejmarên 116 û 117'an a sala 1988'an de hatiye girtin. Beşê duduyan ê lêkolînê berê nehatiye çapkirin. Wergera wê ya ji zaravê Soranî ji alî Elişêr hatiye kirin.

Nivîskarê lêkolînê bi xwe li hember awayê reş û spî yê tabloyan ev lêkolîn amade kiriye. Tabloyên rengîn ji alî weşanxana me ji Biblioteka Bodleian a Oxfordê hatine stendin.

Loma jî di hin ciyan de li ser binavkirina rengên tabloyan hin şaşîti ji bal nivîskar hatine kirin. Me carna vê yekê di nav parantêzan de rast kiriye, lê hin caran jî me qet dest nedaye wan. Loma di tespîtkirina rengan de divê xwendevan tabloyan esas bigrin.

Jîna Nû

HUNERÊ TABLOYÊN ŞEREFNAMÊ

Mebesta me ew nîne, ku di vê nivîsê de behsa kitêba Şerefnamê bikin û bêjin; eva han, di sedsalên borî yên me de, girîngtirîn berhem e di warê dîroka Kurdan de û heta niha ew hatiye wergerandin zimanê Tirkî, Erebbî, Rûsî, Elmanî û Kurdî Lê, em dixwazin di vê maqalê de behsa wê nusxa Şerefnamê ya ku bi destxeta pîroz a Şerefxanê Bedlîsî bi xwe hatiye nivîsandin û her weha wê wêne hunerîya ku di wê nusxê de ye, bikin. Armanca min a serekî bi destxistina vê nusxê, bû ku di Kitêbxana Bodleian a Oxfordê; di bin reqema 312'an de bû, bi taybetî wêne hunerîya ku tê de bû. Min wergirt, da em bikarin aliyê wê yê hunerî bikolin û heta hinek alî û milên taybetî yên hunerê Kurdî tê de bibînin û bikin kevirekî ji bo danîna hîmê nivîsandina dîroka hunerê Kurdî. Bi kêmasî ev panzdeh sal in, ku ez li ser vê mijara hêja difikirîm, heta babetên wan wênên li Kurdîstanê û di nav wan kitêbên bi destnivîsî de, yên ji aliyên hunermendên xelkê Kurdîstanê ve hatine çêkirin, vêca êdî çî yên qirnê navendî yan yên piştî wan bin. Ji ber vê yekê pêwîst e, heta wênên li ser kevir, dar û madenan jî hatine kolan, em bixine ber pençe lêkolînê. Encama van karan dikarin bibin pêkanîna hîmê hunerê Kurdî.

Me cara yekem li ser dîroka hunerê Kurdî, ev bîr û melhezên xwe berhev kirin û di kitêba xwe ya bi navê "*Bangewazek Bo Ronakbîranê Kurd...Le Pênawî Kokirdnewe û Zîndokirdneweyî Keleporî Netewayetîman de*" çap kirin, bi awakî firehtir û di behseke taybetî de bi navnîşana "Hunerê Wênekêş û Dartaşîne Kurdî", di rûpel 102-122'an de, min behsa van babetên şaristanîyeta keleporê netewa me kirîye. Di kitêba "Hedaret el-Dewle'l-Dostkîye..", di cilda duyem a ku di sala 1975'an de çap bûyî, min behsa van hunermendan kirîye; wênên hunermend Mîhranê kurê Mensurê kurê Mîhran, hunermend û endazîyarê mekanîkî Bedî'uzzeman kurê Îsmailê Cizîrî ku bi navê Ibnu'l- Rizazî el- Cezerî(1) hatîye naskirin. Van herduyan di sedsala şeşê koçî (donzdeyê zayînî) de hunerên xwe li navça Dîyarbekrê xistine ber çav (Ibnu'l-Rizaz, nêzikî du salan ji sedsala heftan jî jîyaye), min ew wêne di nav kitêba sitêrnasî "Suretu'l Kewakib el- Semanîye We Erbe'in" a Ebu Hesen Ebdurrehman Bin 'Emeru'l-Sofi el-Rizazî, ku li bajarê Mêrdînê hatine durust kirin, di havîna sala 1977'an de li Kitêbxana Silêmanîyê ya Stenbolê dîtîn. Wênên Encîl Tifole Yeso'e ku li Floransayê ne, di sedsala sêzdehan de bijîşkekî xelkê Mêrdînê durust kirine. Di vê kitêbê de me bi çewtî Mîrê Bedlîsê Şemseddîn Bin Dîyaeddî-nu'l-Ruşkî, hunermend daye naskirin, ku di rastîya xwe de di wênên kitêba bidestnivîs "Menafi'i el-Heywan" a Ebdulle Ibn Bextîşo'yê bizîşkê Dewleta Dostkî ya Kurdî dane, wênekêşê Kitêbxana Murgan li New Yorkê ew nîne, ji ber ku li ser kitêbê "bi resim Şemseddîn Bin Dîya el-Ruşkî" hatîye nivî-sandin û ji derveyê vê ketîye kitêbxanekê ya sedsala panzdehan, ku wî çaxî birek hunermend ji bo Sultan Mehmedê Xazanî yê Hulago wêne çêkirine.

Me di kitêba "Bangewazek..." di rûpela 102-103'an de behsa Mîhran û Ibnu'l Rizazî kirîye; armanca me ji Mihemmedê kurê Yusufê kurê Osmanê Hesenkêfî ew e, ku wênên nusxa destnivîsî ya Topkapi yê di bin reqema 3472'an a di kitêba "el-Cami'e Beynî'l-İlm' we Wel 'Emel Fî Sena'îl Hîl", Ibnu'l Rizazî el-Cezerî çêkirîye. Eva han jî mîsalek din e di derheqê vê de, ku di eynî wextî de dîroknivîsên hunerê Îslamê vêya hunerên Ibnu'l Rizazî hesêb dikin. Ji ber ku Mihemmedê kurê Yusuf,

wênên wî tev teqlid kirine û ez wisa dizanim şagirdên wî jî. Di wê wênê de, sê mirovên amîrê "el-Însan u'l 'Ellî" û hinek ale-tên mekanîkî dîyar in, ku yek ji wan îcadkerên sen'etên me-kanîkî İbnu'l-Rizaz e(2). Her wiha hinek malumatên din jî li ser Muzafferê kurê Hiseynê Hesenkêfî hene, ku musiqajen û hunermend bûye û heta niha nehatîye zanîn ka wênên wî yên destçêkirî li ku ne.

Dîroknivîsên hunerê İslamê dibêjin; di qirnê navîn de, li bakurê Mûsilê, yanî li Kurdistanê, dibistaneke hunerî hebûye. Di wênên Mîhran, İbnu'l-Rizaz û yên hunermendên din ên wê navça Kurdistanê de, aliyê bingehêkî taybetî yê hunerê têt dîtî û di eynî wextî de karê hunerî yê Helenîstê Bizansîyan tê de dîyar e. Doktor Hesen Paşa vêya han wek "Şîweya Dîyarbekrê" (Uslûba Dîyarbekrê-Alîşêr) bi nav dîke(3). Di kitêba "Bangewazek..." di rûpela 115'an de, me bal kişandîye ser vê noqtê, ku regezên hunerên dibistana wênekêşên Dîyarbekrê jî aliyê dibistana wênekêşên Bexdayê ve hatine wergirtin û heta karên hunerî yên Mîhran û İbnu'l-Rizaz jî kirine bingeh jî dibistanên van dawîyan re. Di eynî wextî de wek uslûbek gelemperî ya dibistana hunerîyê ya taybetî û serbixwe ya Kurdî heye û rewa nîne êdî di nav dibistana wênekêşên Bexdayê de bê bişaftin(helandin) û cîyê wan bigre. Nabe em vêya han jî ji bîr bikin, ku, Cizîr, Sêrt, Mêrdîn û çend cîyên din jî diketin ber navça Dîyarbekrê ya wî çaxî. Vêca jî ber vê, ku dibistana wênekêşên Bexdayê li ser bingeha hunerê Herêma Cizîrê hatîye damezirandin, ku jî Dîyarbekrê heta Musilê digirte nav xwe, û di dereca yekemîn de jî hunera Mîhran û İbnu'l-Rizaz jî xwe re kirine bingeh, hinek kesan jî vê dibistanê re "Dibistana Wênekêşên el-Cezîre" gotine û bi navê "Bexdad", bi nav kirine. Wek Dr. Zekî Muhemmed Hesen di kovara Sumer, cilda 11, rûpel; 1'ê de ev yeka han gotîye. Ji bo vê mebesta han, min namek jî mamosteyên berêz Dr. Xalid el-Cadir û Şakir Hisnî re şand ku di vî warî de nêrînên xwe ji min re ronî bikin, lê, tenê bersîva Dr. Xalid di 25.10.1976-an de, ket destê min û tê de dibêje; ez ê di wextek din de bersîva te bidim. Ev kesên han ên ku navên wan derbaz dibin, mamostên hunerê ne.

Her wiha pêwistîya wênên nusxa bi destnivîs a Me'rifet-nama İbrahîm Heqqîyê Erzurumî, bi lêkolînê heye. Yek ji kitêbên destnivîs ên wênekêşê Kurdistanê di nusxa Unîversîta Bekir Efendî ya Musilê de ye, ku birek wênên wek Alema Lahut, 'Arş û Kursî, Alema Ewrah û Cennet, Cehennem, Rojgirtin, Heyîvgirtin û yên tiştên wek van in (4).

Eger berhemên hunera Mîrê Kurd Evdalxanê kurê Dîyaeddînê kurê Şerefxanê dîroknivîsê me, biketa destê me, eva han dê quncikekî din ê hunerê wênekêşên me yên Kurd xweştir bi-daya ronîkirin. Evdalxan, wênekêşekî Kurd tê hesabandin, ji ber ku xizmeteke wî ya hêja di wan wênan de hebûye. Ewliya Çelebî, ku çardeh rojan bi mêvanî li ba Evdalxan maye û ji nêzik behreke zêde berhemên wî dîtine, wiha dibêje: *"Evdalxan; wênekêş, xweşniwîs (xetat) û nexşkar (neqaş) e"*. Bêguman, Ewliya Çelebîyê dostê Kurdan, wêne û tabloyên ku bi destên wî hatine çêkirin, dibîne. Gelek mixabin ew hemû kar û 76 kitêbên ji aliyê Evdalxan de hatî nivîsandin û li gel 105 namên girîng, hemû wenda ne. Dûr nînê hemû hatibin îmhakirin. Di sala 1065'ê koçî (1654/1655'ê zayînî) de, ev saman, xezîne û kitêbxana Evdalxan tev ji aliyê Melik Ehmed Paşayê Walîyê Wanê ve tînan talan kirin, ku bi hezaran kitêbên gelek hêja û giranbiha di nav de bûne. Hêjayî gotinê ye, ku Şerefxanê dîroknivîsê mezînan bi xwe bingeha vê kitêbxanê danîye. Ewliya Çelebî bi destê xwe lîsta wan kitêban girtîye. Gelek ji wan li ser warê pêşkeftina şaristanîyeta wî bajarî bûne û ji aliyê Evdalxanê bêhempa ve hatine nivîsandin, ku wî çaxî temenê wî heftê salî bûye. Ewliya Çelebî di vî warî de wiha didomîne: *"Xan, bi hefsed zanist, hunermend û huseyvan ve, di warê felsefe, zanîna seyr û entîke de yekemînê zeman e. Di warê kîmya, sîmya û zanistîyên din de şareza ye. Bijîşkekî wisa ye, ku Calînûs û Boqrat(Hipokrat) li ber wî ne tiştê in. Çavên tarîbûyî emelîyat dîke û bi mîl ava reş jê dikêşe û ronî dîke. Min bi çavên xwe dîtîye çavên dûman emelîyat (neştergerî) kirîye û dûmana li ser hilanîye. Evdalxan, endazîyar e; şimşîr (şûr), tîr û kevan durust dikir. Seetsazekî harîqulade ye; seetên rojane, mehane û salane li ser burcan bi zengil ji bo agahdarkirina wext durist kirîye û*

heta di nav hingustîla xwe de seeteke biçûk çêkirîye. Di warê musiqe û kilaman de mirov nikare pesnê wî bide. Bi awakî wisa di nav herçar tepîlan (deburqe) de rûdîne û bi hev re li herçaran dixê, êdî mirov nikare pesnê hunermendîya wî bide. Wextê Sultan Murat têt Bedlîsê û bi vî awayî tepilêdana Evdalxan dibîne, baca navça Muşê jê re dibexşîne. Colayîyê (berik, xaliçe ûhw. çêkirin- Elişêr) jî dizane; bermaleka bi destê xwe çêkirî pêşkêşî Melik Ehmed Paşa kir, ku tenê li Misrê û Isfehanê tiştên wiha dikarin bèn çêkirin. Zînê hespekî ku gelek ecêb hatî neqîşkirin durust dike û wek dîyarî ji Sultan re dişîne" (5).

Kêm kesên harîkulade yên wek Evdalxan di dîrokê de hene. Şika min naçe ser tu cîyê ku berhemên zanistî û hunerên Evdalxan li wir hebin. Ne dûr e ku di şerê navbera wan û Melik Ehmed Paşa de îmhaya bûbin. Ez, ku di havîna sala 1977'an de, çûm Bedlîsê, min di vî warî de ji Adil Begê Şerefxan pirsî, ku ew mirovekî rewşenbîr û Kurdperwer bû û wî çaxî kitêbek li ser Bedlîsê dinivîsand, di vî warî de ji min re wiha got: "Qet tu berhemek wî dîyar nîne, min seh kirîye ku dibêjin dîwanek helbestên wî li Dîyarbekrê hebûye". Û bi vî awayî domand: "Nasnavê wî Adil bûye, lê, jê re Kejxan jî hatîye gotin, ji ber ku, li hemberê Dewleta Osmanî serî hildaye û derketîye çîyan". Min jê daxwaz kir gora wî nîşanî min bide, lê, çî heye wî got: "Gora wî li Bedlîsê nîne, ji ber ku Evdalxan li Stenbolê hatîye îdam kirin". Piştî vegerîna min, Adil Beg di vî warî de namek ji min re şand ku tê de dibêje: "Evdalxan, di sala 1068-an de hatîye îdam kirin". Vêca ez dibêjim; ne dûr e, ku Evdalxan li ber destê Şerefxan hînî wênekêşanê bûbe, ji ber ku wextê Şerefxan koça dawî kirîye, Evdalxan hevde salî bûye û di wan çaxan de zarokan çar salî hînê xwendinê dikirin. Bi taybetî eva han ji bo zarokê wêkî Evdalxan zîrek, gelek mantiqîtir e. Yanî em dikarin bêjin; di salên dawîya jiyana Şerefxan de çardeh sal xwendîye û ne dûr e Şerefxan bi xwe ders dabe wî. Eva han jî hêjayê gotinê ye, ku min namek şandîye ji bo birek kitêbxane û muzexanên gelekî bi nav û deng, ji bo peydakirina tiştêkî ji kitêb, name yan wêneyeka bi destê Evdalxan hatî çêkirin, lê, heta niha min tu bersiv ji wan nes-

tandîye.

Ev nusxa Şerefnamê ya bi destxet, ji aliyê Şerefxanê Bedlîsî bi xwe ve hatiye nivîsandin. Ji ber ku di dawîya wê de ev gotinên han hatine: "*Weq'e tehrîreh we teshîheh 'ela yed muellifetu'l feqîr we musennîfetu'l heqîr -el muhtac îla rehmeta el-melîki'l barî Şeref bin Şemseddîn el-Ekaserî hafizel-lullahu'l te'ala 'enzellatu'l qelem we hefattu'l rreqem fî selx Zihcece sene 1500 min-el hîcretî nebewîyye (S.E.W.)*" (Ev di dawîya meha Zilhecca sala 1500'an a piştî hicreta pêxemberê mezin (S.E.W.) bi destê nivîskarê hejar û musennîfê feqîr ê muhtacê rehmeta Xwedê Şerefê kurê Şemseddînê Ekserî hatiye nivîsandin û teshîh kirin, Xwedê qelema wî ji şimutandin û şaşîyan biparêze). Ev nusxa han gelek bi rêkûpêk û paqij e, ji derveyî destpêka rûpela dûyem, ji serî heta binîya kitêbê qet tiştek jê neketîye; yanî mumkun e, ku rûpela yekemîn jî hebûye û navê kitêbê, nivîskarê wê yan hinek nivîsandinên din ên wek van babetan li ser hatibe nivîsandin, lê, pişt re ketibe. Wekî çawan cilda wê ya ku di destpêkê de jê re hatî çêkirin nemaye û cilda niha jî wek ya Avrupayê ye. Di beşa serî ya rûpela dûyem de, di nav nexşekê de "*Şerefname Tarîxê Kurdistan*" hatiye nivîsandin. Li gel ku ev nivîsîna han têk çûye, lê, di şîwa destxetê de derdikeve ku nû ye û di çaxê nivîsandina vê nusxa Şerefnamê de nehatiye nivîsandin. Dûr jî nîne, eynî ev nivîsa han, yanî navê kitêbê, li ser rûpela yekemîn hatibe nivîsandin û her di vir de hatibe dubare kirin.

Ev nusxa han jî 247 rûpelan pêk hatiye û herdu cildên Şerefnamê bi hev re ne. Bi zimanê Farisî hatiye nivîsandin. Beşa yekem 155 rûpel e û li ser dîroka Kurdan e. Mamoste Hejarê Mukrîyanî kirîye Kurdî û di sala 1973'an de, ji aliyê Akademîya Zanyarî ya Kurd ve hatiye çapkirin. Beşa dûyem ji rûpela 155'an destpê dike, ku bi wê rûpelê cilda yekem xelas dibe. Şerefxan, ev cilda han bi xatime nav kirîye. Di warê dîroka sultanên Dewleta Osmanî, paşayên wî çaxî yên Îranê û yên Turanan de ye, ku hevçaxê wî bûne. Şerefxan, di navekê re li ba Sultan Mehmed Xanê kurê Sultan Muradê sêyem (1595-1603'yê zayîni) maye. Vê cilda han li ser daxwaza wî

nivîsandîye ku ev yek di rûpela 155-156'an de jî xuya kiriye. Cilda dûyem, jî bûyerên sala 689'ê koçî (1290'ê zayînî) dest pê dike û heta digihîje bûyerekê ku di çaryeka dawîn a meha Rebî'u'l-ewwelê sala 1005'ê koçî de çêbûye (25-ê Teşrîna Yekem a sala 1596'ê zayînî), ku eva han tarîxa şerekî Mehmed Xan e; li gel Swêsrîyan (rûpel; 246). Ev beşa han jî 316 (divê 92 rûpel be. -nota J. N.-) rûpelan pêk hatîye û behsa dîroka Dewleta Osmanî dike. Şerefxan bi xwe jî eva han di rûpela 156 û 246-an de gotîye. Ji ber vê yekê, ew yeka ku di rûpela 110'an a kitêba "Mêjû" ya Dr. Kemal Mezher de hatîye ku dibêje; *"beşa diduyan ya şerefnamê ji bûyerên di navbera salên 1287-1587'ê zayînî (686-997'ê koçî) pêkhatîye"*, ne rast e

TARÎXA DAWÎ YA NIVÎSANDINA ŞEREFNAMÊ

Ew tarîxa ku di dawîya vê cildê de hatîye, 13'ê meha Tebaxê ya sala 1597'an (dawîya meha Zilhecce ya sala 1005'ê koçî) e. Ev tîne bîra mirov, ku ev tarîxa han dawîanîna nivîsandina her du cildên Şerefnamê jî be. Lêbelê, di rastîya xwe de wisa nîne; eva han xelas kirina tarîxa beşa yekem e, ne ya diduyan. Ji ber ku di rûpela 156'an de, ev tarîxa han kirîye tarîxa destpêkirina cilda duduyan. Ev a han jî belga wê ye, ku cilda yekem di wê tarîxê de xelas kirîye. Ji ber vê yekê rêzên dawîyê yên beşa yekem û yên destpêkê ya beşa duduyan di rûpelekê de, yanî herdu li pê hev nivîsandîne. Heta navnîşana cilda duduyan jî di dawîya beşa yekem di eynî rûpelê û di eynî rojê de -ku çarşemba dawîyê ya meha Zilhecceyê bûye- nivîsandîye.

1) Beşa yekem a Şerefnamê, ku di derheqê Kurdistanê de nivîsandîye, kirîye bingehîn û beşa diduyan jî, ku tenê tê de behsa Dewleta Osmanî kirîye, kirîye başa dawîyê ya kitêbê. Vêca jî ber vê yekê, tarîxa temamkirina beşa bingehîn (a yekem) di dawîya herdu beşan de çap kirîye.

2) Ji ber vê, ev tarîxa han li gel eynî tarîxê, yanî tarîxa sala 1005'ê koçî - ku çendîn car di beşa yekem de ducar kirîye-, kirîye dîroka dawîya ya hinek desthilatên, mîrekîyên (ema-

ret, fermanrewatî, mîrnişîn, mîrektî-Elî-şêr.) Kurdan; wek Fermanrewatîya Finik, Hesenkêf, Egil û Erdelan. Lê, xwezî Şerefxan wiha nekiribûya û ji bo her beşekî tarîxa wan a taybetî nivîsandibûya, da ku me bizanibûya di kîjan tarîxê de dawî bi beşa diduyan anîye, ji ber ku bê tarîx hiştîye (6).

Mebest ji tarîxa sala 1005'ê koçî, sala cara dawîyê ya paqij nivîsandin û temambûna pêkanîna zanyariyên Şerefnamê ye, ji ber ku, tu guman di wê de nîne, ku Şerefxan ji bo nivîsandina cilda yekem a kitêbê, gelek sal ji bo berhevkirina belgên wê xebitîye. Ez dikarim bêjim, ku ji sedî heftêyên wan ji devê xelkê û yên mîrên Kurdan wergirtîye. Eva han jî çî wextê ku li Bedlîsê bûye û çî jî wextê ku li Îranê bûye, kirîye -bi taybetî jî wî wextê ku li Îranê di Koşka Şah Îsmailê Duduyan de berpirsiyarîya kar û barê Fermanrewatîya Kurdan kirîye.- Di pêşgotina Şerefnamê û gelek cîyên din de behsa vê yekê dike, ku hinek ji wan zanyariyên xwe yên di serokaniyên tarîxê de, nedîtîye, ji devê gelek kesan wergirtîye û bi hoyên wan hel û mercan, ku jê re imkan û zemîn çêbûye, bikare wan zanyariyan kom bike û wan ji wendabûnê rizgar bike. Halê hazir niha em jî dikarin beşeke baş ji dîroka xwe bi wasita wan rîwayet û gotinên di nav xelkê de tînin gotin berhev bikin, ku piraniya mezin dîroka cîhanê bi wasita van hatîye nivîsandin, bini-visînin. Lê, bi yek mercê, ew jî hewce ye ku em di warê wergirtinan de durîst û destpak bin. Li gor qeneeta min, wextê Şerefxan li Îranê bûye, melzeme û belgên Şerefnamê kom kirine. Çî zanyariyeke di derbarê fermanrewatîyên Kurdîstana Îranê yên di serokaniyên tarîxê de tunebûne, evan jî devê mîrên Kurdan yan yên xelkê wergirtine. Ji ber ku wextê vegeyîyaye Bedlîsê, ji ber dûrbûna Kurdên wî milî, karekî wiha, bûye sebêbê hêsanbûna amadekirina xebata wî ya di vî warî de.

DESTXETA NUSXAYÊ

Di vê nusxa destxet a Şerefnamê de, ku gelek bi pakî û rêk-pêkî hatîye nivîsandin, du destxet hene, ku herdu jî şîwexetên spehî (xweşik) ne. Xwedîyê destxeta yekem jî rûpela yekem heta nivê rûpela heştan nivîsandîye, ev nusxa han bi vê dest-

چون که در این کتاب که در این سال شریف منار سپاسید اول در حسن جلیله و کبریا
انکه در این کتاب که در زبان از تقریر حکایات که گاه و مرورش بر زبان دوستان
و به نامی و در این کتاب که در تالیف این کتاب ذکر آباد و احیاء و علم کرام و بیت تم نینتم
نخایه کین شاه فرزند بیگانه از تب و تینه قاج و تخت بازه در کما حقانی سینه
بر کمال او سر نیکی و شد شن آنکه در این کتاب تمام جانش بر نیکی
در احوال و بیعت و صدم استقامت و در
در این کتاب که در این سال شریف منار سپاسید اول در حسن جلیله و کبریا
انکه در این کتاب که در زبان از تقریر حکایات که گاه و مرورش بر زبان دوستان
و به نامی و در این کتاب که در تالیف این کتاب ذکر آباد و احیاء و علم کرام و بیت تم نینتم
نخایه کین شاه فرزند بیگانه از تب و تینه قاج و تخت بازه در کما حقانی سینه
بر کمال او سر نیکی و شد شن آنکه در این کتاب تمام جانش بر نیکی
در احوال و بیعت و صدم استقامت و در
در این کتاب که در این سال شریف منار سپاسید اول در حسن جلیله و کبریا
انکه در این کتاب که در زبان از تقریر حکایات که گاه و مرورش بر زبان دوستان
و به نامی و در این کتاب که در تالیف این کتاب ذکر آباد و احیاء و علم کرام و بیت تم نینتم
نخایه کین شاه فرزند بیگانه از تب و تینه قاج و تخت بازه در کما حقانی سینه
بر کمال او سر نیکی و شد شن آنکه در این کتاب تمام جانش بر نیکی
در احوال و بیعت و صدم استقامت و در

Rûpela yekem a Şerefnama destnivîs

xetê destpê dike, lê di nav re jî nivîsandîye û bi ser hev xwedîyê 36 rûpelan e. Eva han wek mîsal di rûpelên; 10, 14, 32, 113, 117, 215 û 219'an de derdikevin. Qasê mayî yê kitêbê bi destxetek din hatiye nivîsandin. Di çend rûpelan de herdu destxet bi hev re tên dîtîn, wek di rûpelên; 7, 10 û 32'an de, yanî her rêzek ji wan destxetan hatiye nivîsandin, ku ya yekem jî ya diduyan ciwantir e; her çendin ya diduyan jî ne xirab e. Wisa jê derdikeve ku jî bilî 36 rûpelan, ên din ku temamîya kitêbê pê hatiye nivîsandin, bi destxeta Şerefexan in.

Eger wiha nebûya nedihat nivîsandin "*weqe'e tehrîre 'ela yed muellif'*" yanî; "*bi destxeta nivîskar dawî bi nivîsandinê hat anîn*". Ji ber ku jî bo nivîsandina wan 36 rûpelan gotinek wiha di dawîyê de nehatiye nivîsandin. Em nizanin xwedîyê destxeta sîpêhî ya yekem kî ye; navê kesekî din di nuxayê de nehatiye. Li vir eva han jî hewceyê gotinê ye em bêjin; ku navê kitêbê di nav nexşekî jorê rûpela duduyan de bi vî awayî hatiye nivîsandin: "**Şerefname Tarîxê Kurdistan**". Li ba min eva han ne destxeta Şerefexan û ne jî ya xwedîyê wan 36 rûpelên nivîsandî ye. Ne dûr e di wextê xwe de ev navê han li ser cilda kitêbê, yanî li ser rûpela yekemîn hatibe nivîsandin, vêca piştî Şerefexan, yekî din eynî navî di wî cîyî de nivîsandibe. Mîmkun e Şerefexan wî cîyî sipî hiştibe, eva han jî wekî hinek navnîşanên din in ku em ê pişt re behsa wan bikin.

NUSXA ŞEREFNAMÊ YA YEKEMÎN

Ev destnivîsa Şerefnamê ya ku em ê behsa wê bikin, nusxa nivîsandî ya yekemîn e. Delîlên me jî ev xalên xwarê ne:

1) Şerefexan, tarîxa destpêkirina nivîsandina beşa diduyan a berhemê, kiriye tarîxa xelas kirina nivîsîna beşa yekem, wekî me di pêş de behs kir, herdu beş bi ser hev de nivîsandîne. Mana wê ew e, ku eva han yekemîn nusxa nivîsandî ye û berî vê qet tu nuxsên din nehatine nivîsandin.

2) Dûr nîne ku Şerefexan pişt re hinek zanyariyên din ên nû bi dest xistibe û li ser kitêbê zêde kiribe û di nuxsên din ên vê kitêbê de nivîsandibe, yan jî dabe nivîsandin. Ji ber ku, ger em

vêya han li gel wê nusxa Şerefnamê ya ku li Qahîrê ji aliyê Fereculla Zekî Kurdî ve hatiye çapkirin, muqayese bikin; em dibînin ku hinek guhertinên rêzan di wê nusxê de hatine, ku di vê nusxê de nînin. Wek mîsal; di rûpela 351'an a çapa Qahîrê de, di derheqê Mîrên Farqînê (Meyafarqîn) de nêzikî çardeh rêz hene ku di rûpela 96'an a destnivîsê de tune ne. Di rûpela 119'an a destnivîsê de, Şerefhan behsa medrese û mamosteyên bajarê Bedlîsê dike, lê, di vir de behsa Mele Ebdulayê Reş nekiriye. Çi heye, ku di çapa Qahîrê; di rûpela 456'an de behsa vî melayê ku navê wî derbaz dibe, tê kirin. Her wiha nasnavê "Bebî" yan "Bibî" û navê Mewlana Xidir di destnivîsê de nehatiye nivîsandin. Di behsa mamosteyekî bajarê Bedlîsê de, dibêje: *"Mewlana Nûreddîn Mihemmed Siraniş"* û gotina "Siraniş" bi "S" dest pê kirîye, lê, di çapa Qahîrê de hatiye nivîsandin; *"Şemseddîn Mewlana Mihemmed Şiraniş"*, yanî di şûna "Nûreddîn" de "Şemseddîn" nivîsandîye û ew jî xistîye pêşîya "Mewlana" û di şûna "Siraniş" de jî "Şiraniş" nivîsandîye. Di behsa mamosteyên Medresa Hacî Begîye de dibêje: *"Mewlana Mihemmed Sofî"* û navê medresê jî "Hacîye" nivîsandîye. Lê, di çapa Qahîrê de bi vî awayî hatiye: *"Medreseyê Hacî be Mewlana Mihemmed Zerqîyê Sofî mufewwez est"*. Ev cure ferqên han her çiqas hinek caran di warên nivîsandinan de peyda dibin, lêbelê, eva han zêdetir şik dibe ser wê ku nivîskar, yanî Şerefhan bi xwe kiribe. Bi taybetî ew çardeh rêzên ku me dan xuyakirin, her di wî wextî de bûne ku, yan nusxayên din nivîsandibe yan jî dabe nivîsandin.

Gelek nivîskaran îtaetê van rê û prensîbên han kirine û dikin, lê, aşkera ye ku hinek jî van ferqîtiyên han ji aliyê nivîskarî bi xwe ve jî peyda dibin û tê de çewtî jî çêdibe. Ev zêdekirinên çapa Qahîrê di sê nusxên destnivîs de yan hinekî di wan sê nusxên din de peyda kirine û xistine nav kitêbê. Hêjayê gotinê ye, ku çapa Qahîrê piştî xwe bi wan hersê nusxayên Şerefnamê rast kirîye; yanî nusxa çapkirî ya Petersborgê û du nusxên din ên bi destnivîs(7). Nusxa çapkirî kirine bingeh, ew nivîsandinên bi feyde yên di herdu nusxên bi dest nivîsandî de hene, xistine nav bingeha naverokê û yên din jî di perawêzê

de çap kirine, wek eva han, Xwedê jê razî be, ji aliyê Mehemed Elî Ewnî, di rûpela 5'an a çapa Qahîrê de hatiye gotin. Nabe em vêya han jî jibîr bikin, ku çapkirina Şerefnamê li Qahîrê ji aliyê Fereculla Zekî û Sureyya Bedirxan ve, xizmeteke hêja û mezin e.

Nuxxa çapa Qahîrê, weke ku tê de tê xuyakirin, bi şêwa têkilkirin û lihevdana rîwayetan hatiye duristkirin û çapkirin. Ev rîya han li gor prensîbên lêkolîn û weşandinên destnivîsan şaş tê hesêbkirin. Ji ber ku, pêwîst e ku baştirîn nusxe bikirana nusxa bingehîn û vêca çi ferqîti û zêdeyî yên di nuxsên din de hebûna, wan di perawêzan de binivîsandina. Nabe ku mirov wan bixe nav naveroka nusxa bingehîn. Her ji ber vê sebebê ye, ku em nikarin bêjin kîjan ji wan her sê nuxsên çapa Qahîrê, ku piştî xwe lê qayîm kirine ji vê nusxa destnivîsa Şerefxan baştir û rêkûpêktir bûye. Di vê nusxa li ba me, ya destnivîs de, hinek îbare û tiştên zêde hene ku di ya çapa Qahîrê de nînin. Li gora nêrîna min ferqîti her di rêza yekem de heye. Ji ber vê yekê pêwîst e carek din Şerefname bê kolan, piştî muqayesekirina nuxsên din ên bi destnivîs, li ser bingeha vê nusxa ku nivîskar bi xwe nivîsandî, bê çapkirin û belavkirin. Hewce bû di wextê xwe de Akademîya Zanyarî ya Kurd, qîmeta vê nusxa destnivîs bizanibûya û bi dest bixistibûya û daxwaz ji Mamoste Hejarê Mukrîyanî bikira û deqê vê nusxa nû wergerandibûya zimanê Kurdî. Yan jî qet nebûya, li gel çapa Qahîrê muqayese bihatîya kirin, rêz, perçe û guherînên zêde di perawêzan de bihatibûna nivîsandin, ku karekî hem zanistîtir, hem baştir û temamtir biketa ber dest. Em evan tevan deynin milekî, heta Akademî, rûpelek jî ji destnivîsîna Şerefxan bi dest nexist, ku wek nimunek tê de bide çapkirinê. Hinek kesên endamên Akademîyê di pêşîya van tiştan de li ser hesabê Şerefxan û di rîya nav û dengê xwe belavkirinê de, wênên xwe, destxetên xwe û serpêhatîyên jîyana xwe di Şerefnama Şerefxanê Bedlîsî de çap û belav kirin. Bi "israr"lêkirin, Mamoste Elaeddîn Seccadî jî tûşî vê şaşîtyê kirin. Wekî min eva han bi xwe jê re got, hezar rehmet li gora wî be... Dîyar e, ku ev karê han ê Akademîyê ji programa lêkolîna zanistîyê dûr e...

شریفان سیدان و علمای و ارباب که در خدمت شریفان و در خدمت
 زده اند که مخلص خلق از این است و اوقات که در اسیر افتند از
 برودند و در قتل گزیده گزینی شدند و بر سر برادران محمد پاشای وزیر
 کتیب از دربار یک سلطان مغربی بدست بردن وقت و زمانه ای بدست آوردند
 زوال ترک نماهوان کرده علی حضرت حسین بن علی و اسراف از خدمت خود
 و خوب یک خدمت محکم کرده و در دوران در راه و امانه و عدالت و شرف
 که در مصلحت انعام از آن صاحبین خدمت و عهد پست بکنند خاک را با غماز و بیدار
 که در شکست بر فرزندش قرار افتاده را سلطه بر چون در هیچ شریفان مغرب
 غازیان نظرا بر شده و توقع قصه او هم در این سال اتفاق افتاد حضرت سلطان علی
 بی ایستاده شد که او برادران ستمگهان و عالی سگی اتفاق افتاد برادر برون
 ستمگهان شایسته و قوه کا هفت شایسته حضرت انصاری و کوشن شایسته
 در برادر واقع شد و غیره فغان که بر کبر خانی که در آن وقت خیر فغان بلیغت داده ام
 در وقت بافت و عهد انزفغان و در عهد مریضان در نجاری است حکمت را فزونیست
 فی ستمخ و در حسین بن علی در این سال سلطان سلیمان خان در بیار و در میان فزونیست
 که گمانی در مجلس شاد و باقی اوقات فرزند سعادت او را در تنگ قصه کند ایستاد
 فغان در آنجا است سعادت او بیکه ای گمشده و سلطان در آنجا یک سعادت حکم فغان
 عهد به برادر از آن عهد انزفغان و در عهد حکم کبار امضای بروی بر برون
 که حضرت شاداب آمد و مصلحتی از مردم که در دوام ایام و بیاضا برادر فغان در
 عهدی در بعضی از مردم فزونیست و در قول امیر شمسار و لایسته فزونیست و وقت حضرت
 خود در راه حکومت در آن شهر با او یک گشت هنوز که در آن بر این بود و در آن وقت
 در میان سلطان که در راه و غیره لایسته و در فغان که در راه و در آن وقت

Nimūneyek din ji destnivîsa Şerefnamê

3) Beşek ji navnîşanan, ger çiqas gelek zêde nînin, lê, di vê nusxa bi dest nivîsandî de nehatine nivîsandin û çiyên wan spî mane. Wekî navê hinek wan mîrên Kurdan, ku behsa jîyan û Fermanrewatîya wan hatîye nivîsandin. Lê, di navekê re di behsa wan de navê wan negotîye. Wek mîsal; Şerefxan di rûpela 96-an de, ji heft navnîşanan tenê yê Mîrên Tercilê (Hezro) nenivîsandîye. Wek navê 'Emer Beg Bin Hesên Beg û Budaq Beg Bin 'Emer Beg. Wisa dixuyê ku nivîskar, çaverîya peydakirina mirekeba sor, ku wî çaxî li balê qedîya be, yan mirekeba qelemê guhertibe, ji ber ku navnîşanên kitêbê gişk bi qelemeka mirekeba wê cuda û piranîya wan jî bi mirekeba sor nivîsandîye. Lê, piştî venegerîyaye ser; vêca êdî em nizanin, yan ji bîra wî çûye, yan mijûlê nusxayeka din bûye, yan jî mim-kun e vê nusxa han bi lez ji bo kesekî wek Sultan Mehmed Xan şandibe û li balê nemabe. Dûr nîne, ku nivîskar, vê nusxa han a bi qîmet nivîsandibe û pêşkêşî wî Sultanê navê wî derbazbûyî kiribe. Ji ber ku di pêşgotina beşa yekem de, navê wî anîye û beşa kitêbê ya diduyan li ser daxwaza wî nivîsandîye.

4) Ev nusxa han a Şerefnamê, ji aliyê birek tabloyên hunerî yên sipehî ve hatîye xemlandin. Qîmetpêdana bi vî awayî, hizra mirov dibe ser wê yekê, ku eva han yekemîn nusxa bi-destnivîs a Şerefnamê be. Hewcedarîya gotinê bi vê jî heye, wextê talankirina bi hezaran kitêbên Kutubxana Evdaxanê Bedlîsî ji aliyê Melik Ehmed Paşayê Tirk ve, gerokê Tirk Ewliya Çelebî di vê navê re nusxeke Şerefnamê dîtîye. Ewliya Çelebî bi destê xwe lista wan kitêban girtîye û di vî warî de weha dibêje: *"Hejmarekî gelek zêde kitêb anîne ber mezadê, ku ew yanzdeh sandoq bûn û di nav wan de kitêbên gelek hêja hebûn, ên wek Şahname, Gulistan û Şerefname. Lê, wextê çavên Dîyaeddînê kurê Evdaxan bi hêstiran (rondikan) tijî bû, Ehmed Paşa jê re got; ji bo çi bîhna te teng e?" Wî got; 'ev ezameta kitêban ên min in û piranîya wan muhra min li ser in". Ewliya Çelebî dibêje; hinek ji wan bi xetên wî jî bûn. Qismek ji wan kitêban daye Dîyaeddîn(8), vêca em nizanin ev nusxa bi qîmet a Şerefnamê ev nusxa han a di destê me de ye, yan ne? Her wiha Şerefxan yekî herî bi nav û deng ê xweşnivîsê(xetatê) xetên Farisî hatîye hesabandin û navê wî*

li gel navên xweşnivîsên mezin derbaz bûye, wekî Mîr Elî Tebrîzî, Îmadedînê Hiseynî, Mihemmed Rîza Tebrîzî û Hesên Şamîlo... Lewra em dikarin bêjin, ku Ewliya Çelebî tiştên nivîsandî yên bi destxetên Şerefxan dîfîne, vêca çi Şerefname be û çi tişteke din be.

TABLOYÊN ŞEREFNAMÊ

Di nav vê nusxa bi destnivîs a Şerefname de, çend tabloyên wêne yên bi dest çêkirî hene. Li gora nama Kutubxana Bodleî-an, ku ji min re şandine, 25 tablo tê de danîne. Lê, di rastîya xwe de 20 tablo ne. Ji ber ku ew tabloyên di warê Şerê Çaldîranê de û yên li ser Sultan Osman û Sultan Mehmed Fatîh û ya din jî (mebest ya çaran e-Alîşêr.) li ser şerê Osmanîyan ê bi Avrûpîyan re, yanî li gel Bizansîyan, her yek ji wan tabloyek e û her çarê wan jî di beşê diduyan ê Şerefname de ne. Her yek ji wan du rûpel girtine û wek du tabloyan tên ber çavên mirov. Lê, mijara wan yek in. Tabloyên din cot li beranbarê yek û du ne û her yek ji wan li ser rûpeleke taybetî hatine durustkirin û di hêla babetên xwe de ji tabloyên din cihê ne. Tenê ew tabloya di warê Mîrektîya Tercîlê de nebe -yanî eva han li ser keça paşayê Ertuqî ya nexweş e- ya din jî, ku li ser abluqakirina Kela Bedlîsê ye; ji aliyê Akkoyunluyan ve, her du beşên wê tabloyek e, ne dudu ne. Şanzdeh tablo di cilda yekemin a Şerefname de ne û çarên wê jî di cilda diduyan de. Piştî ku ev destnivîsa han gehîşte destê min, min nameyek ji kutubxanê re şand û min tê de di warê destnivîs û tabloyan de çend pîrs ji wan kirin, lê, ne esl û bingehan û ne jî pîvanên temamê destnivîs û tabloyan ji bo min ronî nekirin û min li ber rengê spî û reş ên tabloyan wêne girtin. Ji ber vê yekê min rengê tabloyan dîyar nekirîye.

Her tabloyek li gel mijara ku peywendî pê heye hatîye danîn û bi vî awayî di nav zincîra hejmara rûpelên kitêbê de hatine bicîkirin. Ji ber vê bi hêsanî tîn naskirin. Di vê behsê de em ê gelek caran li ser tabloyan bisekinin; ji ber vê yekê ez baştir dîzanim, ji bo wan lîstekê durist bikim.

<u>Tablo :</u>	<u>Rûpel :</u>	<u>Mijar:</u>
1-2	33	Fermanrewatîya Hekarîyê
3-4	39	Fermanrewatîya Behdînan
5-6	43	Fermanrewatîya Botan
7-8	56	Fermanrewatîya Hesenkêfê
9-10	66	Fermanrewatîya Egilê
11-12	77	Fermanrewatîya Hîzanê
13	89	Fermanrewatîya Tercil (Hezro)
14	132	Abloqekirina Bedlîsê ji Aliyê Akkoyun luyan ve.
15	145	Meclisa Mîr Şerefê Mirê Bedlîsê
16	145	Şah Tehmasb li Bajarê Xelatê
17	158	Sultanekî Osmanîyan ê kevin
18	173	Şerê Edirneyê
19	191	Sultan Mehmed Fatîh
20	208	Şerê Çaldiranê

Tablo, bi tevayî bi awayê hunerekî hêja û bi firçeke hunermendî ya bikêrhatî, jîyan û adetên xelkê Kurdistanê nişan didin. Çi ji aliyê hunermendîyê ve û çi jî ji çend aliyên din ve em feydeke mezin jê werdigirin. Ji ber ku -wek em ê di vê behsê de bêxin ber çavan- evên han beşek ji jîyana civakî ya çarsed sal berî niha ya Kurdistanê ne û belgên bi qîmet in. Di van tabloyan de, em van cûre aletên musîqayê dibînin; dehol, zurne, bilûr, borezan (boq), tenbûr û def. Alet û edewatên cengê jî evên han in; xencer, şûr, necax (bivir), tîr û kevan, mertal ku du cure ne, tasklaw (xozt), tiving, top û kulekên barutê û kisên gulan. Ji kel û pelên di nav malê de jî em van dibînin; tiştên raxistinê, kursî, tas, qab-qacax û gulavrêj. Ev tabloyên han, dişibhin belgên hunerî yê avayîsazî û terzên xanî û avayiyên ku di wî çaxî de hebûne. Di vî warî de em van dibînin; xanî, kel, mizgeft, minare, medrese, dikan û bazar, babetên derîyan, kevan, gumbet, silindên serbanên xanîyan, pencere, rîknên xanîyan, seko (dik), derî û hesinê ser derî yê ku di şûna zilên îro de tên bikaranîn (teqelbab). Her wiha nexşên avayîsazkirinê yê

wek nexşên endazeyî û gîyayên li ser derî, qerax û rûkarê xaniyan.

Tabloyên Şerefnamê, qîmetekî zêde bi cilûbergên Kurdî yên wî çaxî dide û di beşên xwe de jî cil-bergên Tirkên Osmanî, Ewropayî û Farisan jî nîşan dide. Wênekêşê tabloyan, cil-bergên Kurdî bi awakî giştî, bi ferqî jî yên Tirkan, Avrupîyan û Farisan wêne kêşandiye. Ji hêla kulav (serpêça serî ya wek kum-Elîşêr) û mêzera ser (şaşik yan pêça li dor kilaw-Elîşêr.), di yê Avrupîyan de du cûre şewqe tê de diyar in. Di yên Tirkên Selçukîyan de jî, terzek kulav qeraxê wê pan û ber bi jor de tewandî û poxikek jî di nivqeda serî de ye. (Li wêna behsa Tercilê binêre). Ez bawer dikim, ku niha jî ev kulavên han li ba Tirkên Yekîtîya Sovyet hene. Ji bo yên Osmanîyan jî fes û cure kulavekî wêne kirîye, ku bi derzîyê tê duristkirin û qeraxên wê ber bi jor ve pêçandî ne. Lê, wek yê pêşî pan nîne, ferq di navbera wan de heye û niha jî li Tirkîyê bi taybetî di navgundiyan de peyda dibe. Herçî mêzera bi ser ve ye jî bi giloverî bi awakî lulekî yan bi niv- lulekî çêkirî ye. (Binêre; hersê tabloyên pêş yên cilda diduyan ya behsa Sultan Mehmed Fatîh, Şerê Edirneyê û tabloya hejmara 17 û 18-an jî). Yên wisa jî çêkirine, ku nêzikî mêzerên Kurdan in.

Ji derveyî ser-kulavan, cilûbergên mîrên Kurdan kewayê (wek palto ye, lê, hinek jî wî dirêjtir e-Elîşêr) bê mil, ku li ser kirasên dirêj ên ji qumaşên rengîn ên guldar û bi awakî qîmet hatî duristkirin, li ber dikin, pişkokên wê dar in û milên wê ber bi jor de teng bûne. Hinek caran ewên bê mil jî bo mirovên din jî hatîne bikaranîn. Lê qîmeta van cilan li gor qumaş û dirûtina wan tê pîvan. Eşkera ye jî bo mîran qîmettirîn û baştirîn qumaş tê bikaranîn.

Şêst sal piştî temambûna Şerefnamê, Ewliya Çelebî di wî warî de eva han gotîye: *"kewa û selte (di bejna xwe de hindî çakêt e, heta nivê bedenê digire, bi ser kewa de tê lixwekirin-Elîşêr) cilên mirovên mezin yan ên paşa ne"*. Her wiha behsa eva han kirîye ku çawan Melik Ehmed Paşayê Tirk serwet û xezînen Evdalxanê Bedlîsî (kurê Dîyaeddîne kurê Şerefxanê nivîskarê Şerefnamê, yanî, neviyê Şerefxan) talan kirine. Bi baran kitêb û tiştên antîke anîne mezatxanê û ew jî li wir ha-

zir bûye. Komeke gelek mezin anîne, ku evên han ji dused sandoq barên devan pêkhatîne û beşek ji wan muhra Evdalxan û beşek din ji ya Xanim Sultana jina wî li ser bûye. Wextê ku sandoqa yekem vekirine, tişî kewa û selteyê hevrişim yên zêrdîyên bi qîmet ên paşan bûne. Ew kesên hazir (yên hazir bûne, Melik Ehmed Paşa û mirovên wî yên mezin bûn) ku ev dîtî, bîn li wan çikîya û zendegirtî man(9). Cilbergên Mîrên Baban ji her wek van dirêj bûne. Wekî yê Osman Paşayê kurê Ebdurrehman Paşayê Baban, ku xort bûye û rindtirîn cil-berg li xwe kirîye. Rich, di sala 1820'an de, li Silêmanîyê eva han dîtîye vê jî di Geştînama xwe, di rûpela 55'an de wiha nivîsandîye: " *Kewa wî ji qumaşê Italî, pişkokên wê zêr, kirasê wî ji qumaşê sîmdarî yê Hindê, serpêça serê wî jî ji şalê berdare Keşmîrê bûye, ku rişiyên pê ve ji sîmên zer ên wek zêr bûne*". Her wiha Rich, li ser Mîrên Behdînan jî van gotinan dibêje: "*Cilûbergên wan sipehî ne û nêzîkî awayê cilên Musilê ne. Şalê Keşmîrê li derûdorê kulav û fesên xwe dipêçin, ku wextê diçûn nêçîrê cilûbergên xelkê navçên çiyayî li xwe dikin*". Di vî warî de gotina xwe wiha didomîne: "*Cilên efsêr û yên berdestên Mîr, bi fîstanên reş ên pişkîk zêr in, ku ji qumaşên 'ebayî û li Musilê tèn durustkirin. Şalwarên wan xetdarên bi xetên reng in in. Ev cilûbergên han li Amediyê û Colemêrgê bela ne*"(10). Yanî cilên efsêr û xulamên Mîrên Hekarîyê jî her bi vî awayî ne û li bajarê Colemêrgê belav in. Dîyar e, cilên bajarî li nav Amediyê û Colemêrgê, yanî li bajaran hebûye, lê, evên han li derveyî bajaran tunebûne. Ji ber ku cilên Kurdî yên kurt wek şal û şapik, şalwar û muradxanî di rewacê de bûne, ku ji bo jîyana gundîtî û navçên çiyayî musait bûne; evên han ne cilên bajara ne. Eva han jî ji gotinên Rich derdikeve ku di vî warî de wiha dibêje: "*Mîrê Behdînan wextê diçûn nêçîrê cilên xwe diguherandin û cilên xelkê navçên çiyayî li xwe dikirin*".

Hêjayê gotinê ye, ku wî çaxî, cilên Sultanên Osmanîyan wek ên mîrên Kurdan bûne, wek ên Sultan Selîm (binêre; tabloya hejmara 20'an) û yên Sultan Mehmed Fatîh (binêre; tabloya hejmara 19'an). Ji bo wan mirovên ku ne mîr in, şarwal û miradxanî (di wênan de tèn xuyakirin), hatine bikaranîn(binêre;

tabloya hejmara 1 û 2'an). Sitarxanî jî li gel şalwar ji bo mirovan wêne kirîye. Ji bo vê, li tabloya hejmara yekem, milê rastê û xwarê wê li wî mirovê siwar û yê kulavqoç binêre. Sitarxanî jî her wek miradxanî ye. Ewên ku wek bi pêsîr, yanî; bi yaxa, wek miradxanî, piştî li ser tèn girêdan. Xelkê Silêmanîyê dibêjin; miradxanî û sitarxanî, ev herdu jî cilûbergên Kurdîstana Îranê ne û li dor û berê sala 1928-an ji bajarê Seqiz û Bane anîne Kurdîstana Îraqê. Carnan du rêz pişkoken ji dar çêkirî li ser pêsîra miradxanî hebûne. Di warên cilûbergan de tiştêk wiha belav e: "Dimoqrat", (ev navê han di dema Komara Demokratîk a Mahabadê ji bo rêzgirtina Partiya Demokrat a Kurdîstana Îranê li vî cilê han hatîye danîn-Elîşêr.) pêsîra wî wek ya kiras e, di dema Komara Demokratîk a Mahabadê ya di bin desthilata Partiya Demokrat a Kurdîstana Îranê de, ji wî milî hatîye nav navçên Soran, yanî; Kurdîstana Îraqê.

Di tabloyên Şerefnamê de, kewayê bê mil û kirasê dirêj jî ji bo mêran hatîye çêkirin. Eva han jî li ser kiras, yanî; kirasên kurt ên pişkoken wî zêde, ku li gel şalwar li xwe dikirin hatîye çêkirin. Eva han a dawîyê dişubhe kirasên millî yên Lubnanîyan, ku em wan di hinek aheng û li ber stranên televîzyonê dibînin. Di tabloya 15'an de, bi vî awayî kirasek li mirovekî ye, ku ew li pişt Mîr Şeref sekinîye. Korteka bi reng a çoxe jî ji bo mêran hatîye wênekişandin.

Di nav Asurîyan de, ku di wêna tabloya diduyan de dîyar e, yek li ber Kela Dêzê ya navça Hekarîyan, serê kerê xwe dikêşe, şalwar û cilekî dirêj lê ye û piştînek li ser girêdaye, ku di awayê dirûna xwe de wek kortekê ye. Kirasekî dirêj ê spî di binî de li xwe kirîye û serê wê yê dawîyê bi ser ve anîye û kirîye ber piştîna xwe.

Kortekên (kurtik,heşû) dirêj -carnan- ji qumaşan hatine duristkirin, berekê wî jî di ber de hebûye, ku pembo dikirin navê û sitûr dibû. Kitêlên dirûnên wê ji hev dûr û sitûr bûne. Kortek, cilekî zivistanê bûye, heta hinekî xwarê çokan dihat û pêşîyek jî jê re dihat çêkirin û bê pişkoc bûye, di çiyê qapût de hatîye bikaranîn. Kepenek (ferencî) nebe, di ser hemû cilên din de hatîye lixwekirin. Kortek, cilekî kevin ê Kurdewarî ye

û ne tenê di nav Asurîyan de, li hemû cîyên din ên Kurdistanê hebûye. Şerefname, ku kortek ji bo Asurîyan çêkirîye, nayê wê manê ku bi piranî ewan li xwe kirine û nayê wê manê jî, ku evê han cilekî taybetî yê wan bûye û Kurdên Musilman ji xwe re ne ecibandine. Her çiqas min evê han li ba tek û matên mirovên salên wan gelek pêş dîtîye, lê, niha ev kortekê han ê dirêj hatîye terkkirin û li ber wendabûnê ye. Kortekê Kek Şêx Ehmedê bapîrê (kalê) Şêx Mehmudê nemir, nimunekî yekane ye ji bo naskirina kortekê Kurdî yê di hêla cûre birîn û dirûtînê de. Ji ber ku temenê vî kortekî bi kêmasî 102 sal dibe, ku Kek Şêx Ehmed di sala 1305'ê hicrî de koça dawîyê kirîye. Ev kortekê han heta niha jî maye, ku em ê di perawêzê de bi firehî behsa qîyasa wî bikin (11).

Li ser ser-kulav, yanî; kulav-dersokên mêrên Kurdan, em çend wêneyan di tabloyên Şerefnamê de dibînin. Wisa dîyar e, ku çend cure serkulavên mêran hebûne. Dîroknivîsan di vî warî de wiha gotine: Serkulav, baştirîn nîşana ji bo ji hev cîyêkirin û naskirina netewan û çin-tebeqên wê ne; vêca çî di awayê girêdanê û çî di yê cûre û rengên qumaşên wan kulavan de be. Wek serkulavên mirovên mezin, ên mîran û yên feqîr û gundiyan yan jî yên zanayên dînî. Hunermendan, di tabloyên kevin de teferuatên van ferqan dane nîşan, ku îro ji ber vê yekê karê dîroknivîsên hunerî yan ewên ku lêkolînê li ser van cure tabloyan dikin, hêsantir bûye. Hem dikarin wênan nasbikin û hem jî dikarin wan kesên ku wênên wan hatine çêkirin, ji hev cîyê bikin. Hunermendê wênên Şerefnamê heta derecekê îta-etê van xalên han kirîye û serkulavên mîran (her çiqas hemû bi yek awayî nînin), zanyar û gundiyan wekî hev û du nînin, bi ferq in. Lêbelê, yên hemû taqim û desteyên din ji hev cihê nekirîne, wek nimûne; serkulavê musîqejenan bi awakî taybetî çênekirîye. Car heye wek ê mîrekî ye û hinek car jî wek ên kesên din çêkirîye. Wisa dîyar e, ku cilûbergên van kesên han ên taybetî tuncbûne. Di gel vê jî, cilûbergên wan sipehî bûne û eva han jî belga rêzlêgirtin û dereca bilind a jîyanê ye.

Di tabloyan de cûre serkulavek heye ku mezin e û aliyek wî ji aliyê din mezintir e. Rîşî û poxikên wî di herdu aliyên wî de hatine xwar, yan herdu serên mêzera wî bilind bûne, yanî bi

ser wî de hatîne tewandin û her yek ji alîyekî de wekî mêzera Mîrê Botan hatine xwarê (li tabloya hejmara 6'an binêre). Ev mêzera han ji bo musîqejenan jî bikaranîye, ku bi van awayên xwe, mêzer, bûye weke a mîr. Cûre mêzerek din jî tê xuyakirin, ku herdu serên wî bi perçekî cuda, carek yan du car ji bo sipehîti yan ji bo qayîmkirinê ku nekeve, bi herdu alîyên perçê bi nivê qevda mêzerê ve hatiye girêdan û dimîne wek gulingan (li tabloyên hejmara 1, 3 û 6'an binêre). Min di derheqê vê perçê de gelek pirsî, lê, min tiştek bi dest nexist. Dûr nîne, ku eva han adetekî gelek kevin be û pişt re Kurdan dev jê berda be. Ewliya Çelebî navê hinek rişiyên mêzeran, yanî; serkulavan gotîye, ku hinek ji wan di nav eşyayên talankirî yên Evdalxanê Bedlîsî de bûne(12). Tu bêjî gelo her evên han ew rişî bin?!.. Di hinek navan re û car-caran perrekî teyran jî xistîye ber mêzerê (li tabloya hejmara 6, 11 û 15'an binêre). Ev wênên han vê yekê eşkera dikin, ku di nav Kurdan de xistina perrên teyran ber serkulavan, ca êdî çiqas kêr jî be, hêjayê wênekêşanê bûye. Ewliya Çelebî di cilda 4'an; di rûpela 208'an a Seyahetname xwe de , wiha dibêje: *"Kurdên Hekarîyê du perrên teyran ên rengîn dikin ber serkulavên xwe, gelek ji wan bi kêrê guhên xwe kun dikin û perrekî teyrê baz û yan yê dîk tê re dikin"*.

Ev adetê han hîn di nav Asurîyan de maye, bi taybetî di şahîyan de perrê teyran dixin ber kulavên xwe. Her wiha jinên eşîreta Birukîyan ên der-dorên Wanê, perrên mirîşkan reng reng dikin û dikin ber kulavên xwe. Heta ev adeta han di navça Silêmanîyê de jî di nav kit û mat jinan de -ne di nav mêran de- maye û niha jî perrêndîk yên xaleta Qumrîya Ezîzê Jajaleyî hene û ew di wî warî de wiha dibêje: *"Di hinek rojên xweşiyê de ez dikim ber laçika xwe"*, û bi vî awayî gotina xwe didomîne: *"Di wextê dayîka min de, ev adeta han bi taybetî di nav jinên xanedanan yên wek Adile Xanima jina Osman Paşayê Cafan de, bi rewaç bû û jinan perrên mirîşkan, yan ên teyran di milê rastê yên laçikên xwe de wek gulingan ber didan, ji bo ku di nav cemaet û daniştivanan de bêt naskirin ku xanedan in"*. Di nav çend netewên din de jî tiştên wiha hebûne û serokên wan îtaetî vê adetê kirine.

Carna jî paşayekî bixwesta, yek bi xelat bikira, perrekî teyran dikir ber serkulavê wî. Wekî çawan Melik Ehmed Paşa perrekî kirîye ber serkulavê Remezan Axayê mirovê Mîstefa Paşayê Walîyê Dîyarbêkrê, ku wî şandibû ji bo pîrozbahîya serkevtina wî ya li hember Ewdalxanê Bedlîsî. Ewliya Çelebî, di Seyahetname xwe ya cilda 4'an; rûpela 273'an de, behsa vê bûyera han kirîye. Berêz kak Ebdurrehmanê Muzûrî di nama xwe de, ew kesên di vî warî de pirsîyar ji wan kirîye (min navên van kesan di behsa guh de nivîsandîye) wiha dibêjin: Nema zanîne Kûrdên Behdînan, yan Kûrdên navçên Kûrdîstana Bakur, wek adetêk perrên teyran dikin ber serkulavên xwe, lê, gul, beybûn, tevî û nêrgiz... û gîyayên bîhnxweş dikin ber ser-kulav yan ber piştîniyên (şotik, çar-car) xwe. Wek niha jî li gundê Bamernê adet e, lê, hindekan gotine; şivanên navçên Hekarîyan ji bo paqijkirina bilûrên xwe perrên teyran dikirin ber serkulavên xwe, û her wiha nêçîrvanan jî. Lê, wextê ji nêçîrê vedigerîyan mala xwe, diavêtin. Wisa dixuyê paşvemaya vê adetê ye, ku di wextê Şerefxan de li Kûrdîstanê hebûye û ev adeta han di tabloyên Şerefnamê de ji bo me hatîye parastin.

Di tabloya hejmara 11'an de, baxvanekî xelkê Hîzanê mijûlî kolana baxekî ye, kulavekî biçûk ji qumaş yan mêzereke gelek tenik û sivik li serê wî ye. Ji vir jî derdikeve ku mimkun e ev ser-kulavên han an ên karkirinê bin yan jî yên van cure rêncberîyê bin.

Kilawqoç: Di dawîya milê rastê; di tabloya hejmara yekem de, siwarek bi şalwar û muradxanî li xwe kirî, hatîye çêkirin û kulavekî dirêj û qoçî li ser e û mêzerek jî li der-dora wî hatîye pêçandin. Ev manzara han di tabloya hejmara 9'an de jî heye. Li navçên Soran ji van curên kulavan re kilawqoç tê gotin; ji qumaş dihat durustkirin û heta van salên han jî li navçên Pişder û Mengûr belav bû.

Mişkî (tişteki wek destmal yan kefiya tenik e, lê, di hêla qumaşê xwe de biqîmettir e-Elîşêr) li ber girêdidan. Di dema Dewleta Ebbasiyan de, ev curê kulavên han li Îraqê belav bûne û car-caran jî hinek xelîfên vê dewletê; yên wek Mute-

wekkilê kurê Harun Reşîd (847-861'ê zayîni) û Ebu Qasim Ebdulla el-Mustekfî (944-946'ê zayîni) bikar anîne û jê re "temîl" (13) gotine, ku nêzikî du bihostan dirêj bûye. Niha jî Kurdên Ezîdî yên Şengalê ji van kulavên dirêj didin serê xwe û di şûna qumaş de ji livayê çêdikin û hinek şîşên têl jî dikin navê ku qît û hişk bisekine. Li Botan jî eynî kulavên wek ên Ezîdîyan hebûne, lê wek wan mezin û qayîm nebûne. Dûr nîne ku ser-kulavê Mîrê Botan ê di tabloya hejmara 6'an de, û yê musîqejenekî jî ya di eynî tabloyê de, her kulavqoç bin.

Ji derveyî van, serpêçê jinan jî, ku di tabloyên hejmara 12 û 13'an de hene, serpoşiyekî spî ye, li gel destmalekê ye ku li ser serpoşiyê hatîye girêdan. Eva han sade û ya jinên re'yan bûye. Niha jî di gelek navçên Kurdistana Tirkîyê de ev babet serpêçên han tên bikaranîn. Dûr nîne, ku di wî çaxî de eva han jî aliyê jinên karker û feqîran ve hatibe bikaranîn, ji ber ku di tabloya hejmara 9'an de, jina Mîrê Egilê û du jinên din ser-kulavên mezin li serê wan in. Di tabloya hejmara 12'an de, ku di derbarê Hîzanê de ye, li milê destê rastê û di dawîya tabloyê de, qismek ji ser û rûyê jinekê diyar e, ku ser-kulavekî mezin ê jinan li serê wê ye. Di tabloya hejmara 15'an de jî, Şahbegê Xatun, ser-kulavekî mezin li serê wê ye û her wiha kirasekî bê mil ê dirêj jî lê ye. Carnan li piraniya navçên Kurdistana, şûnwarên germ ên pişt çiyayên Zagros, Toros û ji Deştê Entabê, Kilîs û Sirucê bigre heta Şengal, Kerkûk, Kifrê, Xaneqîn û heta navça Loristanê jî, jinên bimêr ên Kurdan vî ser-kulavê han didan serê xwe. Heta ez eva han jî dizanim, ku jinên Eşîreta Berazîyan a Mezin, ku beşekî mezin ji wan li Kurdistana Suriyê ne, her çiqas navçên ew tê de dijîn germîn be û nêzikî rûbara Firatê jî be, heta demek berî niha jî van babet kulavên han hebûn.

Serkulavên jinan (jinên bimêr, ji ber ku keç-qîz serkulavan nadin serê xwe), ji tas (tasa kulav-taskilaw) -ku ji zêr, zîv yan xişrekî din tê durust kirin- kulav, yan ji çoxê fesên reş, yan jî ji qumaşekî din e, destmala li ber enî bi gulînge ye, yan wek ên li ser egalê tên girêdan, yan jî poşî ye yan jî qumaşekî din ê wek cawekî spî ye, li ser kulav tê girêdan. Piştî jî enîpêç bi ser vê re tê girêdan, ku li Germîyan (mebest Kurdistana Îraqê

ye-Elîşêr) jê re **hewrê** dibêjin û di eslê xwe de mendîlek e. Li Silêmanîyê jî jê re **serkeyî** yan **Qenewz** tê gotin, ku jî qumaşê çar reng; sor, zer, şîn û pembe pêk tê û bi hev ve tê dirûtin û li ber enîyê û jî aliyê piştê ve jî wek hewrê têt girêdan. Eva han li navçên Bakura Zê ya Biçûk û Xoşnawetîyê jî heye. Jinên navça Xoşnawetîyê kefi(serkeyî) jî li ser zêde dikin û hemûyan bi hev re bi ser kulav re girêdidin, yanî di ber enîya xwe re. Her wiha qenewz jî girê didin. Jin, **çaroke** (kefi ya egala ku jin davêjin ser milên xwe. Elîşêr) jî dikin ser ser-kulavên xwe û bi heleqekê, yan bi senceqekê pê ve qayîm dikin. Wek çaroke-yên bi nexşîn jî hene û evên han jî ji bo jinan ji qumaşên reş, bi hevrîşmên şîn û bi wênên hîv û gulan tèn nexişandin. Li çend bajarên wek Koyê (Koysenceq) çarokên bi nexşîn gelek rewaç bûne û dirêjahîya wan sê mètre bûye, lê, li gundan hîn ji vê jî mezintir bûye. Hinek jî hebûn, xîşrên zêr, zîv yan xîşrên bi madenên din di ber serkulavên xwe re girê didan, ku eva han ji zincîrekê yan ji du-sê zincîran pêk dihat û çend gulan jî bi wê zincîrê ve dikin. Vêca di vir de zêr yan pereyekî din, yan zîv û xîşrekî din, yan jî pulên wê bi wê zincîrê ve dialîqînin û bi ser serkulavê ve qayîm dikin. Li navça Silêmanîyê ji zincîra pişta ser re; **piştêser** û ya tenîştê re **lagîre** û ya nav çavan, yanî; ya pêşîya ser re jî **berçawge** dibêjin. **Kirmoke** (kirmok) jî zêr, zîv yan mûrî pê ve ne û bi serkulav ve tèn qayîmkirin û dikevin bin çenê. **Perwane**(perperok) jî wek kirmoke ye, lê, ji zêr tê durustkirin. **Serperçem** jî hemûyan sipehîr e, ji zêr tê çêkirin, du rêzên wê dikevin ser serkulavê û rêza sisîyan jî ji bo bi bin çenê ve bê girêdan ber bi jêr ve têt. Koçerên Ako, Bolî û Mentik jî vê bikartînin. **Koçk**, kulavekî wek kîs e, di nav eşîretên Koyê, Ranye û Pişder de heye. Eva han jî wek yên jinên Bilbas, Ako, koçerên Bolî û Mentikişê ne. **Kodiçk** (kefiya li serê zarokan têt girêdan-Elîşêr.) kulavekî wek kîs e, ji qumaşê spî ye, jin jî xwe pê dixemilînin û destmalên spî didin serê xwe (sîrike) li ser dipêçin, ku eva han cûre kefiyek Îranî ye. Heleqên wan jî ji zîv, yan ji zêr in û bi cênîkan ve tèn qayîmkirin.

Jinên Eşîreta Birukîyan ên navça Wanê, ku ew berî Şerê Cihanê yê Yekem li Qafqasyayê bûn, bi **kûfî** ne. Qasî ku ez dizanim, kulavên wan ji çoxê ye û çend kefiyên (desre) renga

reng ên biriqandî li der-dora wî girê didin, çend textan jî dikin ber kulavên xwe û di ser wî re jî kefiyan dipêçin, ku rast û qît bisekine. Perrên kurt ên teyran jî renga reng dikin, dixin ber kulavên xwe. Şeş-heft fistanên rengîn jî bi ser hev de li xwe dikin. Bi rastî heta niha min qet di tu navçên Kurdistanê de, wek ser-kulav û cilûbergên jinên Birukîyan nedîtine. Gerokê Tirk Ewliya Çelebî, ku piştî şêst sal temambûna Şerefnamê hatiye navça Dîyarbekir, Wan û Bedlîsê, di vî warî de wiha dibêje : "*Zincîrên tas-kulavên jinên Dîyarbekrê zêr û zîv in. Cizme werdigirin û xişrên wan jî her zêr û zîv in*"(4).

Divê em vêya han jî bêjin, ku di wênên Şerefnamê de tas-kulavên jinan sade ne û xişir pê ve nînin. Her wiha xişran jî bo zendên jinan jî çenekirine. Li gel vê jî, ev wênên han serwetine girîng ên kelepore şaristanîyeta Kurdan in û şêweyên çarsed sal berê niha yê taskulavên jinên Kurdan didin pêşandan û ev wênên han belgename ne jî bo hinek têbînî û jiyana civakî ya xelkê Kurdistanê.

Nabe em vêya han jî jibîr bikin, ku cilûberg, di dirêjahîya pêvajoya zeman de, di nav hinek guhertinan re derbaz dibin. Wek nimûne, cilûbergên Asûriyan li gora kêşana qelema Rîch, ku di rûpela 196'ê kitêba wî ya Geştînama (Seyahetname) Rîch de hatiye belav kirin -ev gera xwe di sala 1820'ê zayînî de pêkaniye- jî wan cilûbergên ku di tabloya hejmara 2'an a Şerefnamê de hatiye kêşandin, cuda ne. Awayê van herdu şêwe cilên han dirêj in û namînin bi wan cilûbergên ku Wîgram di dawîya sedsala 19'an de, bi wênên fotoxraf kêşandinê pêşan dide û ku evan jî di kitêba xwe ya bi navê Mehdu'l Beşerîyye el-Şerqîyye de çap kirine. Ev cilên han, şal, şapik û kulavên jî livaya berxan in û dimînin bi cilên Kurdên Behdînan. Dûr nîne, ku di wextê Rîch û Wîgram de, ev herdu şêwe cilên han wek cil-bergên kesên dewlemend û yê rênçberan bin. Carnan li navçên Silêmanîyê û bi taybetî di nav Cafan de, cilûbergên dirêj gelek belav bûne. Eva han jî yê xelkê navça Germîyan bigre heta yê Mendelê jî hîn dirêjtir bûne. Çi heye, ku piştî salên 1960-1961'an, xelkên Germîyan, li gel pêşveçûn û belavbûna hestê Kurdayetî, berê xwe dan poşî ('egal), şarwal û miradxanî li xwe kirin. Niha, di nav wan de, zêdetirîn ev

cilûbergên nû tèn li xwe kirin. Her çiqas cil-bergên dirêj ji bo navçên Germîyan hîn baştir jî bin. Di navçên Ciwanrûyê de jî begzade, cilûbergên dirêj li xwe dikin, ji ber ku evên han wek nîşanên mirovên maqûl in.

Bêguman, wênên Şerefnamê, cilûbergên wê demê dixin ber çavan.

XELEKÊN GUHAN (GUHAR)

Di tabloyan de, guhar, yanî xelekeke meylê pan di guhên piranîya mêrên Kurdan de heye, lê, di guhên mirovên Tirk, Faris û Avrûpiyan de nehatiye çêkirin. Vê dêmena (menzera) han gelek bala min kêşand. Ez gelek li ser sekinîm û min ji gelek kesan jî pirsî. Ji ber ku min sehnekirîye û di tu serokanîyekê de jî ez lê rast nehatime, ku mêrên Kurdan bi awakî adetî guhar kiribin guhên xwe. Min dikir, ku ez bêjim; hunermendê tabloyan vî karê han ji ber xwe ve çêkirîye û rastîyek jî vê re tune. Lê, dema min di Seyahetnama Ewliya Çelebî di rûpela 209'an de, dît, ku nivîskar di warê Fermanrewatîya Hekarîyê de dibêje: "*Piranîya mêrên Hekarîyê guhar di guhên wan de hene*"(15), qeneeta min a di vî warî de guherî. Dîyar e, Ewliya Çelebî bi hezaran Kurdê Hekarîyê dîtine. Ji derveyê vê êdî di tu cîhê dinê berhema xwe de behsa vê mesele nekirîye. Mîmkun e, ku guhar li navçên din jî hebûne, lê, ne radeyek wek a Hekarîyê. Yan ne dîr e, ku di wextê xwe de guhar di hemû navçên Kurdistanê yên din de jî bi gelemperî hebe û Hekarî jî yek ji wan be, yan jî hunermend, zanîye di pêş de guhar di nav Kurdan de belav bûye û ji ber vê jî di tabloyên xwe de wênên wan kêşaye. Ji derveyî van tevan, mirov dikare wiha jî bifikire; wî wextî heta dema Ewliya Çelebî şêst sal di ser re derbaz bûye û mîmkun e, ku di vê navê re, Kurdan dev jî vê adetê berdabin, yan jî di nav wan de gelek kê mabe. Niha li Hekarîyê jî rêça guharê nemaye. Li gora vê, hunermend bi awakî rasteqînî û waqî'î van wênên han kêşane, evên han belgên durust in di warê van cure adetên civakî de. Ne tenê eva han, dibe ev adetên han îro bibin xewn jî, lê, bi cûrek din heta van salên dawîyê jî mabûn. Li navçên Silêmanîyê û ya Hew-

lêr, ew kurên di mal de yekane bûn, ji ber zêde ezîziya wî, guhar dikirin guhê wî, heta kal dibû her di guhê wî de dima. Ne dût e, hinek ji van pîremêran mabin, heta niha jî guhar di guhên wan de hebin. Kak Şirut Enwer, ku hunermendekî wênêkêş e, xelkê Silêmaniyê ye û temenê wî 33 sal e, guharên wî di guhên wî de bûn û dibêje; *"niha jî guharên min ên zêr mane"*.

Wiha belav e û têt zanîn jî, ku hinek netewên Rojhilata Navîn guhar dixistin guhê ebdên xwe. Ev adetê han ji berî heta niha jî, hîn di nav hinekan de maye.

Van dawîyan, min doz ji nivîskarê berêz Seyda Ebdurrehmanê Mizûrî kir, ku di vî warî de pirsîyar ji pîremêrên Behdînan bike. Ewî jî xwe aciz kirîye û di vê xususê de ew kesên şarezatîya wan li ser navçên Hekarîyan û Behdînan hene, pirsîyar kirîye. Ew kesên Seyda pirsîyarê ji wan kirîye ev in; Mele Qasimê Simahîlê Cangîrî, temenê wî 86 sal e, 'Emerê Elî Salih 87 salî. Ev herdu kesên han ji qebîla (tîra) Mehmedîyan a eşîreta mezin a Ertûşîyan in. Hacı İbrahimê Ebîzîde Ertuşî 81 salî, stranbêj (dengbêj) Mecîde Seîde İsayî 81 salî, ji qebîla Heyderan a Eşîreta Ertûşîyan e û beytên wek Xanê Dimdim, Hespê Reş, Woste û Ferxo jiber e. Şêx Qasim Şêx Ebdurrehmanê Mihemmed Emîn Biskê 101 salî û berêz Mele Osmanê Giravî. Li gora axaftina van berêzan, Kurdan guharên zîv, carnan jî zêr dixistin guhên xwe û hinek ji wan bi morî jî bûne. Şêx Osman, ku ji tevan mezintir e û ji hemûyan zêdetir jî li navçên Kurdistanê gerîyaye, dibêje; *"bi bîra min tê, ku piranîya guharên mêran morî pê ve bûn"*. Her wiha vêya han jî dibêje; *"bi taybetî ew malên dewlemend ên maqûl yan ên di mal de keçên wan hebûn û kurên wan yekane bûn, xelek yan guharan dixistin guhên kurên xwe û heta jin dianî di guhê wî de dima, lê, piştî jinanîne, ger hezbikira êdî nedikir guhên xwe. Niha jî li Behdînan hinek pîremêr hene, guhên wan kun in"*.

Birayê zana Mele Osmanê Giravî, li ser bawerîya guharkirina guh wiha dibêje; *"li gora bawerîya Kurdan wiha bû; ger guhar bêxin guhên kurê xwe, êdî jinên cinan nikarin kurên wan veguherînin, ji ber ku 'cin ji hesin ditirsin"*.

TEMERÎ

Di çend wênên Şerefnamê de, qevdek por li pişt guhê mirovan hene, lê, ne wek ên Ezîdîyan dirêj in û nakevin ser milên wan. Ji vê qevda por(pirç, çepk) re temerî tê gotin. Di tabloya hejmara 11'an de, ku li ser Hîzanê ye, dikandarekî xort, temerîya wî heye. Ne dût e, ew mirovê bi temen li hespê sîyarbûyî, Mîrê Hîzanê be û temerîya wî hebe.

Di tabloya hejmara 7 û 8'an de, du xort li ser Kela Hesenkêfê û li pişt mizgeftê hene. Temerîya wan heye. Ne dût e Mîrê Amêdiyê yê di tabloya hejmara 3'an de jî temerîya wî hebe. Li Kurdistana Bakur, ew por bi herdu teniştên serî ve dimînin û nayên kurtkirin, jê re temerî tê gotin, ji porê ku bi cênikan ve jî dimîne, zulf dibêjin. Eynî wextî herduyan bi hev re jî bi nav dikin û ji vê re jî zulf-temerî tê gotin û ji bo rindkirin û sipehîkirina mêr, zarok û xortan bi awakî adetê bab-kalan tê bikaranîn. Lê, ew porê di nav çav de tê berdan, jê re gulî yan kakul tê gotin. Heta van dewrên dawîyê jî li nav çend navçên Kurdistanê, wek Botan, kurên temenên wan heta dora 15 salan û tek-tukên xortan jî zulf û temerîyên wan hebûn. Her wiha serê xwe bi cuzan û makînan kur dikirin, der-dorên wî, yanî gulî, zulf û temerîyên xwe dihîştin û evên han jî di bin kim (kum) an kefiyeke liva de derdiketin, ku zêde dirêj nebûn. Lê, gulî, ji herduyên din dirêjtir bûn. Zulf û temerî ji bo sipehîti û xweşikîyê dihîştin. Awakî din ên kurkirinê jî hebû, ku her çarmedorê serê xwe jêdikirin û di nivê serê xwe de qevdek por dihîştin. Ez wisa dizanim, hîn tek-tuk jî be, di nav Ezîdîyan de eva han maye.

Wênên Şerefnamê, belgên wê ne, ku xort û mirovên salên wan pêş de jî di qirna16'an de, temerî hiştine. Ev gotina han a pêşîyan; "*filan xort bi zulf û temerî ye!*", dide nişandan, ku sedsalek piştî vê yan berî vê, ev adeta han di nav xortên bîst salî û heta yê jî wan mezintir de jî belav bûye. Ji vir şûn de êdî hêdî hêdî ber bi kêmbûnê de çûye û hatîye heta ser zarokên 10-12 salî û vêca jî vir şûn de jî ber bi nemanê de çûye.

Ewliya Çelebî di rûpela 171'ê Seyahetnama xwe de dibêje: "*Begên Kurdên Şêrwan, Sêrt, Hîzan, Karnî, Zirîfî û Kêsan, jî*

bo êrîş û jinavbirina Evdalxanê Bedlîsî alîkarî û piştgirîya Walîyê Wanê Melik Ehmed Paşa nekirin. Lê, wextê şer tem-am bû, hatin bû Paşa û wî jî ji ber xeyda xwe tevan da girtin. Kesê yekemîn ku anîne ba Paşa, Begê Şêrwanê kurê Tatar (Teter) bû. Paşa jê re got; "ev çelebîyekî bi rî û zulf e, wek jinane, Xan Evdalxan rî û porê wî jê re hiştîye û ji ber xatirê Xan nehatiye alîkarîyê bide me". Ev gotinên Ewliya Çelebî belgên wê ne, ku ne tenê zulf, temerî jî di nav Kurdan de, yan jî di hinek navçên Kurdistanê de, wek navçên Şêrwan -ku navê xelkê wê bi azayetî belav bûye û ji milekî de dikeve navbera Sêrt û Hîzanê, ji milê din de jî dikeve navbera Botan û Ruşkî (yanî Bedlîs)- belav bûye. Ev Begên Şêrwanê mêrên xas bûn, alîkarîya Paşayê Osmanîyan nekirin. Evên han wek Mîrên Hekarîyê û Mehmudîyan ne qels û necamêr bûn, ku alîkarîya wî Paşayê zordar kirin û şaristanîyeta Bedlîsê ji holê rakirin, ku Ewliya Çelebî gelek baş menzere û rûyên wî derêxistîye holê. Wisa dixuyê Mîrê Hîzanê jî wek yê Şêrwan temerîya wî hebûye.

Hêjayî gotinê ye, berî Îslamîyetê, temerî di nav xortên gundiyan Kurdistanê de belav bûye. Di nav Kurdên navçên Rojhilata Rûbarê Dîclê yên gundan de jî berbelav bûye. Vêca êdî ez nizanim, ev adeta han ji wir ketîye nav Kurdan, an berî wê jî hebûye.

Quçî taş, bi eksê zulf û temerîyê, ku eva han li navçên Soran û heta Sine, bi taybetî di nav derwêş û kesên ehlê tesewwufê de heye, qeraxên serê xwe bi cuzan kurdikin baqên serê xwe kurnakin û pora xwe hinek dirêj dikin, bi piranî ji vê serkurîrînê re qoçî taş (qoçîtraş) dibêjin.

EV TABLOYÊN HAN KARÊ KÊ NE?

Di vê nusxa Şerefnamê de qet îşaretek ji bo wî kesê huner-mend ê, ku ev tablo çêkirin, nehatiye kirin. Min di vê xusûsê de ji Kitêbxana Bodleian pirsî, weha dibêjin: "li ser vê yekê qet tiştek di destê me de nîne û nayê zanîn ev yên kê ne", ji ber vê yekê, em nikarin bêjin ji sedî sed ev wênên han karê Şerefxan bi xwe ne. Ji ber ku dûr nîne, yekî din çêkiribe. Di Şerefnamê de du cûre destxet hene û ya yekem şanzdeh rûpel

pêhatîye nivîsandin, ku hem bala û hem sipehîtir e. Ev yeka han hîn zêdetir dudilî dixe nav meselê. Min gelek hewil da, ku vê meselê ronî bikim, lê, ez negihîştim tu netîceyekê. Yek ji wan hewlên min ew bû, ku min çend tablo û nimûnên herdu destxetan bi rîya berêz kak İbrahim Miran, ji bo lêkolînê, ji Mudîrîyetu'l-Teherrîyatu'l Cenayîyye ya Bexdayê re şand, ku bi destê pisporê herî pêşkeftî Mamoste Ezîz Bitris, di rîya aletên ronahîyê re bide berhev û vê meselê ronî bike. Kesê navê wî derbaz dibe, di bersîva xwe de wiha dibêje: *"Karên wiha li ser van cure wênan qet tu netîceyekê nadin, ji ber ku hewce ye ev lêkolîna han li ser nusxa esasî bê kirin, ne li ser ên wêne li ber hatîgirtin"*.

Ez hewcedarê vê gotina han im bêjim, ku tablo yekser di eynî wextî de di ber nivîsandina Şerefnamê re hatine çêkirin. Ji ber ku çend rêzên Şerefnamê, ku peywendîya wan bi rêzên rûpela 89 û 90'an ve heye, ketine tabloya hejmara 13'an, ku eva han li ser behsa Fermanrewatîya Tercilê ye, xetê vê nivîsandinê dimîne bi ya li ser destê çepê ya rûpela 89'an, ku ev destxeta han a Şerefyan bi xwe ye. Yanî piştî-vê, rûpela destê rastê nivîsandîye, tablo, yekser li ser rûpela hemberî wê çêkirîye û koşa destê rastê ya li ser tabloyê jî, ku pîvana wê 9x22 mm-ye, spî maye û pişt re Şerefyan bi nivîsandineka himbiz (tijî, diberhev de, ne firk-Elîşêr.) du rêz nivîsandine. Heryek ji van rêzên han hindî ji sisîyan yekê rêzên din e. Lêbelê, eva han nabe belga bawerî pêkirina wê, ku ev tabloya han û yên din jî destçêkirina hunermendekî ne û eva han jî ya Şerefyan bi xwe ye. Ger çiqas dûr nîne evên han destçêkirina wî bi xwe bin, ji ber ku Şerefyan di Koşka Şah Tehmasbê Yekem de (1524-1576'ê zayînî) dersên wênekêşanê xwendîne. Şerefyan di rûpela 152'an a Şerefnamê de wiha dibêje; *"ji bo perwerdekirin û hînkirina xwendîna kurên serdar û maqûlan, nêrîna Tehmasb wiha bû; hewce ye her di zaroktîya wan de mamoste ji wan re bîn girtin"*. Vêca di vî warî de wiha didomîne; *"ku dema temenê min bû neh sal, ez jî birim wir û min sê salan xwend. Şah ji me re digot; 'car-baran bi nexşkarîyê jî mijûl bibin, ji ber ku hiş û bîra mirov bi nexşkarîyê vedibe"*.

Diyar e, gotina neqaşî di zimanê Farisî de, di mana hune-

riya wênekêşandin û nexşkirinê de jî tê bikaranîn, Şerefxan, di Şerefnamê, di behsa jîyana xwe de wiha dibêje: "Min zanistîya neh-w-serf û ya fiqhê tamam kir". Di cîyekî din de jî dibêje: "Min xwendina xwe tamam kir". Vêca mimkun e ku Şerefxan hînî nexşkarîyê jî bûye. Bi taybetî di wî wextê germîya berbelavîya huner ya Sefewîyan de li Îranê jîyaye. Hevçerxê hunermendên mezin ên wek; Mehmedî, Mezfer Elî, Sadiq û Zeynel-abidîn bûye. Wextê Şerefxan di Koşka Şah Tehmasb de dixwend, hunermendê mezin Axa Merkîyê şagirdê Behzat wênekêşekî mala Şah bûye. Ji ber vê yekê, dûr nîne, ku dersên wênekêşanê li ba wî bi xwe xwendibe. Her wiha di wextê Şah Îsmailê Diduyan de, ku Şerefxan bû Mîrê Mîran ê Kurdistanê, Zeynelabidînê hunermend di kitêbxana Şah de kar dikir(16). Mimkun e Şerefxan ji ber hez ji zanistî û hunerî, berhemên çend hunermendên wî çaxî berhev kiribin û li gel xwe anûbin Bedlîsê. Li gora bawerîya min, zêdetirîn kitêbên kitêbxana mezin a Bedlîsê yên wextê Ewdalxan, bi taybetî kitêbên wênekêşan, ku hinek ji wan qelemkêşana mezintirîn hunermendê Sefewîyan ê Behzad bûye, Şerefxan bi xwe berhev kirine û ji derveyê vê, kitêbxane bi xwe jî ya wî bûye û kurên wî Şemseddîn, Dîyaeddîn û Ewdalxanê kurê Dîyaeddîn jî kitêb li ser zêde kirine.

Min hewil da, ku bi rîya reqemên li ser tabloyan û çarçovên li der-dorên wan vê girûgirifta han çareser bikim. Lê, min netîcek wisa bi dest nexist, ku dilê min li ser razî be. Mimkun e, ku ew reqemên li ser wan tabloyan hatine nivîsandin, ên Şerefxan bi xwe bin. Ji ber ku ev reqemên han dişibin bi wan reqemên ku li ser rûpelên kitêbê hatine nivîsandin. Lê, çarçovên der-dorên tabloyan, dişibin bi wan çarçovên rûpelên ku bi xetê xwedîyê destxeta yekem, ku rûpela yekem û hinek jî yên din nivîsandîye, pantir û hinek jî rêk û pêktir in. Panîya wan 2 mm-ne û bi çardorên wê pêkhatîye û rindtir in jî, ku ne dûr e zer bin. Her çend çarçovên nivîsandinên diduyan jî, ku ez wan a Şerefxan dizanim, jê derdikeve ku ji du xetan pêkhatîye; lê, di rastîya xwe de ji çar xetan pêkhatîye û ewî bi tundî destê xwe li ser şidandîye û xwestir derêxistîye pêş. Ji ber vê dişibe du xetan û panîya wê 1,5 mm- e. Çarçovên rûpelên 157 û 197'an, ger çiqas nivîsandinên wan ên nivîsarê duduyan in, lê, diçin ser

rêbaza xwedîyê destxeta yekem. Çarçovên tabloyên hejmara 2, 3, 4, 11 û 13'an, wek a tabloya hejmara 20'an, sê xetî diçe û ya tabloya hejmara yekem jî cihê ye, ji tevan pantir e û nexşek jî di nav xetan de hatiye çêkirin.

Ew rûpela dikeve pêş hejmara yekem, bi destxetê nivîskarê yekem e, dişibe rûpela destê çepê ya rûpela 32'an û di eynî wextê de rûpela destê rastê ya pêşîya wê jî bi destxetê Şerefxan e. Eva han jî zêdetir rê ji bo vê xweş dike, ku tablo wek mesela çarçovan, destkirinên nivîskarê yekem bin.

Her weha ew çarçova ku li pêş tabloya hejmara 17 û 18'an, dişibe ya nivîsarê yekem, li gel wê ku nivîsandina wê bi detsxetê nivîsarê duduyan e. Mîmkun e, ku Şerefxan çarçovên din bikaranîbe, yan her nivîsarê yekem di wan herdu cîyan de hinek tişt rast kiribin. Wî wextî çarçove bi wasita master (raşê) bi derzîyê li ser kartonan durust dikirin û dixistin jêr kaxizan, destê xwe bi ser de dianîn, kopîya wan bi wasita murekebê li ser kaxiza din derdiket, yanî rastîya wê bi derzîyê durust dikirin û bi qelemê jî di ser re diçûn. Her wiha şêwa rêzên rûpelan jî bi vî awayê rastkêşanê didan diyarkirin.

Piştî meh û niv li ser sekinîn û lêkolîna van tabloyan, ez gihîştim vê qeneetê û dikarim van netîcan jê derînim: Ez ê hinek din jî li ser van tabloyan bisekinim, ez li ser vê şopê me, ku ev karên han ê hunerî yên Şerefxan bin. Ji ber ku ew kesê ku ev wêne çêkirine şarezatîya wî gelek zêde li ser Îran û Kurdistanê hebûye. Tabloya 16'an; li ser Şah Tahmasbê kurê Şah Îsmîl e û hatina wî ya bajarê Xelatê ya ser qeraxê Gola Wanê dide teswîrkirin, belga wê yekê ye, ku wênekêş, cilbergên Şah Tehmasb û yên der-dorên wî, bi çavên xwe dîtine û bi awakî rasteqînî eva han çêkirîye. Şah, cilên guldar ên fireh û nivmîl di ser cilên xwe yên din de li xwe kirîye. Serkulavê wî û yên der-dorên wî, gilover in û ber bi jor de teng û zirav dibin, perçek dar, qumaş lê pêçayî di nivê serkulavê wî de qît bûye û mêzerê li ser pêçaye. Yekî wênekêş ê di dema wî de, di kitêba Menzumat Xemse Nîzamî de vî cil û serkulavê di tabloyek xwe de ji bo Kesra Enuşîrwan wêne kêşaye(resimandîye). (Binêre; wêna 279'ê kitêba Finunu'l-Şerqu'l Ewsed Fî 'Usuril-Îslamîyye). Nî'met Îsmîl; nivîskarê vê kitêbê di rûpela

216'an de, wiha dibêje: "Bi vî awayî serkulav di zemanê Şah Tehmasb de di wênên hunerên wênekêşên Sefewîyan de derdiketin. Piştî mirina wî, ber bi kêmbûnê de çû". Gotina xwe wiha didomîne: " Darekî biçûk î sor di nivê rast ê kulavê xwe de dadiçikandin û carina wisa heye rengên wan tê guhertin. Yekem car ev serkulavê han nişana binemala Sefewî û kesên der-dorên wan bûye".

Hunermendekî din di zemanê Şah de, di tabloyeke xwe de, ji bo Xusrew Perwîz, eynî cilûbergên Şah Tehmasb wêne kêşaye -ev behsa han di Şerefnamê de heye- (binêre; wêna hejmara 274'an ya serokaniya pêşî). Eynî cilûbergên Sefewîyan, di tabloyeke hunermendê mezin ê di dema Sultan Mehmed de hatiye çêkirin, ku wek Arnist jî di vî warî de wiha dibêje: "Di wextê Şah Tehmasb de (1524-1576'ê zayînî) rêvebirê Akade-mîya Huner û Pişangehê (sergî) bûye"(17). Tabloya wî, pêş-wazîkirina Îskender ji aliyê Hakanê Çînê ve pêkhatîye. (Binêre: Tabloya hejmara 275'an a cynî serokaniyê).

Diyar e, ev cilûbergên han ên dewra Şah Tehmasb bûne. Hunermendên wî çaxî jî cilûbergên hêja di tabloyên xwe de, ji bo paşayên xwe wêne kêşane. Ji ber vê yekê dubare kirina van cilbergan di tabloyeke Bedlisê de ji bo şexsê Şah Tehmasb, me digihîne wê baweriyê, ku hunermend cilûbergên rasteqînî yên paşayî wênekêşaye û şarezatîya wî di vî warî de hebûye; em dikarin bêjin: Şah, cilûbergên Şah û yên der-dorên wî dîtî hewce ye, eva han jî her dikare Şerefxan bi xwe be, ku di qonaxa Şah Tehmasb de xwendîye.

Her wiha ew ordîya rasteqînî ya di tabloya Şerê Çaldîranê de ye, em ê di dawiyê de bi dirêjayî; li ser warê meşandina şer û tertîba eskerên ordîya Osmanî û Sefewîyan a li ser milê rastê û çepê û pir hejmarîya topên Osmanîyan û çêkirina zincîrên topên wan, kuştina Mehmed Xan Estaclo yê sereskerê Şah Îsmail yê milê çepê, bisekinin. Ev belgên vê yekê ne, ku kesê ev tablo çêkirîne, zanyarîyeke wî ya gelek zêde di derbarê vî şerî de hebûye, vê wêna han bi awakî rasteqînî çêkirîye, ku li gel zanyarîya di nav hinek serokaniyên dîrokê de, wek di Şerefnamê de behsa hinek ji van nehatîye kirin, hevûdu digi-

rin. Divê ew hunermendê xwedîyê van zanyarîyên dîrokî, dîrok nivîsekî wek Şerefyan be û di wextê xwe de gelek zanyarîyên di derbarê vî şerî de, yên di kitêban de peyda nebûne, ji devê xelkên Îranê, Kurdistanê, yan Osmanîyan wergirtibe. Eger yekî din, ji derveyî Şerefyan ev tablo çêkiribûna, nema dikarî wan zanyarîyan di tabloyê de cîh bi cîh bike, ji ber ku her li gora zanyarîyên di nav Şerefnamê de hatine çêkirin. Di bin van nêrîn û bawerîyan de, em bi kêmasî dikarin bêjin, ku ger ewî bi xwe çênekiribe jî, ev tabloyên han di bin serperîştîya Şerefyan de hatîne çêkirin.

Ger çiqas belgeki' tamam û îknakirî di destê me de nîne, lê, ev sirincên han zêdetir min didin bawerkirin, ku mimkun e Şerefyan bi xwe ev tablo çêkiribin. Jixwe eger rûpela yekemîn a vê nusxa han a bidestnivîs a Şerefnamê bimaya, dûr nebû ku ev mesele ron bûbûya.

TABLO Û RÎYA HUNERÎ YA HUNERMENDÊ WÊ

Her yek ji tabloyan li ser rûpeleke taybetî û di cîyên xwe yên nivîsînên kitêbê de hatiye çêkirin. Yek ji wan nebe, ku hinek nivîsandin pê re ye û di nav çarçovê de ye jî, tablo tev di nav çarçovan de hatine çêkirin. Lê, hinek caran wêne ji çarçovan pekîne derve. Her tabloyek li gor mijara nivîsandinê hatiye danîn, yanî; li gel mijara nivîsandinê di nav Şerefnamê de hatiye. Tabloyên wisa tê de hene, ku bi naverokê babetek in û hinek din jî hene, ku du mijarên manayên cihê tê de hene. Yanî; heta nivê wê babetek e û nivê din jî babetek din e. Hunermend, tablo û wênên wê nedaye naskirin. Eva han jî rîya piranîya hunermendên dema Musilmanîyê ye. Edî nasîna wênan û lêkdana mana wan dikeve ser milê wan kesên ku lêkolînê li ser çêdikin. Eva han jî dikeve ser milên wan kesên, ku zanîn û şarezatîya wan di derbarê hunerê wênekêşên Îslamê, dîroka wê hunerê û karaktera hunerî ya dibistanên (ekol) hunerî yên cur bi cur ên dema Selçûkî, Moxolî, Tînur, Sefewî û dibistanên Bexdayê dimîne û her wiha şarezatîya li ser dîroka wê demê ye.

Kesên di nav tabloyan de ne, hemû jî bi rî, serpêçayî ne û cilû

bergên wan rêk û pêk in, awayê dirûtin û cure rewşên wî wextî didin nasandin. Wek mîsal; cîyek wisa di tabloyê de çêdikin, ku li gora cîyên xwe di tabloyê de tên naskirin. Mîran li ser text didin rûniştandin, cilûbergên wan nawaz û rind in. Tacek li ser serê wan datînin, fincana wan li ber wan e, rişî û baweşîn li ser serê wan e. Di çaralî de dora serê wan girtîye û wêna hîvê li pişt wan, yan li ser serê wan e, pasewanên wan li derdorên wan in û hinek tiştên din wek van... Wek mîsal; Sultan Selîm, di tabloya Şerê Çaldiranê de wisa dide naskirin, ku hespê wî mezin e û zengilên wî di milê wî de ne. Qet tu hespekî din di wê tabloyê de wisa mezin û zengilên wî di milê wî de çênekirîye. Her wiha du kes jî di pêş de diçin, ku her yek ji wan teberzînên wan di destê wan de ne, ji bo ku teberzîn di cîyê wiha de, nişana giranbihatî û hêjatîyê ye.

Tabloyên Şerefnamê, ji bilî tabloya Şerê Çaldiranê, ku li gor babeteke asayî datîne, tiji wêne nînin. Her wiha hunermend, hemû wêneyan li der-dorên hev danîye, yanî dûr û nêzikîya wan wek hev wênekêşandîye û dûriya sisîyan nedanîye, li ser du durî; yanî dirêjî û panîyê wênê çêkirîne. Bi awakî din em dikarin wiha bêjin; wênên nêzik mezin û yên dûr jî biçûk çênekirîne. Eva han jî rêbaza piranîya hunermendên zemanê Musilmanîyê bûye, wek el-Rizazê Cizîrî û Wasit (Yehya Bin Mehmud Bin Yehya Bin Ebi el-Hesen Bin Kurîka el-Wasikî).

Dûriya sisîyan, ku di hunera Avrupayê de hebûye, hêdî hêdî di sed sala 15'an de, li ba Musilmanan peyda bûye(18).

Hunermend, wênên xwe bi awakî rasteqînî çêkirine. Ger çendînc pencera mezin a di nav tabloya hejmara 5'an de, ku li ser Cizîrê ye, nişan û remzê xanîyekî mezin e. Her wiha gîya û darûberên di nav tabloyan de jî, guldar bin, yan nebin, rasteqînî nînin û ev çeşne gîya û darûber di siruştê (tebiet) de nînin yanî; bi xeyalî ji ber xwe ve çêkirine, ji siruştê dûr ketine. Bi vî awayî gîya û darûber danenasîn, yanî ji siruştê dûr ketin, di wênên dibistana Moxolan, Tîmur û ya Sefewîyan de jî hene û hunerê Osmanîyan jî rêbaza xwe ji wan girtîye. Em dikarin bêjin, ku hunermendan wênên van gîya û darûberan ji yek-du wergirtine. Lê belê, gîya û dar-berên di nav tabloyên Wasit, ku di sala 636'ê koçî (1237'ê zayîni) di destnivîsa Meqamat

el-Herîrî de çêkirîye, bi van awayan gîya û darûber nînin; pîranîya wan, ji derveyê dara xurmê, mezin in. Ên din hemû ji derveyî siruştê ji serê xwe çêkirine(19).

Gîyayên di tabloyên Şerefnamê de, ku pîranîya wan sosin in, rasteqînî ne. Ev yeka han di tabloya hejmara 15'an de, bi gulên xwe ve baş tèn naskirin. Pîranîya gîyayên din ên di zemîna (erda) tabloyan de hatine raxistin, ne rasteqînî ne. Evên han jî wek ên di dewra dibistanên wextê Musilmanîyê de ji siruştê dûr ketine. Hunermend, di çend wênên Şerefnamê de dev û çavên Kurdan gelek xweşik çêkirine, bi taybetî yên Mîrên Kurdan û yên ku temenê wan dor-berê çil salan û jortir in. Lê dev û çavên xortan; qelew, gilover yan nîv gilover çêkirine, ku eşkalê Kurdan derxistîye pêş. Hinek ji jinan jî, li gor karê dibistana pêş ve, gilover û qelew çêkirine.

Di pîranîya wan dibistanan de wênên bi bejin, çavên jinan gilover û qelew, çav badem, bejin bilind û navteng zirav in. Ev dev û çavên han regeza Turanîyan in û bi hoyê hunerê Îranîyan, li Îraq, Misir û Şamê belav bûye(20). Eva han di pîranîya wênên Wasit de jî tèn dîtin. Her çend wênêkêşê Şerefnamê çavên bademî, bejna bilind, navtenga zirav, dev û çavên gilover ji bo jinên Kurdan çênekirine, ji ber ku çavên jinên Kurdan normal wênêkêşa ne, ji ber vê yekê dev û çavên jinan bi şeweya Moxolîyan, an em bêjin; ji regeza Tirkî wernegirtîye. Hunermend, wênên jinan bê xîşir durist kirine. Eva han jî rêbaza pîranîya hunermendên qerna navendî ye. Her wekî dema Şerexan, dema Moxolîyan, Sefewîyan û Osmanîyan e. Wênên jinan ên wî çaxî di hêla xîşran de kê m in.

Hunermend, pîranîya wênên xortan bê rî û simbêl çêkirine û pîranîya wan kesên ku salên wan li pêş in, di wênan de simbêlên wan hene û hinek ji wan bi rî û hinek jî bê rî ne. Pîranîya mîrên Kurdan rî û simbêlên wan hene, rîyê hinekan tenik û yê hinekan jî bitr in; wek rîyê bitr û mezin ê Esededdînê Hekarîyê û yê Mîr İbrahîmê Bedlîsî. Yên hinekan jî rîyekî kê m li ser çena wan hiştîye, wek yê wî suwarê di tabloya hejmara 12'an de, ku di derbarê Fermanrewatîya Hekarîyê de ye. Cûrek rîyê din jî heye, ku wek ên poşîyê (kermêşê) çend mûyek li ser çena wan in, lê wek xetek ben di ber guhên wan re çûyc.

Ewliya Çelebî di sala 1065'ê koçî (1654-1655'ê zayînî) di rûpela 209'ê cilda çaran a Seyahetnama xwe de wiha dibêje: "*Kurdên navça Hekarîyê, simbêlê wan qît in. Ji derveyî wan hinek kesên ku piçek rî li ser çena xwe dihêlin, piraniya wan rîyên xwe kurtîdikin. Her wiha gulîyekî (kakulekî) tenik di nav çavên xwe de berdidin*". Di rûpela 317'an de jî wiha dibêje: "*Kurdên Eşîreta Mehmudîyan, ên navça Wanê, rîyên xwe kurtnakin û bi rengê al, hişîn, sor û zer direngînin*".

Ger çiqas deskarê Sefewîyan, yan ên dibistanên huneriyê yên berî wê di wênên Şerefnamê de bèn dîtin, lê, eva han tişteki ne ecêb e û ji qîmeta wan tişteki kêma nake. Ji ber ku hunerên gelên cûr bi cûr tesîr û kar li ser yek û du dikin û kirine. Ji ber dirêj û firehbûna vê xalê em zêde li ser nadomînin. Em dikarin bi kurtî vêya han bêjin; dibistana hunerî ya Bexdayê jî gelek tişt ji hunera Selçukî, Îranî û ya mesîhiyên Rojhilat wergirtine. Van deyne cîyekî, heta karê hunerî yê Sasanîyan, Manî û Helenîstîyan jî di wênên wan de dîyar in. Ev yeka han ji aliyê Dr. Zekî Mihemmed Hesen û yên din ve jî hatiye gotin(21). Wasit, ku mezintirîn wênekêş dibistana Bexdayê tê hesêb kirin, ev tesîrên han di wênên wî de jî derketine.

Wek me di pêş de jî got, piştî vê mijarê, em ê bikevin lêkolîna tabloyan û warê hunera wan. Vêca, ger min di hinek noqtan de şaşî kiribe, ez daxwaz dikim; kesên din bila ji min re rast bikin, ji ber ku ev babeta han aloz û dijwar e û ev mijara han jî ji bo me yekemîn -qasî ku ez pê dizanim- behseke taybetî ye, ku heta niha li ser milê nû yê van keleşorên me yên ku ji aliyê babûbapîrên me de hatine danîn, beşek e ji hunera wênekêşî û "hîm danîna" hunera Kurd e.

Ez baştir dibînim, niha behsa tablo û wêneyan bikim. Mîmkun e û ne dûr e, ku ez di hinek waran de, ber bi hinek şaşîyan de çûbim. Ji ber ku wêne, bi awakî mezinkirî û bi deq û deq li gor nusxa bingehîn nehatine girtin. Ji ber astenga min a bi çavên min re, ez rawestandina li ser çend wênan kurt dibirim. Min jî ji ber van sebebên û di ser de jî ji ber acizbûnîya çavên xwe, îhmalkarinê nekir, ger ji ber van hoyan, min şaşîyek kiribe, ez daxwaza lêborînê dikim(22).

TABLOYA YEKEM
MENZEREKE (DÊMENEKE)
NÊÇÎRÊ LÎ HEKARÎYÊ

Tabloya yekem a Şerefnamê, behsa Fermanrewatiya Hekarîyê dike. Ji dêmeneke nêçîrê ya di navçeke çîya de pêk-hatiye, ku bêguman, mebesta hunermend ji vê, ev navça han çîya ye û gelek asê ye. Nêçîr, di rojek bi 'ewir (hewir) de hatiye kirin. Nêçîrvan, bi siwar û peya, bi tañî û bazên xwe ve li çîyê belav bûne. Mirovekî risipî bi çarmêrkî li bin darekê û li ser kevirekî bilind rûniştîye, ji bo ku li dêmena nêçîra bin xwe binêre. Cilûbergên wî dişibin ên mîrên Kurdan. Serkulavekî mezin, kewaw û kirasekî dirêj ê guldar lê ye û tiştêkî wok gulinge di pişt serkulavê wî re bilind bûye. Ger eva han ne gulinge be -ku hunermendê tabloyan bi vî awayî gulingan ji bo çend mêrên Kurdên din jî bikaranîye- ez nizanim ka çîye. Bi şêl û rewşa xwe ve dixûyê ku ev mirovê han mîrekî Hekarîyê be. Zekerîya Begê kurê Zeynel Beg, di wextê temambûna Şerefnamê de, sala 1597'ê zayînî- Mîrê Hekarîyê bûye. Mîr, destê xwe ber bi kurekî 10-11 salî de dirêj kirîye, ku ji cilûbergên wî tên xuyakirin, mimkun e ji malbateke mezin be, kulavê serî jî tiştêkî ecêb e, naşibe senetê Kurdan. Ji ber ku wek fesana serpan e, çarmedora wî bi panî der-dora serê wî girtîye û

nava wî fire ye. Qeraxê rexê wî nêzikî nav çavên wî bûne û valatîyeke sê koşe di nav xwe de hiştîye -yanî bi vî awayê wî ve, ez baş tê negihîştîm. Ne dûr e, ku di wî wextî de ev cûre kulavên han ji bo kurên mîran ji aliyê Rojhilat ve hatibin anîn. Eva han jî mimkun e ku kurê Mîrê Hekarîyê be. Tê dîtî ku pîranîya kesên di wênan de, bi cilûbergên xwe, cîh û rewşa rûniştinên xwe, yan şêla sekinandina xwe tên naskirin. Ji ber ku hunermend, di wextê wênekêşanên xwe de riayetî van xalên kirîye. Di tabloyê de destek musîqajen li ser bilindtirin cîyê navça nêçirê sekinîne. Aletên wan ên musîqajenîyê, ji dehol, zurne û boqê pêkhatîye. Boqlêder, li milê rastê, zurnejen li nivê û deholvan jî, ku darê xwe bilind kirîye, li milê çepê ye. Her sê jî li milê rastê yê Mîr sekinîne, berê xwe ber bi jêr ve kirine û li musîqayê dixin, da ku nêçirêk di wan navçan de hebe, ber bi nêçirvanan de rakin. Ne dûr e, ku ev musîqa han, ji bo dilxweşîya nêçirvanan jî tê lêdan, boq, ketîye ber kevirêkî, ji ber vê du perçe têt dîtî. Zurne jî bi wî awayê em dizanin nîne, serê wê hilû ye, qeraxa devê wê sitor e û bazindî ye. Dehul jî hinek dirêj e, di awayê wê dehulê de ye, ku di destnivîsa İbnî el-Rizazê Cizîrî de hatîye, yanî wek yê di destê musîqajenekî di nav wêna li ser seeta Cizîrê ye. (Binêre; wêna rûpela 265'an a kitêba el-Alatu'l-Musîqîyye Fî'l 'Usurî'l - İslamîyye Dr. Subhî Enwer Reşîd). Dehul di Kurdistanê de gelek kevn e û du hezar sal berî zayîni jî li İraqê hebûye.

Destek(taximek) musîqajen di tabloyê de heye, kulavê li serê wan wek yê Mîr spî ye. Mirovekî din li jêrî cîyê Mîr heye, wisa dixuyê, ku defek di destê wî de ye. Di binya wî de jî bazevan têt, ku siwarê hespekî spî ye û tetikên (lepik-destik) wî jî di destê wî de ne, destê xwe rakirîye hewa ji bo ku baz bê, li ser deyne. Di destê din ê bazevan de rimeka dirêj heye ku serê wê ber bi jor de bilind kirîye û dike ku li singa mirovekî kulav spî bide, ku eva han li ser destê rastê yê kurekî ye û ewî jî destê xwe avêtîye rima xwe. Wisa dixuyê ev mirovê han kesekî nêzikê Mîrê Hekarîyê be, ku ew jî temaşekerekî nêçirê ye.

Di dawîya tabloyê de, hirçek hatîye çêkirin, êrîş anîye ser nêçirvanekî û ew avêtîye erdê, mirov jî xencera xwe kêşaye û

hevalên wî û tajî jî ji bo xelasiya wî hatine wir. Ew kesên hatine hewara xelasiya wî mirovî, yek jî wan tîrûkivanên wî di destê wî de ne û siwarekî kulavqoç e. Şalwar û sitarxaniyek lê ye û rima xwe ber bi hirçê de dirêj kirîye. Du mirovên peya jî li pişt wî siwarî ne, destên xwe ber bi kevne kevirekî ve kirine, ku eva han ne dût e kevne rêçek an jî şikeftê be. Hinek nêçîrvan jî torbên xwe bi piştê xwe ve girêdane. Li jêrî musîqajenan, siwarek heye şalê wî lê ye, çend xal li ser şalê wî hene. Evên han wek wan cure gulan in, ku di navçên Behdînan û Kurdistanê Bakur de, li ser şal û şapikan nexş dikin. Bi vî awayî şal û şapik, ên navçê Tiyarê ne, ku Asurîyan li Hekarîyê durust dikirin. Di wextê xwe de gelek belav bûye. Şal û şapikên guldar ên Zaxo, Şernex, Mûş û Mêrdînê jî bi navê deng in. Di sala 728'ê koçî (1327-1328'ê zayînî) de İbnî Batute çûye Mêrdînê û di vî warê de wiha gotîye : *"Li Mêrdînê şal û şapik ji qumaşên keş çêdikin"*(23).

TABLOYA DÏDUYAN

DAGÏRKÏRINA KELA DÏZË

Tabloya diduyan, di rûpela 33'an de ye û li hemberî tabloya yekem e. Ew jî her li ser Fermanrewatîya Hekarîyê ye, ku ev Fermanrewatîya han yek ji wan Mîrektîyên Kurdan ên herî bi hêztir bûye. Tablo, dagîrkirina Kela Dêzê ji aliyê Mîr Esededdîn û Asurîyan de -di wextê Dewleta Akkoyunluyan de (1403?-1508'ê zayînî) nîşan dide. Şerefhan, di rûpela 34'an de, wiha dibêje: "*Esededdîn, yek ji kurên Mîrê Hekarîyê kurê Gulabê kurê Emadeddîn(24) bûye*", diçe Misrê ba Sultanên Çerkezan û di şeran de azayetî û mêranîyan pêşan dide. Di şerekî de destekî wî tê birîn, Sultan jî destekî zêr jê re dide çêkirin. Di wê navê re li Hekarîyê jî, Dewleta Akkoyunlu ya Tirkman a di zemanê Hesênê Dirêj de (1453-1478'ê zayînî) êrîşê dibe ser Mîrê Hekarîyê İzzeddînşêr û ewî dikûje. Fermanrewatîya Hekarîyê dagîr dike û dide destê Eşîreta Kurd a Dumbulî, ku ew diji Mîrê Hekarîyê bûne. Di wê navê re, hinek Asurîyên ji navça nahîya Dêzê -li Hekarîyê melbendeke Şemîzdînan e- ji bo kesp û kar diçin Şamê û Misrê. Li wir Esededdîn dibînin. Daxwazê jê dikin, ku bi wan re vegere welat û ji bo rizgarkirina navça Hekarîyê alîkarîya wan bike. Ew jî vedigere û bi dizî li navça Şemîzdînan di nav Asurîyan de dimîne. Rojeke şembîyê, ku qet tu kar û xebat di nav wan de nayê kirin, tenê karê ji bo darên şewatê û pêwistîyên din di nav kelê de tên kirin, Esededdîn, cilûbergên Asurîyan li xwe dike û bi gire

girê Asurîyan re çek û cilûbergên xwe yên şer di nav barên xwe de vedişêrin û dikevin nav kelê. Dema dikevin nav kelê, cilû bergên xwe yên şerî li xwe dikin, Dunbuliyên di nav kelê de dikujin û kelê ji wan rizgar dikin. Êdî Esededdîn, hêdî hêdî Hekarîyê ji dijminan (ku Dunbulî û Akkoyunlu ne) azad dike û carek din Fermanrewatîya Hekarîyê dide domandin.

Ev tabloya han ji bo wê bûyera dîrokî hatiye çêkirin û ji du dêmengan pêkhatiye.

Dêmena yekem; ji beşa tabloyê ya xwarê pêk têt, ku hewil-dana girtina Kela Dêzê ye. Di wê beşa tabloyê de têt xuyakirin, ku Asurî bi ker û barên xwe ve diçin ber derîyê kelê û dergevanê kelê jî di wênê de yekî xêşim û nezan çêkirîye, ji ber ku derî li wan vedike. Edî wekî me behs kir, dikevin hundurê kelê û kelê digirin.

Dêmena diduyan; ji nivê jorê tabloyê pêkhatiye. Di vê beşa han de, em dibînin, ku Esededdîn kelê wergirtîye, li ser bane-kî rûniştîye û bi dilxweşî mijûlî şerab vexwarinê ye. Hunermend, wêna Esededdîn bi simbêlekî mezin û bi rî çêkirîye û serkulavak û cilûbergên mîran jî lê kirîye. Xizmetkarekî sîniyek dirêj li hemberî wî girtîye. Şûşek jî di destê Esededdîn de ye û mijûlî cureke şerab vexwarinê ye. Yekê din jî li defê dixê û stranan jê re dibêje. Ne dûr e xulamek e û hinên din jî di binîya wan de ne û ber bi wî derîyî ve têt. Yek ji wan destê xwe li derî dixê, ku ev milê han beşek din a kelê ye. Wek me di pêş de di derbarê Kurdên Hekarîyê de ji Ewliya Çelebî wergirtibû; mirovekî din jî rîyek mezin a wek def li ser e. Vî mirovê han du cot perrên teyran kiriye ber serkulavê xwe û li tenburê dixê. Hinek wêdetir, du kesên din mertalên wan li pişt wan in û bi şêla xwe ve dişibin bi wî mirovê, ku destê xwe li derî dixê. Wisa dixuyê, ev kesên han ji bo pîrozbahîya Mîrê Hekarîyê hatine.

Di tabloyê de, çend topên lûlên wan jê hatin derêxistin di dîwar de bi awakî dirêj wek qelşek çêkirine. Di wî wextî de, yanî zemanê Hesenê Dirêj ê Sultanê Akkoyunluyan de top hebûne û Sultan Mehmed Fatîh jî di sala 864'ê koçî (1453'ê zayînî) de di dagîrkirina Stenbolê de top bikaranîye.

Not:

1) Hewce ye em bala vè noqta han a ku tabloyên tê de cilûbergên wek kortek (kurtik) hatine wêne kirin, bikişînin. Ji ber ku ew Asuriyê ku li ber Kela Dêzê serê kerê girtîye, kortek lê ye. Eva han jî ji dirûtina wê tê zanîn. Wî çaxî pembo dikirin nav kortekê û bi sitûrî dihat dirûtin. Ji serî heta binî kitêlên dirûnê lê dihat xistin, ji derveyê kepenekê (ferencî) di ser hemû cilan de dihat lixwekirin. Kortek cîyê qaputên îro girtîye. Heta ser çokan dihat û ne tenê di nav Asuriyan de, di nav Kurdan de jî belav bûye. Di wênê de, Asuriyek korteka xwe li gel derpê xwe yê spî pêçaye û xistîye bin piştîniya xwe.

Şerefhan wiha dibêje: "*Esededdîn cilûbergên Asuriyan li xwe dikir*". Eva han vê dide nîşandan, ku yan cilûbergên wan jî yên Kurdên Musilman cîyê bûne yan jî di çend tiştan de ferqek di navbera wan de hebûye. Lê, di wênên Asuriyan de kortek dîyar e û ser-kulavê kortekê bi berê xwe li yê melayên şî'eyan diçe û sikura(yaxa) wî jî bi panî hatîye wergerandin, li wî mirovê pêşê kortek e, yanî ew kesê tenbûr di dest de diçe. Ev jî heye, eger ku ew ê dawîyê Asurî be her wiha ew ê ku li pêşîya xwedanê kerê, cilekî dirêj ê belavî lê ye, yanî pêşîra cilê wî nehatîye dadan û piştîniyê jî li ser girêdaye. Cilûbergên mirovê sisîyan ê di dawîya tabloyê de, ku nêzikî deriyê surha kelê ye, wek yê mirovê diduyan e. Bêguman ev sikura pan, ku ji yê sitarxanê pantir e, di cilûbergên Kurdî de nîne. Mîmkun e gundîyên Asuriyan, van jî gundîyên Ewropiyan yan jî bi awakî raste-rast li gora sikurpanîya keşeyên xwe çêkirine.

2) Miradxanî jî di wê tabloyê de heye û li mirovê ku li pişt xwedîyê tenburê ye û mertal li piştta wî heye.

3) Li gor tabloyê, Kela Dêzê di nav surhekê de ye, yanî li ser kaşeberekî bilind hatîye avakirin û surha wê jî di binîya wê de ye. Odek li ber deriyê surhê çêkirî ye, ku eva han cîyê nobedaran e û li ser deriyê pêşîyê ye. Ger eva han ode jî nebe ew eywaneke bi derî ye. Bi dîwar bilind kirîye û topek li ser serbanê derî danîye û lûla wê jî derketîye ji der ve, lê, kapang hesin e. Deriyê kelê ne wek yê surhê ye. Ji ber ku awayê deriyê surhê nêzikî yê "kivanê benderumî" ye. Lê, ev kivanê

han şikestî ye, bi awayê xwe ve sade ye û nexşeke gîyayê rind ser derî ye, nivîsînek bi kofî jî li ser serdera wî ye. Ger çiqas ev nivîsîna han di wênê de gelek biçûk bû, xwendina wê jî gelek asê bû, lê, piştî gelek zehmetîyan min karî ez wê bipişkêvim û bixwînim, ku deqa wê eva han e:

"Bimanet sparde Xweda Qel'e Diz".

Yanî; "Kela Dêzê di saya Xwedê de bimîne".

Burcek li ser derî ye, lulên du topan di tenîştên rast û çepê yê burcê re hatine derve. Heft rêz kun di burcê de ne, ku evên han wextê şer ji bo tiving teqandin û tîr avêtinê hatine bikaranîn. Ew kunên ji bo tiving teqandinê hatine çêkirin, gilover in û yê topan jî -wek di tabloyê de tên xuyakirin- dirêj in. Ev cûre burcên han ji bo şer tên bikaranîn. Di milê hundur de du qat e, wextê şer, hinek ji şerkeran raketî, hinek ser çokan û hinek jî ser pîyan bi wasita wan kunan şer dikin. Li gor topografya erda Kurdistanê, yanî li gor bilindayî û nizmîya ew cîyê kel li wir dihat durust kirin, wisa pêwîst dikir; rêzek kun di hemû milên kelê de ji bo guleavêtin û şerkirinê bên amadekirin. Di roja 16.08.1977'an de, nimuneke gelek hêja bi vî awayê kunên kelan rastî min hat, ku kun du qat e û biçûk e jî. Eva han di dawîya rêzekevîrên diwarê Bakur ê Çemê Pawan ê Rojhilatê Dîclê de ye. Rîya dirokî ya kevin a Rojhilatê Dîclê jî her di vir re derbaz bûye û nêzikî 20 kilomêtran li bakûrê Findika Botan e. Qasî ku ez dizanim, Kela Wanê, ciwantirîn nimunê van curên kelên Kurdistanê ye.

Bi awayê endazeyî ya di Kela Dêzê de diyar e, ku du qat bûye. Derîyê kelê girtî ye, du derî ne, mimkun e hesin jî be. Ji ber ku ger dar bûya, derzekên textan dê tê de bihata diyar kirin. Eger di bingeha xwe de jî dar be, lê rûyê wê hesin e. Hesinê ser derîyê wî (mebest jî vî hesinî, ew e ku ya di şûna zilên îroyîn de hatiye bikaranîn-Elîşêr.) jî, eynî di derîyên kelên din de jî hatine bikaranîn. Ez dikarim vêya han bêjim, ku ev awe hesinên han ên ser derîyan, niha jî li ser derîyên xaniyên Kurdistana Başûr hene. Çend derîyên din ên di tabloyê de wek vî derîyî ne, ji bo vê ez naxwazim van zanyariyên han dubare bikim.

TABLOYA SISÛYAN AMEDIYÊ

Tabloya sisûyan, di rûpela 38'an de ye, ev û tabloya çaran jî li ser Fermanrewatîya Behdînan in. Ev tabloya han jî dêmenê beşek bajarê Amedî pêkhatîye û gelek jî li wê mebestê gonca ye. Ji ber ku Amedî, li ser çîyayekî avakirî ye, ku çardorên wê wek bajarên pêşîn -ku surhan jî wan re çêkirîye- Çîyayê Berdelanê ye. Ev surha Amediyê ya melbenda Fermanrewatîya Behdînan surheka tabîî ye. Em dibînin, ew xaniyên nexîşdar li ser çîyekî kevirên bilind û bi kevirên neqarî yê mezînan avakirî ne. Di vê de serayên Mîrên Behdînan nişan dide, ku evên han dikevin ser qeraxên Rojhilata bajarê Amediyê. Gelek mixabin, niha tenê deriyê wê yê mezînan jê maye, wêna du ejderhan û ya teyrê sîmir jî ser hatîye kolan. Ev deriyê han ê entîke, jî du kevirên mezînan û çar kevirên din pêk hatîye. Di wextê xwe de qeymeqamekî nezan ev seray daye xirakirin, jî ber vê jî gunehekî mezînan di derbarê keleporekî Kurdî de kirîye.

Di tabloyê de, mirovekî xort li serbanê serayê ye, cilûbergekî bi qîmetê mîran wergirtîye, mêzereke jî qumaş durustkirî li dora kulavekî spî serê xwe pêçaye. Kewayekî sirmedar û ki-

rasekî guldar ê ku ji qumaşê biqîmet hatî çêkirin jî lê ye. Di pêşî de me behsa cilûbergên Mîrên Behdînan ên ku min ji kitêba Rîch girtibûn, kir. Mirovek li gel wî xortê sipehî diaxive. Ji şêla wan derdikeve ku ew xortê sipehî ji yê din mezintir e. Lê, li gora bawerîya min, ev xortê han Seyîdxan Begê Mîrê Behdînan e, ku kurê Qubadxanê kurê Sultan Huseyn e. Ew, di wextê temambûna Şerefnamê de, Mîrê Behdînan bûye. Şeref-xan, di rûpela 42'an a Şerefnamê de behsa wî kirîye. Şeref-xan wiha dibêje: *"Xortekî bi qîmet, aza û welatparêz, bi piştgirîya xalê xwe Silêman Begê Mîrê Soran, di nîverasta meha Zilhecce ya 993'ê koçî (1585'ê zayînî) de gihîşte Amediyê û bû mîr"*(25).

Mirovek li ser destê rastê yê serayê dixuyê, kal e û rîyê wî dirêj e. Destekî xwe xistîye binguhê xwe, mirov dibêje qey stranan dibêje. Destê wî yê din jî li ber devê wî ye û li xelkê binîya kelê dinêre, ku ew li musîqayê dixin û şahîyê dîkin. Ji rengê wî kalemêrî derdikeve, wek ku xemgîn be.

Nobedarek rim di dest de li ber kelê ye. Teyrekî nêçîrê li ser destê çepê yê derîyê serayê ye. Bazevan lepik di dest de ye û mirovekî destê xwe danîye ser milê, ku ev meriv di wênê de baş nayê xuyakirin; bi destê din jî erdê nîşan dide. Li ber serayê li derveyê bajêr, birek xelk bi şahîyê mijûl in û govend dîkin. Yek ji wan li ser çokên xwe rûniştîye li bilûrê dixe. Yekî din li pişt wî û ser milê rastê yê tabloyê li defê dixe. Mirovekî din jî li pêşîya wan e, çokên xwe gîhandîye erdê û dilize. Qasî min seh kirîye dibêjin; Kurd bi tena serê xwe nalîzin, bi ref û gurub dilîzin û şahîyan dîkin. Tenê li Behdînan bi tenîya xwe kes dilîzin. Ca êdî ez nizamim, ev bi tenê lîstin her ji berê de li Behdînan belav bûye yan nû peyda bûye û ji bîyanîyan girtine? Ew mirovê ser pîyan, cilûbergeki fireh û dirêj lê ye, ku kewayekî dirêj ê bimil e. Piştînyeka dirêj li ser girêdayî ye, serekî wî yê wek reqasan berdayî û xwar pêkhatîye. Her wiha kirasekî kin û derpêyekî spî (pembeyê xetxetî. n. J. N.) li xwe kirîye. Serkulavê wî jî spî û mezin e, rîşîkiri ye û perrê teyrekî jî di bera kirîye. Li milê din mirovekî din rûniştîye, ne dûr e, li gor şêla rûniştina wî, li dabûrqê dixe. Lê, wêne di vî milî de têk çûye. Serkulavê wî ji qumaşê xetdar(xet-xetî) e, ku

ihfîmaleke mezin e ji qumaşê mişkî be. Eva han jî li ba Kurdên Iranê û li navça Silêmanîyê bi qîmet e û niha jî her heye.

Ez pêwistî dizanim, ku van xalên han ên derbarê tabloyê de ronî bikim.

1)Di vê tabloyê de, wêna bilûrê hatîye çêkirin, ku eva han aletekî musîqî yê Kurdistanê ye, gelek kevn e. Em dikarin bê-jin; ew jî çend hezar sal berê niha ve di Kurdistanê de hebûye. Bila eva han neyê wê manê ku em ji ber xwe ve vî tiştê han dibêjin û li ser dirêj dikin, ji ber ku eva han kevintirîn aletê musîqayê ye, ku mirov dikare ji qamîş û dar durust bike. Dr.Subhî Enwer Reşît wiha dibêje: "*Bilûr, ne tenê pênc hezar sal berî zayînê li Iraqê hebûye, rêçên vê aleta han di Çerxa Kevir de jî tê dîtin*"(26). Hêjayê gotinê ye, wênên bilûrê di nav wênên Ibnu'l-Rizaz ê Cizîrî de jî tên dîtin. Wê seeta mezin a li Cizîrê çêkirîye wênên siwarek û pênc musîqejenan li ser in. Cizîrî, endazîyarek mekanîk û dahîyek ji xelkê Cizîra Botan bûye(27).

2)Ew defa di vê tabloyê û ya di tabloya hejmara nehan de wêna wan hatîye çêkirin, bi Kurdî jê re "dafincan" tê gotin. Yanî; "def sincan". Ew def e ku senca wê heye. Senc; perçe hes-ineke xistinê, ku tenik e û cût cût di qeraxê defê de hatîye qayîmkirin. Defên wisa hene ku pênc sencên wan hene, yanî; pênc cût senc. Di wextê destlêxistinê de zingînî jê tê. Li Iraqê jî vê defê re el-def el-zincarî dibêjin. Di kitêban de el-def el-Misrî jî hatîye. Dûr nîne Ereban ev navê han jî def sincan wer-girtibin. Defên Kurdî yê derwêş û ehlên tesewwufê bi-kartînin, senc tê de nînin, piçek têlên gilover di der-dorê wê de ye û li milê wê yê hindûr hatîye pêçandin. Dafincan, di Kur-dewariyê de nîne û defa Kurdî jî di şahîyan de nayê bikar-anîn. Li nav bajaran defên biçûk (yanî dafincan) li gel aletên din ên musîqayê tên bikaranîn.

TABLOYA ÇARAN
DÛBÛSTANEKE NEXWEŞXANÊ
Û BÛZÛŞKIYÊ LI AMEDIYÊ

Tabloya çaran, li hemberê tabloya sisîyan e û di rûpela 39'an de ye. Behsa Fermanrewatîya Hekarîyê dike û ji du babetan pêkhatîye. Nîvê serê wê yê jorê dêmena dibistanekê ye li bajarê Amediyê û nîvê xwarê yê tabloyê ji wêna listika qaşwanê ye(yarîya qaşwan).

Di beşê jor de, wêna xanîyekî tê xuyakirin, evê han dikeve ser qeraxê surha bajarê Amediyê, ku surheke tabîî a bi kevir e, xelkê Amediyê jê re surh dibêjin. Ji ber ku çarmedorê bajêr Çîyayê Berdelanê yê asê ye û wek surh çûye-hatîye. Xanîyên wan li ser qeraxê surhê ne, rûyên wan ên ji der ve û deriyên wan dikevin ser kolanên nav bajêr. Herçî hewş, eywan û deriyên avahîyên heywanan ji wek wênên vî xanîyî ne û rûyên wan ber bi derveyî bajêr û çîya ye. (Ez di sala 1983'an de, çûm Amediyê û min terza bînasazîya vî bajarî kola). Sekoyeke bilind a di hewşa wî xanîyî de, li ser çend qubhên gilover û biçûk ên nexîşdar hatîye durust kirin û mehfûreke rind û sipehî li ser

hatîye raxistin. Mirovekî sal mezin li ser rûniştîye, ku beşeke wênê di tabloyê de ronî nîne. Ev mirovê han li ser çokeke xwe rûniştîye û destekî xwe danîye ser çoka xwe û çoka xwe ya din jî bilind kirîye. Ev mirovê han dişibe yek ji zanayên dînî. Bu-feyek li teniştê wî ye, şerbikek wek şûşeke piçûk û xetdar tê de ye, ev şerbikê han jî ji ber biçûkbûna xwe bi kêra avvexwarinê nayê. Ji ber vê mimkun e ji bo derman bikaranînê be. Ji ber ku bizişkên kevin van cûre şerbikan ji bo derman parastinê bikar dianîn, ku milê wî yê der ve bi cure boyaxek siwax kirine, ev boyaxa han nahêle ne av û ne jî tiştêk din ên şilavî jê bipale. Ger eva han şûşe be, mimkun e şûşa murekebê be.

Xortek li hemberî wî mirovî û nezîkê derîyê xanî ye. Cilek ji qumaşekî bi qîmet li xwe kirîye, ku nexşên gîhayan û heywanatan li ser in, wek resmê şêr û teyr, ku pê diçe ev teyrê han bilbil be. Kitêbek mezin di destê wî kurî de ye. Lê, kitêb ne vekirî ye, girtî ye. Eva han jî bi hoyê hunerîya rûpelgirtina çarçova dora wê em dizanin. Xort, xwendevanê li ber destê wî melayî ye û di dibistanê de dixwîne. Du kes li xwarê sekoyê rûdinin, tenê serê wan dîyar e. Yek ji wan gelek xort e, dixuyê ew jî xwendevan be, yê diduyan jî, wêna wî baş nayê kifşkirinê. Mimkun e bi temenê xwe di tanga wî mirovê rîspî re be û mela jî be. Li nêzikî wî xwendevanî yekî kitêb di destê de, qismek serê wî mirovî di ber dîwarê surha dibistanê re derketîye. Ev xortek bi simbêl e û şêla pêçandina mêzera wî ya mor jî ecêb e. Mirovek din li ser banê dibistanê ye û ji mêzera wî tê naskirin, ku mela ye. Ji ber ku lefkên mêzera wî hene. Mirov dike bêje, ku mela li gel yekî diaxive, lê, wêna wî ne ronî ye û qet şik tê de nîne, ku wênek din li hemberê wî heye û di tabloyê da nayê dîtin (di tabloya rengîn de xweş tê dîtin ku ev jînek e. n. J. N.)

Di xwarê dibistanê de du xort hene. Yek ji wan cilekî wek si-tarxanî li xwe kirîye û mêzera wî spî ye. Wek em di piranîya wênên tabloyên din de dibînin, ji bo rindî û qayîmkirinê, perçekî reş, li mêzera xwe girêdaye. Vî Xortê han destê xwe ber bi gîyayekî de birîye ji bo ku biçîne, yê din jî, ku cilên wî şînê tarî ne û li piştê din e, destê xwe bi aliyê wî de dirêj kirîye, ku gîya jê bigre û bike nav qevda gîyayê destê xwe. Ev

herdu xortên han xwendevanên dibistanê ne û ew gîya jî sosin e, ku di çend tabloyên din ên Şerefnamê de hene û di tabloya hejmara 15'an de, wan sosinan gul jî vedane. Carnan bizişkân derman ji van cure sosinan durust dikirin. Sed cure sosin hene, wek vêya han di kitêba Edwar Xalib, el-Mewsu'e Fi 'Ulûm el-Tebi'e, di cilda yekem û rûpela 579'an de hatiye behskirin. Bizişkên Yunaniyan, van cure sosinan, wek gîyayê bizişkîyê hesêb kirine. Bi Yunanî ji vî gîyayî re "îrsa" dibêjin. Bizişkên Musilmanan ên wek Huneyn Bin Îshaq Bin el-Beytar Bin Hebl û Ebu 'Omran el-Qertibî û Dawud Entakî û hinekên din, behskirine, ku sosin bûye dermanê çend nexweşîyan. Bizişkân gotine; sosin, dermanê nefestengbûnê, bawesîr, êşa ser û ji bo cîger, birînan, kurmavêtin, zarokanîn, zêdeketina cilan û ji bo nexweşîyên rehîmê yên ji ber zarokanînê jî bi feyde ye. Ev cure sosinên han kulfîkên lask dirêj vedikin, evên han xwe bi xwe li çîyayên Kurdistanê hişîn nebûne, ji ber ku xelkê di nav goristanan de çandine. Niha jî li Kurdistana Îraqê di nav şeqam, baxên giştî û baxçên malan de tîn çandin. Dawud el-Entakî wiha dibêje: *"Sosin, li bajarê Şamê heye û li Kurdistanê jî gelek e"* (28). Li navça Botan hinek jê re şîşelaq dibêjin. Li Cizîrê her jê re sosin dibêjin û evên li vir ji wan sosinên ku li navçên Botan û Behdînan hêşîn dibin, mezintir e. Edwar Xalib, ji sosina Şengarê re sosin Sincar gotiye û di vî warî de wiha dibêje: *"Eslê bingeha wê Cizîra Botan e"*. Di rastîya xwe de, wek di tabloyên Şerefnamê de jî hatiye nîşandan, bizişkên Kurdistanê dermanan ji gîyayên bizişkîyê durust kirine, ku li Kurdistanê gelek bûne; vêca çî yên di çerxa navendî de bin, ên wek bizişkê dermanger İbn Dînar, ku bizişkekî Dewleta Dostkî ya Kurd bûye û çî jî di van nêzîkan de, yên wek bizişkên me yên millî, Mela Rewşenê Mendelî, Kerîmê Mam Cewahirê Kelhura Somarê, Feqî Huseynê Mentkî, Gulê Re'be, Nene Kotir û Hepse Ezîz bin (29).

Dûr nîne ewên me bi dibistan bi nav kirine, nexweşxane û dibistanên bizişkîyê bi hev re bin. Ji bo vê jî du belge di destê min de hene; belga yekem; ew şûşe yan şerbîkê di nav bufê de ye, ku zêdetir dişibe dermanxana nexweşxanên dewra İslamîyetê, ku dermanan tê de diparastin. Eva han ji bo nîşana

nexweşxanê ye. Belga diduyan; ew herdu xwendevan in, ku mijûlî berhevkirina gîyayên bizişkîyê ne. Hêjayê gotinê ye, di şaristanîyeta Îslamîyetê de, dibistanên bizişkîyê perçek ji nexweşxanê bûne. Yanî dibistanên bizişkîyê di nexweşxanan de hebûne. Wek nexweşxane û dibistana bizişkîyê ya bajarê Farqînê ya paytextê Dewleta Dostkîyan. Vêca pê diçe, nexweşxane û dibistanên bizişkîyê li bajarê Amediyê yê Fermanrewatîya Behdînan hebe. Şerefyan jî, dibe ku yan jî hinek kesan yan jî ji Beyram Begê kurê Sultan Huseynê Behdînanî sehkiribe, ku di wextê Şerefyan de, Mîrêmîran ê Kurdistanê bûye -di wextê Şah Îsmailê diduyan de- di navekê re jî Beyram Beg, li ba Şah penaber bûye. Ew çax Amêd, melbendekê zanistîyê ya Kurdistanê bûye. Bi dibistanên xwe yên mezin ên bi qubbe ve bi nav û deng bûye, ku di sedsala 16'an de, Sultan Huseyn bingeha wê danîye(30). Heta niha qet nayê bîra min û ez di tu serokanîyan de jî lê rast nehatime, ku li bajarê Amediyê nexweşxane û dibistaneke bizişkîyê hebe. Bi firehî di derbarê çend nexweşxanên din ên Kurdistanê de, ku di qirna navendî de hebûne, behsa wan di serokanîyan de hatine kirin, evên han wek nexweşxanên Niseybînê, Herran, Erbil, Cizîr, Xerzan, Bedlîs, Mêrdîn û ya Farqînê ye(31).

DÊMENA DÏDUYAN:

LÎSTÏKA QAŞWANÊ

Ew babeta ku di beşa xwarê ya tabloyê de hatiye pêş, lîstika qaşwanê (yariyê qaşwan) ye. Siwarek li xwarê surha tabîi ya Amediyê de ye, li ser hespekî kehêlê spî yê serkêş e. Hesp, nerehetîyê jî siwarê xwe re derdixe, herdu lingên xwe jî hev dûr kirine û bi erdê ve şîandine.

Hunermend, wêna hespê gelek ciwan û lêhatî çêkiriye. Siwar, xwe li ser piştê hespê bilind kirîye, bi destekî hevsarê hespê girtiye û bi destê xwe yê din jî daxwazê ji wî mirovê pêşîya xwe dike, ku darê qaşwanê (qaşo) bidetê. Ne dûr e, gogek (top) di destê wî de be. Du heb qaşo di destê wî mirovî de ne. Yek ji wan herçar serên piştîna wî pê de aliqîne, dîyar e, ku du piştîn bi hev ve girêdane, milê xwe yê rastê bilind

kiriye û destê xwe ber bi wî mirovê peya yê diduyan ve dirêj kiriye, ku ji nêrîna wî yê ber bi pêş ve dixuyê, tişteke wek gogê di destê wî de ye. Ew peyadeyê duduyan, destê xwe danîye ser tişteki serpan û tenik, ku eva han bi awayê xweşikî û nazikîya gulê hatîye çêkirin, ne dûr e deburqe be ku di wextê listinê de lêdixin. Mirovekî din li pêşîya wan e û yekî din ber bi wan de têt û lepên xwe ber bi mirovê hemberê xwe, yan jî ji bo gogê - ji ber ku tişteke spî di navbera wan herdukan de tê xuya kirin- dirêj kiriye. Ev grûba han an dixwazin listika qaşwanê bilîzin, yan jî dilîzin. Ev leyza han bi gog û qaşo tê listin. Qaşo, darekî dirêj e, darekî kurt û qayîm bi ser ve tê girêdan, ku bi herdu alîyan de koşên wî ji hev vedikin. Lê, dara dirêj di paşîya dara kurt de derdikeve ji derve. Siwar û peyade, du grûbên vê listikê ne, her çiqas siwar bi peyadan re nebin jî. Di cîyek din de em ê behsa vê listika han bikin, ku di wextê xwe de li Kurdistanê belav bûye. Ji vê listikê re şeqîn jî tê gotin.

TABLOYA PÊNCAN

CİZÎRA BOTAN Û "MEM Û ZÎN"

Tabloya pêncan, di rûpela 42'an de ye û li ser Fermanrewatîya Botan e. Ji sê dêmenan pêkhatîye û heryek ji wan xwedî manayeke taybetî ye.

DÊMENA YEKEM

Li pêşîya tabloyê pêkhatîye, rûbarê Dîclê yê milê Rojhilat wênekêşaye. Beşek ji ser û laşê xortekî ciwan ê simbêl reş tê xuyakirin, armanca wî ew e ji wî rûbarê mezin û fireh derbas bibe û bê nav bajêr. Xort, destê xwe ber bi rûbar de dirêj kirîye, daxwaza wî ji vê ew e, bizane ka ev rûbarê han ê mezin kûr û şetdar e, dikare lê bixe yan na. Li keçeka milê din ê Dîclê dinêre, ji bo ku rîya jêderbazbûnê nîşanê wî bike. Kulavê vî xortî dişibe bi taceke şaxdar, ji ber ku du tiştên wek şaxan bi ser de ye. Dibe ev xortê han xerîb be, ev kulavê serê wî, tenê bi serê xwe cûre kulavek e di nav wênên tabloyên Şerefnamê de.

Keçeka panzdeh-bîst salî li milê din ê Dîclê ye, gumgumek avê di destê wê de ye, tijî av dike. Li wî xortê milê din dinêre, ku daxwaza rênîşandanê jê dike. Ev mirovê han ji mêran zêdetir dişibe bi keçan, eva han jî çi ji cilên wê, ku qumaşekî guldar e û çi jî gumgumê di destê wê de ku tijî av dike û çi jî li gor

goştên dev û çavên wê yên wek jinan, mirov dikare jê derbixe.

Serkulavê keçikê wek yê mêran e, ew piştîniya ku girêdaye, ji hemû piştîniyên din ên vê tabloyê, ya di tabloya hemberê wê û ya piştîniyên di nav tabloya şeşan de jî mezintir e. Wek adeta jinan, serê piştîniya xwe di ber teniştê xwe de ber bi jêr de berdaye; lê, li gor wênan, mêr, raste rast di ber navka xwe re serê piştîniya xwe ber bi jêr de berdidin. Ev jina han ne porê wê diyar e û ne jî guhar yan heleqên guhên wê. Dîwarek ji kevirên birîtî li pişt wê jinê, ser qeraxê Dîclê ye. Ev dîwarê han ê hewşa xaniyekî ye, ku di eynî wextî de "temsîl" a surha Cizîrê dike û eva han pêşîya Burca Belek e, hemû wextan pêlên şetê ava Dîclê lê dixe. Nexşekî wek niv dîlimê baqlawê li ser rûyê derve yê keviran heye. Di vir de, yanî di wênê de çewtîyek hunerî hatîye kirin; xetê ser rûyê dîwar, ser wêna wê keçikê çêkirîye.

Li aliyê din ê keçikê, li rîya tê ser Dîclê, mirovekî serê xwe ber bi wî dîwarî ve qît kirîye. Ev mirovê han xwedî simbêl û rîyeke mezin e û herdu jî reş in. Devekî mezin û pan, cotek birîyên stûr û du çavên bed li ser hene. Wêna giştî ya wî mirovî ber bi ya mirovekî hilekar û fesad diçe.

Ez di van çend mehên dawîyê de gelek li ser vê tabloyê sekinîm, di dawîyê de ez gehîştîm vê noqta han ku bikarim bêjim; ev dêmena han a vê tabloyê, ku di beşê xwarê de ye, îşareta serpêhatîya Mem û Zînê ye. Ji ber ku wêna û serpêhatî gelek li hev tên. Li gor behsa Destana Memê Alan a Roger Lescot, destkarî kirina Dr. Nurettîn Zaza û wergerandina Erebi ya Dr. İzzeddîn Mistefa Resûl, rûpela 97 û 128'an; Memê bi cilûbergên paşan e, ku taç dîyartirîn beşek ji wî ye, li pê Zînê tê bajarê Cizîrê. Wek ku Melikê Kurd jî eva han gotîye û her wiha li rûpela 90-93'an jî binêre. Di rûpela 74'an de jî eva han hatîye nivîsandin: *"Berî Memê bigihîje Cizîrê, rastî pîremêrekî tê, ku ew Xidir Nebî ye. Silavê lê dike û jê re dibêje; 'dema tu bigihîjî ser rûbara Cizîra Botan dê tu bibînî, ku rûbarekî pan û mezin e. Belem jî li wir nîne, ku pê derbaz bibî. Li ber qeraxê Dîclê dûkel bilind dibe. Keça Bekoyê Ewan jî li wir e û dê bixwaze bi navê Zînê te bixapîne. Bawerîyê pê neyne, ji ber ku ew keça Bekoyê Ewan e. Babê wê bi wasita ki-*

têbê remil avêtîye û zanîye, ku tu dê biçî bajarê Cizîrê. Ji ber vê yekê keça xwe anîye û di rîya wê de dixwaze te di ava kûr de bide xeniqandin".

Vêca wek di rûpela 75 û 76'an de jî behs dibe; dema Mem tê ser qeraxê rûbarê Dîclê, dibîne ku gotina pîremêr rast e. Qet tu belemek nîne, ku pê derbaz bibe. Bangê keça Beko dike û jê re dibêje; "Xuşkê, ez xerîb im û nikarim rê derêxim.. buhur li kîjan milî ye?" Keçik hewil dide ku Memê ber bi şaşîyê de bibe û jê re dibêje"; ez Zînê me, ez bi şev hatim ba te û me hingustîlên xwe bi hev guherandin. Ez ê bêm ba te û te bînim vî milî ba xwe." Wextê keçikê zanî nikare bi pîyan lê bixe û derbazî milê din bibe, rîyeka kûr nişan da û jê re got; "tu dikarî bi pîyan li vir bixî û derbaz bibî." Armanca wê ew bû, ku wî di wê avê de bide xeniqandin. Dema Mem digîhîje ser wê buhurê dibîne, ku gelek kûr e. Li ser vê, li keçikê vedigere û jê re dibêje; tu ne Zînê yî, tu keça Beko yî. Vêca vedigere ber qeraxê û rûdine, heta rastî şivanekî tê. Şivan rîyeka tengav nişan dide, Mem jî jê derbaz dibe û diçe milê din.

Li gor behsa Mem û Zînê ya di nav Tuhfe Muzeferîyye ya cilda yekem û rûpela 275'an a Oscar Mann jî; Mem û Bengîn ser qeraxê rûbarê Dîclê rastî keça Beko Melek Rihan tèn. Memê dizane, ku ew Zînê ye... Li gor qisekirina destana wê ya folklorî ya ji alîyê Hacî Pîrotê Ranyeyî, ku temenê wî jî 80 salî zêdetir e û min di tarîxa 18.06.1986'an de, bi destê xwe bi Zaravayê Kurmancî jê wergirt, wiha dibêje: "*Ku Memê cara yekem tê Cizîrê, Bekoyê Ewan ser rîya wî radiweste û ber bi wî de tê*".

Li gor bawerîya min ew xortê cilûbergên paşatîyê wergirtîye û taca şaxdar danîye serê xwe, destê xwe ber bi Dîclê ve dirêj kirîye û li gel wê keça li milê din diaxive, daxwaza rê nişandanê jê dike; Memê Alan e. Ev herdu mîsalên navên wan derbaz bûn ên ji cûda cûda milan hatine stendin jî, li gel vê wêna han digoncin. Ji ber vê, ew keça li milê din ê Dîclê, yan Zînê ye yan jî keça Beko ye, ku ew xizmetkarê Zînê bûye û Zînê jî keça Mîr Evdal e. Ew mirovê mekirbaz û hîlekar jî, ku serê xwe ber bi wî dîwarê rexê Dîclê ve bilind kirîye û li pişt keçikê ye, Bekoyê Ewan ê jê nefretkirî ye. Eva han jî hêjayî

gotinê ye; li gor wênan û qisekirinên folklorî jî, divê Memê ji Rojhilat ve hatibe, ne Rojava ve, ji ber ku Dicle di aliyê Rojhilatê Cizîrê re derbaz dibe.

Ez, ihtimaleke gelek dûr dizanim, ku Şerefxan serpêhatiya Mem û Zînê nezanîbûye yan sehnekirîye. Dema ev bûyera xemgîn li Kurdistanê belav e, 151 sal di navbera çarenivîsa reş a Mem û Zîn û dawîpêhatina nivîsandina Şerefnamê de heye. Ji ber ku Mem û Zîn di sala 854'ê koçî (1450/1451'ê zayînî) de koça dawîyê kirine. Min ev tarîxa han ji ser kêla tirba wan girtîye. Eva han li ser jêzeminê Medresa Mîr Evdal e, ku dikeve ser surha Cizîra Botan. Min di kitêba xwe ya Dîwana Kurmancî, di rûpelên 154-160'an de, behsa vê meselê kirîye û wêna kêla wan a ku ev tarîxa han li ser, weşandîye.

Hewce ye em vê jî bêjin, ku herdu şairên me yê mezînan, Eli Herîrî û Melayê Cizîrî, ku ez van herduyan jî hevçaxê Şerefxan dizanim, îşaretî Mem û Zîn kirine. Ji ber ku serpêhatiya wan wê çaxê gelek bi nav û deng bûye. Melayê Cizîrî wiha dibêje:

*"Mûyekî ez ji te nadim be dused Zîn û Şîrînan
Çi debit ger tu hesêbkî (M.B.) Ferhad û Memê".*

Ji bo vê meselê li Dîwana Melayê Cizîrî ya tehlîla Sadiq Bahaeddîn û di derbarê Melayê Cizîrî jî li Dîwana Kurmancî (Ev kitêb bi navê "Şairên Klasîk ên Kurd" ji aliyê Weşanên Jîna Nû li Stockholmê, bi tîpên Latînî hatiye çapkirin-Elişêr), rûpela 11'an binêre.

Her wiha Feqîyê Teyran jî, ku em dikarin bêjin gehîştîye hinek wextê Şerefxan, navê Zînê di kitêba bi destnivîs ya Bersîsê Abid de anîye, ku ev destnivîsa han gelek rind e. Teyran wiha dibêje:

*Kopek di xew de pê reyî
Nazik ji xeflet hilbeyî
Le'lê di sor kef lê meyî
Rabin bi Zîna xidmetê*

Vêca li gor vê, gelek ihtimaleke nêzik e ku Şerefxan jî wek van şairan îşaretî Mem û Zînê kiribe, lê, ev yeka han ne wek wan bi nivîsandî, ewî jî di tabloyên xwe de ev bûyera han dabe dîyarkirin. Ji ber ku ger ev tabloyên han ji aliyê Şerefxan

bi xwe de jî nehatibin çêkirin, ihtîmaleke gelek mezin e, ku di bin serokatî û çavdêrîya wî de hatibin durustkirin. Her çiqas Şerefyanê mezin behsa Mîr Evdal di behsa Fermanrewatîya Bedlîsê di rûpela 130 ya Şerefname bi destnivîs û di rûpela 501-504'ê Şerefnamê ya çapa Qahîrê de, kirîye û ev Mîrê han jî babê Zînê ye, lê, îşareta Zînê yan Mem û Zînê nekirîye.

Di dawîyê de ez dikarim vêya han jî bêjim, ku ihtîmalek din jî heye ew keç Zînê bi xwe be. Ji ber ku li milê din ê çem destê xwe yê çepê daye ber singa xwe û destê xwe yê rastê dirêj kirîye û tilya xwe ya şhadetê bi alîyê xwe de tewandîye. Wek ji wî mirovî re bêje; "*were ba min*" û ew mirovê mekirbaz û hîleker jî Bekoyê Ewan e. Ihtîmalek din jî heye, ku dêmena diduyan a tabloyê, her ji beşek yan jî temamkerê dêmena yekem be û peywendîya wê bi serpêhatîya Mem û Zînê ve hebe. Ew hersê mirovên çekdar, Tacdîn û herdu birayên wî yên din Çeko û Arif bin. Lê, ev xala han zêdetir pêwîstî lêkolînê ye.

Ew wêna li ser vê behsê, yanî beşa Mem û Zîn, ji alîyê berêz Mamoste Kamil Ehmed de hatîye lêkolîn.

DÊMENA DUDUYAN

Dêmena tabloyê ya diduyan, li ser xanîyekî ser qeraxê Dîclê ye ku pencereke gelek mezin di qismê wî yê pêşî de ye. Ev pencerê han, li gor beşên din ên xanî, bi awakî remz hatîye durustkirin, yan jî remzê dêmeneka bajarekî ye. Mirovekî xebatker ê pêxwas gurzek dar li piştê ye, herdu delingên derpê xwe heta çokan daye jorê, herdu ranên xwe ji hev fireh kirine û mil rût e. Yan jî em dikarin wiha bêjin; ew kirasê dirêj ê reş lê ye, nîv mil e. Dixuyê ku darekî dirêj jî bi destê xwe girtiye. Ew ber bi bajarê Cizîrê ve tê û gihîştîye nav hewşa xanîyekî yê li milê çepê yê pencerê. Di milê din de, sê mirovên çekdar hene, armanca wan ew e ji bajêr derkevin. Yek ji wan kopalek di dest de ye û mertalek li milan e, kapek sitûr (wek werîs) li ser milê xwe girêdaye. Ez nizanîm, çi mama û armançek ji vê kapê heye?.. Dûr nîne, ew pêwîstîyeke nêçîrê be. Yekî din mertal û tîr pê re heye û yê sisîyan jî xwedî tîr e, şalwarekî fireh û guldar lê ye. Hewcedarîya gotinê heye, ku şalwarên xelkê Cizîrê gelek fireh û pan in. Lê, yên xelkê bajarê Sêrtê, bi ser ve hinek

ji yê xelkê Cizîrê fiştir e û bi alîyê jêr ve jî teng û zirav e. Mirovekî din ê bêçek li jêr wan e, li nezîkî kapanga (derence, merdiwan) xanî sekiniye û li gel yekî din diaxive. Tajîyek spî li pêşîya wî ye û serê xwe bilind kirîye. Dixuyê wek teyrekî li jorê pencerê binêre, dût nîne, ku hêlîna xwe jî li wir çêkiribe. Ev grûba han, wek dixuyê dê biçin nêçîrê.

Dêmena Sisîyan

Dêmena tabloyê ya sisîyan, ji navçek çîya pêk tê, ku behsa derveyê bajarê Cizîrê dike û pêwendîyeke wê bi bajar ve nîne. Di beşê xwarê vê dêmenê de, bazewanekî birî, ji çermek reş lepik çêkirîye û di destê wî de ye û teyrek nêçîrê jî xwe li ser destê wî danîye. Mirovek din ê birî, hinek ji wî wê de rûniştîye, destekî xwe bilind kirîye, bangî yekî ji wan herdu tajîyên reş ên pêşîya wan dike. Tajîyê serê xwe ber bi wî mirovî de qît bilind kirîye. Tajîya din jî zincîrek di sitoyê wê de ye. Bêguman ev herdu mirovên han ên bi tajî û teyrên xwe ve, nêçîrvan in û li ser destê rastê yê tabloyê ne. Mirovekî din li ser destê çepê yê tabloyê ye û qaşo di dest de ye. Du mirovên din jî li beşa serê tabloyê ne û ew serê çîyayekî di nav daristanekê de ne. Yek ji wan xortek bêrî û bêsimbêl e, yê din yekî salên wî li pêş in û rîyek wî ya reş heye. Mirovekî din jî hinek ji wan wê de ye, di pêşîya wî de du rê tîn dîtin. Wênekêş, asîman û pele ewrek jî di wê tabloyê de çêkirîye.

TABLOYA ŞEŞAN

MECLİSA MÎRÊ BOTAN

Tabloya şeşan di rûpela 43'an de ye û behsa **Fermanrewatî-ya Botan** dike. Di vê tabloyê de mirovekî rispî li ser çiyekî bilind -li ser textekî- ê nexşdar û guldar, li ser çokên xwe rûniştîye, Mehfûreka biçûk a cûrên gîyan li ser hatî nexişkirin, di eywana wê de hatiye raxistin. Mirovekî cilûbergên mîran ê sipehî û xetên guldar li ber mêzereka gulingdar a ji qumaşekî rind hatiye durustkirin û bi awakî xweşik pêçayî daniye serê xwe, ku wisa dixuyê qismê bilind ê mêzerê kilaw-qoç be. Guman tê tune, ku armanca hunermend ji vê, Mîrê Botan e, ne dût e kurê Xan Evdalê kurê Mîr Nasir be ku di wextê temambûna nivîsandina Şerefnamê de, mîr bûye(32).

Wêneyek tê de heye, mimkun e, ku carîye be. Fincanek daniye ser sînîyekê û ji mîr re dibe. Mêzera serê wê keçikê wek a mêran e. Du mirov rûniştine û yek ji wan, serê wî û nivê laşê wî tenê ji ber derîyê pêş ê eywanê ve tê xuyakirin. Mêzerek biçûk li der-dorê kulavê xwe pêçaye û destê xwe ber bi mîr de dirêj kirîye. Ev kesê han wek yekî feqîr be. Yekî milê keçikê girtîye wek daxwaza tiştêkî jê dike û yan dua jê re dike. Yekî din ji li pişt wî ye û hinek ji bedena wî dîyar e, lepik ji di des-

tê wî de heye, yanî; ev destê han ji bo xwe ser danîn û firandina teyrê nêçîrê amade kirîye. Teyr ji ber bi firînê de ye. Wisa dixuyê mirovê bazevan, ku tiştêkî nîşanê teyr dike û dixwaze ew xwe li ser cîyê xwarinê -ku ev cî tiştêkî wek camê ye û bi diwar de hatiye daliqandin- deyne. Wisa diyar e, ku ev mirovê han bazewanê mîr e.

Li xwarê textê mîr mirovek heye, kewa yan êlekekî spî lê ye. Du taji; yek li paş û yek li pêşîya wî ye. Tajiye pêşî berê wî ber bi mirovekî de ye, ku destê xwe bi aliyê rûyê tajiya spî de dirêj kirîye.

Pasewanek li xwarê eywana koşkê sekiniye, tiştêkî dirêj di dest de ye, ku serê wî tiştê dirêj di wênê de nayê xuyakirin. Dûr nîne, ku rim be. Du musîqajen li pêş wî pasewanî ne, her yek ji wan borezaneka dirêj girtine destê xwe û dikin ku lêxin. Mêzera yekî ji wan wek ya mîr e. Aliyekî wê bi meyîl qît bûye. Du gulinge jî ji herdu aliyên çepê û rastê yên mêzerê hatine xwarê. Ev gulîngên han, ne serê mêzerê ne, ji ber ku mim-kun e, ku cûrek cawê taybetî be û bi mêzerê ve hatibe qaîmkirin. Min di destpêkê de dizanî, ku evên han serê mêzerê ne. Du perrên teyran bi ber mêzera wan musîqajenan de ye. Serên du hespan di rex wan musîqajenan de tîn xuyakirin.

Not:

Gotina text, min ji bo wî cîyê taybetî yê ku ji bo rûniştina Mîrê Botan hati amade kirin, bi kar anî. Ew cîh bilind e û wek textek yan wek sekoyekê (dikekê) ye, ji melzemên ku koşk pê avadibe tê çêkirin û vêca çî ji kerpîç û geçê, yan jî ji kevir û geçê be. Ev cîyê han bi awakî xweşik hatiye çêkirin û du taq pê ve ne û bi nexşekî dilgîr hatiye neqîşandin. Ez wisa dizanim, di bikaranîna gotina text de, ez ber bi çewtiyê ve naçim. Ji ber ku pêwîst nake, ku textê mîr ji texte û dar be. Kurd, cîyê textê mîr, ji bo cîyê bilind yan jî ji bo ew cîyê mîr li ser rûdinê bi kar tînin. Vêca ji çî melzemê dibe bila bibe, wek kevir û geç yan jî raste rast di kevirên şax de hatibe kolan.

TABLOYA HEFTAN

KELA HESENKÊFÊ

Ev tabloya han di rûpela 56'an (li gor tabloya rengîn r. 55. n. J. N.) de hatiye çêkirin, lê, bi şaşî hejmara 52'an ser hatiye nivîsandin. Di derbarê **Fermanrewatiya Hesenkêfê** de ye. Kela wê ya sext û asê di tabloyê de tê xuyakirin û ketiye hindavê rûbarê Dîclê. Tablo, bi tevayî ji dêmenê vê kela asê pêk tê, ku niha li nahîya Hesenkêfê (Eskîf-Hesenkêyf) ye, tev bi sikeft e, ev nahîya Kercewsê(Gercusê) ye û girêdayî bajarê Mêrdînê ye. Ev bajarê han di sedsala 12 û 13'an de pêşkeft. Ji ber ku di wan deman de bûye paytextê Dewleta Artuqîyan û pişt re ji bûye melbendeke Dewleta Eyubîyan. Desthilata Eyubîyan, nêzîkî çarsed salan tê de hukum kiriye(33).

Wêna pasewanekî yê rim di dest de, li ber kelê ye. Du kesên din li ser kelê sekinîne; yek ji wan cilûbergên spî lê ye û li gel yekî din diaxive. Mimkun e, ew mîrê Hesenkêfê be û ya din jî jinek be. Ji derveyê van, mirovekî din jî li ser kevirekî rexê kelê sekinîye û jinek di navbera wan de heye, guhar di guhê wê de ne. Cilûbergekî dirêj û mil kurt li wî mirovî ye û xetên wî dirêj in. Li gor qeneeta min, ew jî qumaşekî şeyax e. Em ê di tabloya hejmara 15'an de, behsa vî mirovî bikin, ew siwarek e û dike ji ava Dîclê derbaz bibe. Ji ber ku pir hilweşiya ye, li wî milî rûbar pan e, wisa dixuyê havînan di demên kêmbûna avê de, siwar bê belem dikarin jê derbaz bibin. Wêneyek niv kevan li ser Dîclê çêkirî ye, ku qaz di xwarê wî de sêbahî (melevanî, ajne, soberî) dikin. Eva han pira dîrokî ya Hesenkêfê ye, ku min ew di Tîrmeha sala 1977'an de dît. Hinek ji vê pirê niha jî maye. Kevanên wê nêzîkî çil mêtroyan bilind in. Bi awakî bilind ê avayîsazkirinê hatiye çêkirin. Ibn Şedad el-Helbî di vî warî de wiha dibêje: *"Beşek ji nîverastê vê pirê ji dar hatiye çêkirin, ji ber ku wextê êrişa dijmin, daran ji ser rakin ku êdî dijmin nekaribe jê derbaz bibe û bigihîje kelê. Ji ber ku bajar li ser qeraxê Rojavayê Dîclê ye"*(34)

TABLOYA HEŞTAN BAJARÊ HESENKÊFÊ

Ev tabloya han jî wek ya heftan di derbarê Ferman-rewatî-ya Hesenkêfê de ye. Di tabloyê de wêna mizgeft û minara Hesenkêfê hatiye çêkirin. Mirovek li hewş, yan eywana mizgeftê li ser mehfûrekê rûniştîye. Cilûbergên wî li yê mîran diçe û destê xwe danîye ser singa xwe. Ew herdu keçên di tabloyê de tên xuyakirin; carîye ne, xwarinê jî wî mirovî re dibin, yek jî wan firaxek, an tepsîyek mezin li ser destan e, qeraxên vê sînîyê vekirî ne, ne girtî ne, herdu serên rexê sînîyê jî nîverasta wê bilintir in û nexşek jî li ser hatiye çêkirin, mirovek bi destekî rexek sînîyê û bi destê din jî rexê din û kevçikî bi hev re girtîye. Yekî din jî sînîyek li ser destan e û mirovek laşê wî niv xuyakirî jî li pişt wî ye.

Ez di wê bawerîyê de me, ku ew mirovê mezin ku xwarin jê re tê birin, Sultan Huseynê kurê Mîr Mihemmedê kurê Mîr Xelîl e. Di wextê temambûna Şerefnamê de, ew mezinê binemala Mîrên Eyubîyan a Hesenkêfê bûye. Kesê navê wî derbaz dibe, di navekê re mîrektî kirîye; lê, jî ber ku hez ji kar û barên dinyayê nedikir, dest jê kêşa. Şerefhan di rûpela 60'an a Şerefnamê de wiha dibêje: "*Niha ku Sultan Huseyn li Kurdistanê dijî, beşek ji mîrasa weqfa babûbapîrên xwe werdigire*". Yanî bê kar e û rewşa jîyana wî bêser û ber e. Di vê tabloyê de wêna du mirovan li ber mizgeftê û ser qeraxê Dîclê rawestayî, dîyar e, wek dixuyê milên xwe ber bi milên hev re kirine. Ji bilî van wênan, wênên du mirovên din jî li ser çîyayê hemberê mizgeftê tên dîtîn. Divê bê gotin, ku awayê wê minara di tabloyê de, li awayê minara îro ya Hesenkêfê naçe.

TABLOYA NEHAN
KELA EGILÊ (GÊL)
(LÎ DÎYARBEKIRÊ)

Tabloya nehan a di rûpela 65'an de, behsa Mîrên Egilê dike. Ev tabloya han ji dêmeneke Kela Egilê ya asê pêkhatîye. Ev kela han ser kevîrên bilind hatîye ava kirin, dikeve bakûrê bajarê Dîyarbekrê û 57 kîlometre ji bajarê Dîyarbekirê dûr e û li hemberê rûbarê Dîclê ye. Keleka kevnare ya Kurdistanê ye, nivîsandinên bizmarî û helkolanên dewra Asurîyan li ser tèn dîtin. Çend gorên (tîrbên) mezin ên kevin û giring tê de ne û tîrba Harûn, Îlyas û Zulkufûl pêxember jî li wir in(35). Evên han tev nîşanên rojên borî yên bi qîmet ên şaristanîyeta kevin a bajarê Egilê ne.

Di tabloyê de, Kela Egilê li ser kaşeberekî li hemberê rûbarê Dîclê hatîye çêkirin û ev terz avasazî tê de tèn dîtin; kulek(bace)ên serbanan; lê bi awakî sêgoşe û ciwan hatine duristkirin; awayê çîyan pê dikeve û wek konên(reşmalên) koçeran li ser sê sitûnan e, girêdana kevanê balgên sitûnên wan wek rengêkî spî tê xuyakirin. Hunermend, sifetek nexşkarane bi karê xwe beşandîye. Pencerên kelê jî bi awakî dirêj di kevîran de daye kolan, balgên sitûnan û rêzên xwarê yên xaniyan bi awakî niv kivan durust kirîye.

Çend kes li ser kelê û der-dorê wê dîyar in. Ew çar kesên ku li ser kelê sekinîne, ji wan du kes ên di dawîya nîverastê de ne, jin û mêrek in. Jinik li ser destê çepê sekinîye, ew ji pêçan û pora xwe ve tê naskirin, ku jin e. Serkulavê wê wek yê mêran mezin e, tenê ferqek di navbera pêçana wê û yê mêran de heye;

ew jî ew e, ku serkulavê xwe yê milê aliyê nav çavê xwe şidandîtir pêçaye û ji çavên wê mirov dikare derîne ku jin e. Li gor wêna hejmara 188/2 ya di nav kitêba bi navê "Diyarbakir Tarîhî"(Dîroka Diyarbekirê) ya Basrî Konyar de, ev cure serkulavên han heta sedsala me ya bîstan jî li Egilê hebûne. Bi vî awayî serkulav, li navçên Soran ên wek Xoşnawetî jî hene. Vê jina han, destê xwe hinek bilind kirîye û bi mirovê hemberê xwe re -ku evê han kesê diduyan ê ser destê rastê ye- diaxive. Dûr nîne ev mirovê han Cehfer Begê kurê Qasim Begî be, ku di wextê temambûna Şerefnamê de Mîrê Egilê bûye û ihtimal e ew jin jî jina wî be. Temenê Mîr Cehfer wî wextî li dora 40 salan bûye. Ser destê çepê yê kelê, xortekî cil spî û keçeka kezîdar sekinîne. Dixuyê ku dilxwaz û dilevînên hev û du bin. Wênekêş, perrekî teyran ê mezin kirîye ber serkulavê xort, ku destekî xwe bilind kirîye û li gel keçikê diaxive. Xort û keçik ne li ba hev in, mesafek di navbera wan de heye. Cîyekî bilind jî di navbera wan herduyan de hatîye çêkirin. Wisa dixuyê ewan xwe dane ber cîyekî bilind, da ku kesek wan nebîne. Ew cîyê bilind ê di navbera van herdu kesan de, wek wan ji der-dorên wan biparêze û ji wan re bibe parêzgerêk, hatîye durustkirin... Wisa tê xuyakirin, ev dêmena han serpehatîya du dilevînên Egilê teswîr dike.

Kur û keçek di nav nîverasta çîyayekî bi kevir ê xwarê kelê de ne û bi hev re diaxivin. Wêna nêçîrvanekî jî li nêzîkî dawîya tabloyê ye, tivingek dirêj di destê wî de ye û ber bi teyrekî serê darekê ve dirêj kirîye û teyr jî wek bilbilan e. Nêçîrvan, kêsekî biçûk ê wek cuzdan li gel tiştêkî wek demlika çayê li pišta xwe girêdaye. Kisik cîyê gulên tivingê ye û tiştê gilover jî cîyê barûda wî ye. Kurdan di wextê xwe de barûdên tivingên kevin (tivingên Kurmancî) dikirin nav kîsên gilover yên biçûk. Ji bo li ber baranê ter nebe û kêç hilnegire, bêparastin. Hinek caran jî di nav perçên çatên (pote, çaput) kevin de bi şidayî dipêçan û bi milekî kêleka xwe ve girê didan. Tivinghilgiran, ev kîsê han bi piştîniya xwe ve qayîm dikirin, lê, ji aliyê kêleka wan de dialiqî. Wênên kîsê barûdan, tiving û hewcedariyê din ên nêçîrê yên wî wextî li ser kêlekî goristana Cizîra Botan hatîye kolan, ku ihtîmal e eva

han gora Mehmed Begê Mirê Botan be. Min wêna vê kêla han di kitêba xwe ya "Bangewazek Bo Roşenbîranê Kurd..", di rûpela 108'an de belav kirîye. Her wiha wênên van kîsên barûdan ên ji hirî hatine çêkirin, li gel wênên dabance, şûr, xencer û çend aletên din ên şer, li ser gelek kêlên goristana mezîna Hewlêrê jî hatine kolan. Min gelek ji van wênên kêlan ên keleporên me girtine. Li hinek navçên wek Silêmanîyê, gulên tivingan jî kirine nav kîsan. Bi vî awayî xwedî tivingan, du kîsên biçûk bi xwe re digêrandin, yekî li vî milê û ya din jî li milê din yê kêleka xwe gîredidan.

Di milê xwarê yê tabloyê de tî xuyakirin, ku mirovekî kulavçoçek danîye serê xwe û mêzerek li ser girêdaye. Vî mirovê han bi destê xwe yê rastê defek(36) girtîye û bi destê çepê jî lê dixê. Deflêderê tabloya sisîyan jî her bi vî awayî li defê dixê, ji ber vê yekê, em dikarin bêjin, ku deflêxistina wan bi destê çepê, nayê wê manê ku ew çep in. Bi vî awayî def girtin û bi destê çepê lêxistin li Kurdistanê adet bûye. Her wiha em dibînin, ku di wêna tabloyeka "Dibistana Tebrîzê" de, deflêder bi destê çepê li defê dixê. Misrîyan jî di sed sala diduyan a berî zayîni -di dema Talîmus de- bi destê çepê li defê dixistin. Eva han di wan wênên li ser kevîran hatî koland de tî xuyakirin(37). Yek ji wan pênc musîqajenên li ser seeta hunermend İbnî Rezazê Cizîrî, bi destê rastê li defê dixê(38). Wek me di pêşî de behs kir, Cizîrî li bajarê Dîyarbekrê kitêba xwe nivîsandîye û wênên wê bi dest çêkirîye, wek çawa wênên di nav Şerefnamê de ku li Kurdistanê hatine çêkirin.

Musîqajenekî din li hemberî deflêder e, ku li aletekî musîqayê ya ji dar hatî çêkirin, dixê. Ferqa wê ji wê tanbûra di tabloya hejmara duduyan de ye, heye, wek wê dirêj nîne û du bazîndên sandoqa wê hene û di navbera wan de kemerek teng heye û tîlên wê nayên xuyakirin. Dûr nîne ku eva han wek wan cûre tenbûran be, ku Dr. Hîseyî Elî Mehîfuz, "tenbur Şêrwanîyyîn" bi nav dîke û wiha dibêje: "*Sandoqa wê ji dara hirmê ye û li Tebrîzê ev cûre tenbûrên han gelek tî bikaranîn*"(39). Di tabloya hejmara 16'an de jî ev aletê han ê musîqayê heye.

TABLOYA DEHAN

CAR DÎN EGÎL

Ev tabloya han jî her li ser mîrên bajêr û Kela Egilê ye. Beşek ji bajarê Egilê yê li hemberê Dîclê di tabloyê de tê xuyakirin. Mizgefta Egilê bi gumbeta xwe ya biçûk ve tê dîtin. Melayek, ku bi şaşik û mêzera wî ve tê naskirin, li ser destê çepê yê mizgeftê rûniştîye. Mirovekî dînî jî her wisa li milê rastê, li ber deriyê xaniyekî teniştta mizgeftê ye, ku li gor serpêçana wî ya sade tê zanîn, yan muezin yan jî micewrê mizgeftê be. Yekî din li hemberê wî û li milê din ê derî, destê xwe ber bi wî de bilind kirîye û pê re diaxive. Wisa jê tê zanîn, ku tiştêk di nav destê wî de heye û dixwaze nîşanê wî bike yan jî bidê. Ji porê wê mirov dertêxe ku jin e, her çi qas awayê girêdana serê wê li yê mêran biçê jî. Ne dût e ev xaniyê han beşek ji mizgeftê be.

Li ber mizgeftê, xaniyekî nexşdar heye, ez di wê baweriyê de me, ku eva han dibistan(medrese) e. Du mirovên dînî bi hev re dilîzin, ku ew tiştê listikê li ser dilîzin ji 72 xanan pêkhatîye. Ev listika han ji bera xwe ve heşt û dirêjahîyê jî neh xane ye. Satranca adetî nîne, ji ber ku satranc berî Îslamîyetê ji Hindistanê hatîye Îranê û Kurdistanê û li gelek welatên din ên cîhanê jî belav bûye û ji 64 xanan pêktê. Lê, ji aliyê çend

netewan de guherandin tê de hatiye çêkirin. İbnî Ebî Heclê, di kitêba xwe ya bi navê Enmuzec el-Qital Fî Neql'îl-'Ewal, di rûpelên 147-148'an de, ku li ser satrancê nivîsandîye, wiha dibêje: "Bi çend awan satranc hene, wekî el-şatranc, el-tame, satranca xelkê Seîd ê Misrê, satranca dirêj û satranca Romê, yanî Bizansîyan"(40). Lê belê, ev cûrên satrancê ronî nekirine. Mîmkun e, ev listîka han a Egilê curek ji van satrancan be, lê nayê zanîn ka ji kîjanê ye. Yan jî gelo di wî wextî de her li Kurdistanê hebûye, yan li ba hinek netewên din jî hatiye bikaranîn, em nizanin.

Yek ji wan du kesên di tabloyê de dilîzin, mêzer û cil-bergên wî reş in û dûr nîne ew qazîyê Egilê be, yan jî melayekî Kurdên Zaza yên Şîî be. (Di nav Kurdên Zaza de ne Şîî lê **Elev** î hene, ku li gor hinekan ew jî baskek ji Şîîyan e. Lêbelê **Zazayên** Egilê bi xwe Sunî ne -Elişêr) Yê din ku mêzerek spî li ser kulavê serî ye, mîmkun e melayekî Kurdên sunî be. Wî çaxî mirovên dîni jî satranc dilîstin, ji ber ku di mezhebê Afê de, ger li ser tiştekî neyê listin, qumar nayê hesibandin û helal e. Lê, listîka tawlê, her li ser tiştekî jî nebe, di hemû mezhebên fiqhê de heram e. Lê, ez nizanîm di mezhebê Ce'ferîyê de nêrîn li ser vê xususa han çî ye.

Li milê rastê û nezîkî wan herdu kesên ku dilîzin, xortek rûniştîye. Yekî din ê bi temen, qabek li ser destan e; wisa dixuyê, ku xwarin tê de heye û ji bo wan dibe. Li ber mizgeft û dibistanê mirovekî dîni û bi temen, bi xortekî ciwan re hêrs dibe, ku dûr nîne mamostek û feqîyê xwe be. Xortekî ciwan ê din jî li milê rastê yê serê tabloyê heye. Li gor qeneeta min ev xortên han ên ciwan feqîyên dibistana Egilê ne. Li milê din ê bajêr jî, li ser qeraxê rûbarê Dîclê du kes hene, yek ji wan tiştekî dirêj di destê wî de ye.

TABLOYA YANZDEHAN BAJARÊ HÎZANÊ

Tabloya yanzdehan a di rûpela 76'an de, behsa **Fermanrewatîya Hîzanê** dike. Ev tablo û ya donzdehan jî ji dêmenên bajarê biçûk ê Hîzanê pêkhatine, ku niha gundekî bîst mal e û girêdayê qeza Qeresuh (Hîzan) a bajarê Bedlîsê ye. Di navçeke çiyayî ya bakurê rojhilata Gola Wanê de ye, deştek li ber e. Her çar dorên wê bi çîyan hatine fetilandin û çiyekî gelek xweş e. Ev du tabloyên han manekî aborî ji me re pêşkêş dikin. Bi vî awayî, ku di tabloya yanzdehan de dikan û bazara bajêr diyar in û di ya donzdehan de jî, dêmena zevî-zar, coyên avê û kêlana baxekî ji aliyê baxvanekî de wêna wê hatiye kêşandin. Hîzan, wek Şerefexan jî nivîsandîye, çiyekî gelek bi bax û bostan e. Fêkîyên cûr bi cûr tê de ne, ku hinek ji wan li navçên Kurdistanê yên din nînin. Wek bindeq (findeq, findiq) û kişmiş. Her wiha li gor gotina dîroknivîsên din, fêkîyên wek gêlas (gilyas) û şahbelut jî çiyê gotinê ye.

Jêra vê tabloyê de, dikan û bazara Hîzanê diyar in, ev dikana han li pişt girekî, bi kerpîcên sor hatine avakirin, pêşîya wan bi awakî kevanî û tekûz hatine danîn, hinek din ên derdorên wan ên milên ji der ve, bi giştî hatine nexiş-kirin. Dikandar fêkî difroşin. Li dikana ser destê rastê, ku taqekî wê kevan heye, komek zebeşên dirêj ên bê xet diyar in û yek ji wan hatiye jêkirin, ji bo ku dîqeta kiryanan bikişîne. Xortek hatiye zebeşekî ji dikandar dikire. Ez wisa dizanim, ku yek kirîye. Fêkîyên dikanê li ser çend refan hatine raxistin û sepe-tek (çapîk, selik) jî her wiha li ser refa jorê heye. Li dikana

navîn zebeşên mezin ên belek û şêhînek(terazî) jî tèn dîtin. Wî çaxî pirañiya zebeşên Kurdistanana Tirkîyê bi vî awayî mezin bûne. Berî ez van zebeşên han di van tabloyan de bibînim, min wisa dizanî ku ev cure zebeşên han dirêj ên sade di van nêzikîyan de hatine Kurdistanê. Lê, ev wêna han belga dîrokî ya çarsed sal berê niha ye, ku ev cûre zebeşên han li Kurdistana hebûne û vêcar, ger di hemû cîyan de jî nebin, lê, li Hîzan hebûne. Zebeşên bi vî rengî heta van salên borî jî li navçên derdorên Hîzanê yên çiya jî tûnebûne. Ji navça Miksê bigire heta Hekariyan û Botan, her ên mezinên dirêj hebûne. Nêzikî sî sal berî niha ev cûre zebeşên han anîne Silêmanîyê. Yekem car jê re gotine "şuyîti qelaçolan", ji ber ku li wir hatine çandin û berê jî wan hatine girtin. Yanî pêşiya wê her zebeşên mezin ên curek din hebûne. Wisa tê xuyakirin ku di wî wextî de ev herdu curên han ên zebeşan an sebzên bi bejna xwe ve dirêj, li Kurdistanê kê m û bi qîmet be, yan her li Hîzanê tenê hebe, yan jî li wir zêdetir be. Ji ber vê yekê jî alîyê hunermendê Kurdistanê ve wêna wan hatibe kêşandin.

Ew dikana zebeşên xetdar ên mezin tê de, bi pêlpêlikan (derence, merdiwan) ve derdikevin wir û ew pêlpêlik jî diçin serbanê wê dikanê. Mirovek di pencera wê de ye, ew dikandarek xort e. Dikandar, liser çokên xwe rûniştîye, mirovekî birî jî, mimkun e, ku tiştêkî jê kirîbe û di milê din re vedigere. Şêhîna dikandar bi arîkên dikanê ve aliqandîye. Niha jî ev cûre şêhînen han di dikanên qesaban, pembo û hirîfiroşên bajarên me de hene. Dikandarê dikana sisîyan komek fêkî di destê wî de ne û nîşanî bikiran dide, wisa dixuyê ew fêkî bindeq, yan hejîr bin. Destê xwe yê din jî dirêjî tiştêkî din kirîye û bikir jî destê xwe ber bi eynî tiştî ve anîye, ku ew dişibe bi şûşa guldanê.

Xortek li serbanê dikanê, ser destê rastê sekinîye. Yekî din jî li ser destê çepê yê dikanê ye, wêna wê hinek têkçûye û ji şêla wê derdikeve ku jin e.

PROBLEMEKE AVASAZIYÊ (MÎMARÎ)

Problemeke avasazîyê, di van herdu tabloyan de ku li ser

Hîzanê ne, derdikevin. Şerefxan, di vê behsa han de wiha nivîsandîye: "Xanîyên ku di nav Kela Hîzanê (Xîzan) de ne li ser terza avasazîya rasatxanan in, yanî li gor rasatxanên sitêrnasî bîngeha wan hatîye danîn û avakirin"(41). Di vî warî de wiha didomîne : "Kela Hîzanê, naşibe bi kelên din ên bajarên Kurdan, li yên Ecemîstanê diçin, ku bîngeha wan li ser kerpîç û kilsê hatiye danîn. Ji derveyê van, Hîzan, bajarêkî Îslamê ye û fêkîyên welatê Eceman tê de hene"(42). Her bi berdewam gotina xwe bi vî awayî didomîne: "Di nav xelkê Hîzanê de eva han belav e, ku xwedîyê bajarê Merax û Tebrîzê ev bajarê han ava kirîye". Lê, min zanyarîyek wiha di tu serokanîyan de nedîtîye. Tevî ku eva han jî tê zanîn, ku Hulago bajarê Merax avakirîye û kirîye paytextê desthilatdariya xwe, zanayê mezin ê sitêrnasîyê Nesreddîn Tusî jî muşawirê wî bûye. Ji ber vê yekê ihtîmal e, ku Nesreddîn bi wezîrekî Îslamê ye mezin re bîngeha bajarê Hîzanê avakiribe û her bi xwe jî fêkîyên Ecemîstanê tê de çandibin. Ji ber vê, hewce ye em Nesreddîn wek danerê bîngeha vî bajarî bidin nasandin. Her çend eva han dût jî nîne.

Di rastîya xwe de, bîngehdanîna xanîyên di nav Kela Hîzanê de, yanî a bajarê Hîzanê, ser terzê avasazîya rasatxanên sitêrnasîyê ye, eva han jî meseleke girîng a avasazîyê ye, lê, gelek mixabin Şerefxan bi xwe jî eva han ronî nekirîye, heta ku em bizanin ev cûre avasazîyên han çawan bûne. Ji derveyî vê problema han, em nizanin terzê avasazîya rasatxanên sitêrnasîya dewra Îslamîyetê çawan bûne; wek rasatxana Meraxê, ku mezintirîn rasatxana dema Îslamîyetê bûye, rasatxana Ulux Beg a li Semerqendê, ku duyemîn rasatxana mezin a eynî wextê ye, rasatxana Qahîrê ya dema Dewleta Fatîmîyan, yan rasatxana Dîmeşq (Şam) a dema Me'mûn, rasatxana Beyrunî û her wiha rasatxana zanayê mezin ê Kurd Ebu Henîfe (Ehmedê kurê Dawudê kurê Wenendê Dînewerî) ya Îsfehan û Dînewerê ye. Min jî bo ronîkirina vê meselê çend serokanîyên sitêrnasîyê vekolan, lê, ez di vî warî de rastî tu zanyarîyekê nehatim, ji bilî ku Nesreddîn Tusî di sed sala 16'an de, rasatxana Meraxê damezirandîye. Di rasatxana wî de qubhên wek gumbetan hebûne, ji bo ku bi wasita van, firêjen

rojê bèn nav rasatxanê û di rîya van tîrêjan re hinek hesabên sitêrnasîyê bèn ronikirin. Yanî bînayên rasatxana Meraxê ya li Azerbeycana Îranê, bi gumbet bûne. Îhtîmalek gelek nêzîk e, ku Şerefexan bînayên vê rasatxana mezin a dema Musilmanîyê dibe, ku niha jî şûnwarên wan mane, yan jî wêne û wesfên hinek rasatxanên din, di hinek kitêbên destnivîs de bi destan ketibe û xwendibe.

Ji bo bidestxistina zanyarîyên li ser terzên avasazîya rasatxanên sitêrnasîya dewra Îslamîyetê, min ji hinek kutubxane û muessesên zanistîyê re name şandin. Wek; Merkez Buhusu'l-Feza we el-Felek li Bexdad, Daru'l-Kutub Wel Wesaiqu'l-Qewmîyye li Qahîre, Muzexana Birîtanîya ya li Londra, Îttihad el-Felekî'l-'Alem, Kutubxana Bodleîan a li Oxford, Kutubxana Murgan a li New York û Muzexana Lower a li Parêş. Her wiha jî bo lêkolînê, min çend nusxên tabloya hejmara 11'an a Şerefnamê jî ji hinek kesan re şand. Lê çî heye, tenê bersîva Muzexana Birîtanîya û ya Kutubxana Murgan gihîştin destê min. Dibêjin, ku zanyarîyek wiha di destê me de nîne. Her wiha bersîva Daru'l-Kutub a Qahîrê jî min wergirt, ez 'dikarim bêjim, ku ev kutubxana han, ji hemû kutubxanên din ên Rojhilata Navîn mezintir e û zêdetir hîsa berpirsîyarîya ilmî digre ser milê xwe, kêman kesan bêbersîv dihêle û ev karên han ên xebatkerên wir, hêjayî spas û rêz lêgirtinê ye. Li gor bersîva Kutubxana Daru'l-Kutub, rasatxana Semerqendê, ku di sala 1405'ê zayîni de ji alîyê Ulux Beg (kurê Şehruxê kurê Tîmurleng e û di navbera salên 1447-1449'an de hukum kirîye) de ser çîyayekî hişkeber hatiye avakirin. Avayîya rasatxanê gilover û damezirandînek şeş goşe ye û sê qat û di niverasta wê de xendeqek kûr a ku bi pêlpêlekan diçûne nav heye. Bi awakî ser berjêr û hev himbêz kirî (di nav zîkê hev de) ye. Daru'l-Kutub, wêna rûpelekê ji kitêba Îngilizî ya van zanyarîyan wergirtîye, şandîye û her wiha wêneka xetkarî ya rasatxanê jî tê de hatiye.

Di vê tabloya yanzdehan a Şerefnamê de, wêna xanîyekî hatiye çêkirin. Îhtîmal e ev nimuna xanîyên Hîzanê be, ku Şerefexan gotîye eva han li ser usluba mîmarîya rasatxanan e. Li gor vê wêna han, xanî li ser girekî ax hatiye avakirin. Paras-

tineke bazindî li der-dorê wî ye û bi kerpîncên sor hatiye avakirin. Her wiha çargoşe ye û bi awayê burcê hatiye çêkirin. Odeke biçûk a wek deriyê pêlpêlkên ser serbanê(hewreban) di qata ser de ye û pencereke sêgoşê, tûj jî tê de ye, ku dûr nîne ev cur pencerên han ji bo temaşekirina sitêrkan hatibin bikaranîn.

Bêguman awayê mîmarîya vî xaniyê han ji ya mîmarîya rasaxana Semerqendê dûr e. Lê, mimkun e, ku hinek rasaxanên din hebin û terzê mîmarîya vî xaniyê han nêzikî wan be, ku bîna bi awakî burcê hatiye avakirin, odek di qata diduyan de ye, pencerek sêgoşe ya tûj tê de ye û awayê xanî; nêzikî yên wan xaniyên ji bo temaşe kirin û malûmat berhevkirina çûn û hatina sitêrkan e. Li gel vê jî, guman tê de nîne, ku Şerefyan yan hunermendekî din ê ku ev tablo çêkirîye, ev wêna han li gor hemû teferuatên mîmarîya rasteqînî ya xaniyên Hîzanê durust kiribe. Qet tu pencere di tebeqa yekem de nîne; ji ber ku hinek mîmarîyên ku nêzikî mîmarîya wir in, hinek rasaxanan di wênên xwe de cî bi cî kirine. Dûr nîne, avahiyên hinek rasaxanên sitêrnasîyê bi awakî burcê bûne û oda temaşekirina ji bo sitêrkan, di qata ser de û birek pencerên sêgoşên tûj li çarmedorê bûne. Wek Kela Şêrwan, ku tenê pencerên wê oda heft goşeyî, ku di qata arîkên duduyan de avakirî ye, sêgoşe nîne. Yanî armanca min ev e ku bêjim; ger wiha be, Kela Şêrwanê jî bi awayê xwe ve li gor terza mîmarîya van rasaxanên sitêrnasîyê ye.

Li dawiyê ez dikarim vêya han bêjim: Roja 10'ê Tebaxa sala 1977'an, ez ji bo dîtîna û wênegirtina hinek şûnewarên kevin ên Hîzanê; yên wek gora Sînem, Medresa Xawsê Hîzanê -ya ser Girê Xeydayê ya Rohilatê Hîzanê- çûm Hîzanê. Xaniyên bajarê kevin xera bûne, hinek ji surh û burcên kelê mane. Xelkê jî kevirên Medresa Mîr Dawud a milê bakurê gelî û yên li hemberê kelê, birine. Şerefyan behsa vê yeka han kirîye. Niha tiştêk wisa ji terzê avasazîya wî wextî ya Hîzanê sax nemaye. Vêca ez hêvîdar im, rojek ji rojan zanayên arkeolog vekolin û ser van şûnewaran lêgerfînê bikin ku tiştêk di vî warî de bi dest keve...

TABLOYA DONZDEHAN HÎZAN

Her wek me di pêşîyê de jî got, ev tabloya han li ser Hîzanê ye. Di vê tabloyê de, rezvanek bi merê, rezê xwe dikole, pêşkên kirasê xwe kirine ber piştîniya xwe, serkulavekî biçûk li serî ye. Herdu şeqên xwe ji hev fireh kirîye û bi erdê ve qahîm şidandîye. Ev dêmena han nîşana jêhatîbûn û meharetê rezvanîyê ye. Coyeka avê di rexê rez re derbaz dibe. Di dawîya tabloyê de siwerek dîyar e, kulavê wî mezin e, gulîngeyek mezin li ser serkulavê wî bilind bûye. Kewayek bê mil û kirasekî kurt lê ye û şalwarekî fiş ê fireh li xwe kirîye. Îhtîmal e ev siwarê han Mîr Hesênê kurê Melik Xelîl be, ku di wextê nivîsandina Şerefnamê de mîrê Hîzanê bûye. Siwerekî hêstirê(qatir) li pişt wî ye, hêstira wî spî ye, serkulavekî spî yê mezin li serê wî ye. Perrê teyrekî di ber ra kirîye, porê wî di binê ser-kulavê wî re derketîye û cilûbergên wî li yê wî siwarê pêşî diçe. Hunermend, piraniya rû û çavên wan kesên di tabloyan de ne, wek yê jinan bi goşt û gilover çêkirîne. Yê wî siwarê han jî gilover û bi goşt e, ku bi vî awayî li jinan diçe. Ne dîr e, ku jina Mîrê Hîzanê be, bi taybetî siwarbûna hêstirê, ji bo sernermî û hêminîyê, ji jinan re ji hesp û mehînan çêtir e.

Tiştêkî dirêj di teniştê wê de tê xuyakirin, ku mimkun e kaşo (dar qaşwan) yan jî rim e, serê wê li ser zîn yan jî li ser cila hêstirê qayîm kirîye. Du mirovên peya li pêşiya hespê wê siwarê ne, yek jî wan bi rî ye û simbêlekî reş ê badayî yê bê ser û ber heye. Yê din xortekî qelew ê bê simbêl e. Ihtîmal e, ku ew xulamê mîr be. Ew kesê bi rî qaşoyek di destê wî de ye û jinek jî ber bi wan de tê. Qaşoyek din li pişt jinekê dîyar e, ihtîmal e ku di destê yekî din de be, ku bedena wî di wênê de derneketîye. Ne dûr e ev grûba han ji bo qaşo listinê ji koşkê derdikevin.

Ev listika han, wek di tabloya çaran de jî hatiye nîşandan, bi darekî dirêj, ku jê re qaşo (kaşo, çugan) jî tê gotin û bi gogê (top), ku ew jî gilover e, tê listin. Ev goga han, yan ji dar tê duruskirin û bizmarên pan û mezin serê vî darê han tê xistin, yan jî ji livayê tê çêkirin û ji bo qayîm bûnê bi şûjinê tê dirûtin. Tê bîra min, ku wextê em hîn zarok bûn, me ji kevir jî çêdikir. Qaşo, yan yek perçe ye û serê wê hatiye tewandin yan jî ji du perçan tê çêkirin; yek dirêj û ya din jî kurt e, ya kurt bi ser ya dirêj ve tê qayîmkirin. Ev qaşoya di Şerefnamê de wêna wê hatiye kêşandin, di awayê ya diduyan de ye. Ev listika han gelek kevn e, bi Erebi jê re "el-kirre wel sulcan" tê gotin.

Diroknivîsê mezin ê diroka şaristanîyeta Îslamê George Zêdan, di vî warî de wiha dibêje: "*Ebbasîyan ev listika han di wextê Harûn Reşîd de ji Farisan wergirtin*"(43). Şerefxan, di rûpela 148'an a Şerefnamê de, behsa şayîyên babê xwe dike û wiha dibêje: "*Di wan çaxan de xortên Kurdistanê bi gelemperî listika qaşwanê dilîstin*". Eva han jî hêjayî gotinê ye; Gogmeydan, ku cîyekî sahe ya bajarê Bedlîsê ye û Medresa Exlasîye ya Şerefxan û gumbeta çend mîrên Bedlîsê li wir in, her bi navê wê listikê hatiye binavkirin. Ji ber ku ev listika han di wê meydanê de hatiye listin.

Binê Birca jî, ku ji wê firehtir e, meydaneka li pişt surhên Cizîra Botan e û gora Mem û Zînê li wir e, di wextê Mîrên Botan de cîyê meydana listika gog û rim avêtinê bûye. Şairê mezin ê Kurd Ehmedê Xanî, di rêzek şî'irên xwe ya Destana Mem û Zîn de, vî cîyê han bi "Meydan" navkirîye. Ji derveyê wê behsa çend cîyên din ên Cizîrê û der-dorên wê yên wek Çemê

Westanê, Nêrgiz û Seqlanê Mema(44) jî kirîye. Ewliya Çelebî, ku bi xwe yekem car çardeh roj li Bedlîsê maye, bi dirêjahî behsa lîstika qaşwanê ya ku li wir tê lîstin, kirîye. Ewliya Çelebî di vî warî de wiha dibêje: *"Rêzek kevir li vî serî û yeka din jî li serê din ê meydanê datînin û bi sedan siwar ên jî herdu milan dilîzin. Gog gilover e û jî dar hatiye çêkirin, mezîniya wê hingî serê miroveki ye û qaşowa wan jî ser gilover e û zer kirî ye"*(45). Eva han wek qaşoya di tabloyê de nîne. Ehemedê Xanî jî îşaretê vê lîstika han kirîye. Di Mem û Zîn de wiha hatiye. Dibêje ku Mîr Tacdîn qasidek dişîne ba Mîr Zeydîn û wiha dibêje :

Her çar serî deme wekê go

Çewganî îrade tawî qaşo (46).

Di wextê xwe de wextê ku lîstika qaşwanê li Kurdistanê belav bûye, siwar bi siwaran re û peyan jî bi peyan re lîstine. Du taxim di lîstikê de li hemberê hev disekinîn û her taximek hewlê dida gogê ji bo xwe bibe. Wek mîsal; di salên sîyan de, her carî sî-çil siwar ji bajarê Koyê derdiketin diçûn nêçîrê. Yan di çûn, yan jî di vegera xwe de lîstika qaşwanê dilîstin.

Her wiha cirît jî dilîstin û di vê navê re dehol û zurne jî bi xwe re dibirin, Ezeyê Zeynel Çawuş, ku di zurne lîxistinê de bi nav û deng bû, li zurnê û Heme Ebu jî li deholê dixist. Serbarê ser de jî, hespên xwe wisa hîn kiribûn, di wextê cirît û rim-bazîyê de li gor hewayaya zurne û deholê dimeşîyan(47). Niha jî lîstika qaşwanê di nav zarokên gundîyan de tê lîstin.

Nabe em vêya han jî jibîr bikin, ku lîstika qaşwanê di dewra Dewleta Moxolîyan (Îlhanî) de hebûye û wêna wê jî di nav wênên kitêba bidestnîvîs a Menafi'i el-Hîwan a İbnî Bextîşu'u de hatiye, ku nusxa eslî di Kitêbxana Murgan di bin reqema 500'an de ye. Wêneka ji ber vê hatî girtin di destê min de he/ye. Di qaşoya Moxolîyan de, serê parça biçûk tewandî ye, lê di wênên Şerefnamê de ya Kurdan rast e.

Di tabloyê de jineka serkulavê wê spî û tenik heye, li ber pencera xanîyekî ye û li xelkê dinêre, xanî sê qat e, qata xwarê ji kevirên neqîşkirî ye û yên din ji kerpîçê sor hatine çêkirin. Du pencerên wek şehê di nav hev re derbazbûyî, ku bi Êrebî jê re nafîze şemsîyye tê gotin, di qata sisîyan de ye, ji van cûrên

pencerên li Kurdistanê kêr in. Evên han ji bo jin xwe li ber bi-parêzin, hatine durustkirin. Yanî, ji bo ew di pişt pencera de ji derve bibînin û yên ji derve nekarin wan bibînin. Li Bexdayê ev cûrê pencerên han gelek in. Li xanîyên kevin ên Kerkuk û Koysencaq pîranîya van pencerên han ên biçûk, ji geçê hatine durust kirin, ne ji dar in û yên Silêmanîyê gelek bi qîmet in. Di tabloyê de, hinek xanîyên din ên di binîya vî xanîyî de tîr xuyakirin, ku ji kerpîçên sor hatine çêkirin.

Li tenîştî vî xanîyê sê qat, xanîyek yan jî dekorek dîyar e. Ger evê han xanî be hewşa (têhelkêş) wî tûne û lazim e xanîyên wê serdemê bihewş bin. Ji ber vê yekê, mirov dibêje; di navbera herdu çargoşan de dekorek ji xalekî reş hatiye çêkirin. Ez nizamî gelo eva han kunek biçûk e yan tiştêk din e?

Ihtîmal e, ku eva han kanîya jinan be, ji ber ku ser coyek avê ye, deriyê wê jî heye û ji şaxên zirav ên daran in. Ev cûre xanîyên han, an cîyên parastinan, bê hewş tîr avakirin. Min ev wêne han li Silêmanîyê nîşanî birek mihendisên îdara mi'elimîyê da, lê, kesekî tiştêk jê dernexist. Ji ber vê yekê, bawerîya min a ser van cûre xanîyan, wek min li jorê da xuyakirin e.

TABLOYA SÊZDEHAN

**NEXWEŞIYA DEMARGIRIYÊ
(ESABÎ-SÎNÎR) Û ÇARESER
KIRINA WÊ YA BÎ DUA**

Tabloya sêzdehan di rûpela 89'an de ye û li ser Fermanrewa-tîya Tercilê (Hezro) ye. Ji nexweşîya demargiriyê ya keça Mîrê Ertuqîyan û çareserkirina wê ji aliyê Şêx Hesenê Zerqî ve pêkhatîye. Şerefîxan, di rûpela 89-90'an a Şerefnamê de wiha nivîsandîye: "Ertuqê kurê Eksebu Ekseb (48), mîrekî Selçukî-yan bû û navça Mêrdîn û Dîyarbekrê di bin destê wî de bû. Keçeka wî ya sipehî hebû û nexweşîya demargiriyê girtibû. Çendîn doktor anîn ser, lê ewan nekarîbûn çareseriyekê lê bikin, heta daxwaz ji Şêx Hesenê kurê Şêx Ebdurrehman kir, ku ew bi navê Şêx Hesenê Zerqî bi nav û deng bû; mirovekî baş bû gelek mirîdên wî hebûn; bi dua keça wî baş bike. Ew jî hat û bi dua keça wî baş kir. Babê wê jî keça xwe da Seyîd Huseynê kurê Şêx Hesen"(49). Her bi vî awayî desthilata Tercilê jî jê re bexîşand, ku ji Hezro -qezayeke Dîyarbekrê ye- û Entax (Hetax, Îtax) pêkhatibû, ev cîyê han 75 kîlometro ji Dîyarbekrê dûr e û dikeve rojhilatê wê. Di havîna sala 1977'an de, ji bo resimgirtina Kela Entaxê rîya min pê ket. -Piştî wî kur û neviyên wî desthilatdarî- kirin. Ji derveyî van, çend kel û cîyên din jî ji navça Dîyarbekrê dayê.

Di vê tabloyê de, xaniyek wek mizgeftê di milê serê tabloyê de ye, ku wek gumbeteke pîvazî ye û rûkarên wî nexşdar in, ew giya û darûberên li ser hatî nexşkirin dîyar in. Ev nexş û pence-

rên wî jî di nîva rûkarê dîwar de ne. Ihtîmal e ev ne mizgeft be, xanîyê Mîr Ertuq be û bi awayê gumbetê hatibe avakirin. Keçika nexweş, li hewşa xanî û di nav nivînekê de raketîye. Raxistineke bi qîmet li ser mehfureke ciwan hatiye raxistin, tişteke avêtine ser keçikê û heta ser milên wê hatiye. Jinek, li gor wênê, li nêzîkî lingê wê û li milê rastê rûniştîye. Desrûyeka spî li serî ye û yeka din jî li dora wê pêça ye. Bawêşînek di destê jinikê de ye û li ser keça nexweş bawêşîne dîke, dîyar e ku xidamek wê be. Xidameka reşîk jî li milê destê çepê yê keçikê rûniştîye û fincanek di dest de ye, desrûya wê reş e û enîpêça wê jî spî ye. Şêx Hesênê Ezreqî jî bi sermêzer, bi rîyekî spî û cilûbergekî reş ve li ber serê keçikê rûniştîye. Wisa dixuyê duayê jî keçikê re dixûne. Mirovek li pişt Şêx Hesênê sekîniye, wêna wî heta derecekê têk çûye, lê, dişibe bi mirovekî dinî û ihtîmal e, ku mirîdekî Şêx Hesênê be. Mirovekî din li ser kursiyekê rûniştîye û herdu destên xwe danîne ser ranê xwe, bi awakî hêvîdarî li keçikê dinêre. Vî mirovê han kewayek bêmil û kirasek dirêj li xwe kirîye û kulavê wî li yê Turkmanên Yekîtiya Sovyet diçe. Niverasta wê wek taskulavê şerî ye, gulîngê li ser e, der-dorê wî bi awakî pan bi ser ve pêçandiye. Eynî jî vî kulavî di wênên Moxolîyan de jî tên dîtin. Wek ê Sultan Mehmûd Xazanî yê nevîyê Hulago (1295-1304'ê zayînî), ku di tabloya yekemin a kitêba bidestnivîs Menafî'i el-Hîwan a İbnî Bextîşu'i Ebdullayê kurê Cibraîl de tê xuyakirin. Kesê navê wî derbaz dibe, ev kitêba han jî bo Mîrê Kurd Nesr el-Dewle Ehmedê kurê Merwanê kurê Kek nivîsandîye û li ser daxwaza Sultan Mehmud Xazanî kirîye Farîsî û çend wêne jî tê de çêkirine. Li serê jina Mehmud Xazanî jî ji van kulavan yek heye. Wisa dîyar e, wênekêşê Şerefnamê, rêgeza Turanîyan wek ya Selçukîyan zanîye. Edî ewî jî ev yeka han jî bo Mîr Ertuqê Selçukîyan çêkirîye. Li gor qeneeta min ew mirovê di tabloyê de ye, Ertuqê kurê Eksebu bi xwe ye û çavrûyê wî di tabloyê de têk çûye. Sê guldan (gulav-rêj) li ser sînîyek belemî li ber e. Eynî sînîya belemî, di wê tabloya Minafî'i el-Hîwan, ya kurê Mehmûd Xazanî jî de hene. Her wiha tişteke dirêj li milê Ertuq e, mimkun e, rimek be, ku serê wê nayê dîtin.

TABLOYA ÇARDEHAN

**ABLOQA KELA BEDLÎSÊ JI ALÎYÊ
AKKOYUNLUYAN VE**

Ev tabloya han li ser Fermanrewatîya Bedlîsê ye û abloqekirina Kela Bedlîsê ji aliyê eskerên Dewleta Akkoyunluyan a di bin serokatîya Silêman Bijen de pêkhatîye. Şerefhan li ser vê bûyerê wiha gotîye; Hesenê Dirêj ê damezrênarê Dewleta Turkmen a Akkoyunluyan (871-882'yê koçî, 1453-1478'ê zayî-nî), di dema Mîr Îbrahîmê kurê Mîr Hacî Mihemedê Bedlîsî de, ordîyeke di bin serokatîya Silêmanê kurê Bijen de ji bo dagirkirina Kela Bedlîsê şand. Silêman, zivistanan diçû Bişêrî û Mêrdînê û dema zivistan dibû, dihat ser Bedlîsê. Bi vî awayî êrîşê sê salan domand. Ev êrîşa tund û dirêj, bû sebeb ku ew kesên di nav kelê de ji nexweşîya ta'un(reşannewe) û ji birêan mirin. Lê, tenê heft kes bi Mîr Îbrahîm ve sax man û ew jî pişt re naçar man û xwe dan dest. Silêman Bijen, Mîr Îbrahîm şand Tebrîzê ba Hesenê Dirêj û ewî jî qedrê wî girt û li Qomê karek dayê. Wextê Hesenê Dirêj koça dawîyê kir, Yaqubê kurê Mîr Îbrahîm, ji ber serkêşîya Eşîreta Rojkî, li Bedlîsê hat kuştin.

Li gor gotina Şerefhan wisa tê xuyakirin, ku abloqekirina Kela Bedlîsê, di sala 1453'an de yan jî hinek di dawîya wê de bûye. Dîyar e Mîr Îbrahîm mirovekî bi hêz û bi qedir bûye. Yek ji wan Mîrên Bedlîsê bûye, ku sikke lê daye û niha jî perên wî di Muzexana Stenbolê de hatine parastin, wek eva han di wê nama ku Muzexana Birîtanya ji min re şandî de hatîye behiskirin..

Di vê tabloyê de, Silêman Bijen li ser kursîyekê rûniştîye, rimek kurt di destê wî de ye, tîrên wî di tîrdanê de û şûrê wî jî di kalanê xwe de ye. Bazibenda şer li milan e û mertalê wî çend koşeyî ye û wek çetir tete ber çav. Ev cûre mertalê han di destê çend şerkerên din ên eskerên wî de jî hene û di tabloyên

din de gelek kê m in. Wisa dixuyê ku tişte bi qîmet e, ji ber ku der-dorên piraniya mertalên din gilover in û niverasta wan gurz gurz in, yanî ne rast in, qubbeyî ne, ku bi Erebi jê re "me-heddeb" tê gotin, her wiha xetdar in jî û xetên wan jî qeraxên wan dest pê dikin û di niverasta wan de kom dibin.

Ev cûrê mertalê han di nav Kurd, Faris û Osmanîyan de tèn dîtî, lê, vêca ez nizanim ev cûrê mertalên han ên Kurdan in yan ên dewletên din in? Di tabloya Şerê Edirne de, mertalên Bîzansîyan gilover û rast in, yanî di awayê van mertalan de nînin.

Cîyê gotinê ye, ku du cûre mertal di nav sen'etê Kurdistanê de hebûne û evên han jî di nav çekên Evdalxanê Bedlîsî de hatine dîtî. Ewliya Çelebî, di Seyahetname xwe (ya bi Tirkî) di rûpela 249'an de, bi navê Eyntabî û Dîyarbekrî bi nav kirîye. Di rûpela 49'an a wergera Kurdî de wiha dibêje: "*Şûr, xencer, rim, demance û sertîrên Dîyarbekrê bi nav û deng in*". Di rûpela 142'an de jî dibêje: "*Şûrê Şêxanî û Meqrawî li Bedlîsê tèn çekirin û nimunên wan qet li tu bajarekî din tune. Tîr û kevanên Bedlîsê jî bi nav û deng in*". Her wiha bi vî awayî didomîne: "*Dest û pêwendîyên Evdalxanê Bedlîsî, ku bi dehan hezar xelkê Bedlîsê ne û nûça mehanî ji wan distand, şev û roj mertalê Helebî bi milê wî ve, şûrê Şêxanî û Meqrawî li piştê wî û kopalê wî di destê wî de bû*". Lê, em nizanin awayê mertalê Helebî çawan bûye. Yan jî ew cûrên ku di wênan de pir tèn xuyakirin ew in, an na?.. Ji derveyî vê em nizanin "mertalê Kurdî" çawan bûye, ku Ewliya Çelebî di rûpela 209'an a Seyahetname xwe de wiha dibêje: "*Her yek ji Kurdên Hekarîyê mertalek Kurdî li milê wan e*". Tu bêjî gelo mebest ji vî mertalî yê Dîyarbekrê ye, yan ê Entabê? Ger wiha jî nebe, gelo li Hekarîyê, yan li cîyekî din ê Kurdistanê mertalên Kurdî dihatin durust kirin?!

Eskerên Silêman Bijen li milê xwarê Kela Bedlîsê û ser qeraxê rûbar hatine damezirandin, çekdar in, bi şûr, rim, tîr û ti-vingan şer dikin. Lûla du topan di bazindên gerîya wan re derketîye û kelê topbaran dikin. Di Şerefnamê de navê topan derbaz nabe, lê gotîye mencenîq bi wan re hebûye. Wek tê xuyakirin di wî wextî de top hebûne. Di nav eskerên Akkoyun-

luyan de hinek hene serkulavê Avrupîyan li serê wan e, ku her aliyek wan du serê wan ên dirêj hene. İhtîmal e ew ji eh-lên beşa rojhilatê navçên Anadolê yê wî çaxî bin, yanî der-dorên Sîwasê yan milên din, ku wî wextî di bin destê Akkoy-unluyan de bûne. Mîr İbrahîm, li ser kelê dîyar e, ku serkula-veki mezin li serî ye, rîyê wî reşê birincî û pîrr mezin e û mer-talekî şer jî di destê wî de ye. Du mirov li pişt wî ne. Alek li ser çiyekî kelê yê herî bilind e. Li xwarê Mîr İbrahîm di rûyê dîwarê kelê yê jî der ve, lûla topekê jî nav deriyekî hesin ê wek şehê ketî nav hev derketiye jî der ve, ne dûr e ku Mîr İbrahîm xwedan top jî be. Her wek çawan topên Evdalxan li ser kelê hebûne û ewan di şerê li dijî Melik Ehmed Paşa de bi-karanîye(50).

Du jinan di pencera şarşîna(balqona) qata sisîyan a kelê re serê xwe derêxistine jî der ve û cilûbergên reş li wan e. Ev cilû-bergên reş (di tabloya rengin de yek reş û yek jî sor e. n. J. N.), xemgînî û reşgirêdana jî bo sedan şehidên Kela Bedlisê ye. Ji ber ku piraniya wan di şer de hatin kuştin û yên din jî ji birçînan yan jî ji ber nexweşîya ta'ûnê mirin û tenê heft kes bi Mîr İbrahîm re sax man. Wek Şerefxan jî nivîsandîye, yek ji wan jinan a bi wan heft kesan re, jina Mîr İbrahîm e. Du miro-vên din jî di qata diduyan a kelê de dîyar in. Yekî din jî çûye ba yek ji wan eskerên ku ser-kulavê Avrupîyan serî ye. Ev eskerekî Silêman Bijen e û herdu bi hev re diaxivin. Wisa dix-uyê ew jî bo bi dijmin re guftûgoyê hatiye, ku bi şertê bê destlê-dana Mîr İbrahîm, ew xwe bide dest. Ev tabloya han dawîya qonaxa berxwedana Mîr İbrahîm nişan dide, yanî ew dema ku di kelê de tenê heft kes sax mane. Eva han jî ji aliyê huner-mend ve di tabloyê de hatiye teswîrkirin.

PÎVANA KELÊ

Di saya qelema Ewliya Çelebî yê dostê Kurdan -ku kariye 610 Kurdên esîr yên di şerê Evdalxan li ê dijî Melik Ehmed Paşa de jî şûrê Melik Ehmed Paşa rizgar bike, ku piraniya wan Êzîdî bûne û celadan dixwestin serê 190 kesên din jî jêkin,- li vir jî bo me tê ronîkirin ku pîvane û mîmarîya kelê ya ras-

teqînî di vê tabloyê de heyê. Ji derveyî vê, ku ew milê kelê ye seraya Evdalxan li wir bûye, niha xera bûye, ev cîyê han jî di-keve paşîya kelê, yan em bêjin milê rojavayê wê. Di tabloyê de, şarşînekî li ser çar kevanê bazindî yê qata sisîyan dîyar e, ku du jinan serê xwe di pencerê re derêxistine ji der ve. Her wek Ewliya Çelebî jî gotiye ku şarşîn di Kela Bedlîsê de hebûne. Di rûpela 106'an a wergera Kurdî de, di vî warî de wiha dibêje: "*Hemû pencere û şarşînên wê li ser burc û dîwaran in*". Eva han nîşana wê ye ku birek şarşîn di bilindaya kelê û di qata sisîyan de hebûne. Van şarşînên han dêmenekî sipehî û rind ji bo vê kela han a mezin bexişandine. 300 xanî tê de hebûne û 300 xêzanên (ailên) wan tê de hewîya ne. Ji derveyî van mexzenên (kîlerên) xwarinê, cîyên cebîrxane û twelên heywanan jî tê de hebûne.

Her wiha di rûpela 266'an de jî eva han gotiye: "*Kel, tebeq tebeq li ser hev wek xanîyan hatîye çêkirin û karekî avayîyê di kelê de hatîye kirin*". Lê, Evdalxanê zana, endazîyar, sitêrnas, bizişk û bêhempa, serayek li gora awayê Seraya "Fîdaqa" di kelê de durust kirîye. Der-dorê kelê çar hezar gav bûye. Di nav baxê xanî de jî 360 xanî hebûne. Avên fiskîyan (avpirjîn) ji devê şêr, kepîyê (poz) dêw û ji devê ejderha dihatin ji der ve (Binêre; rûpela 126, 266 û 106'ê Seyahetnamê).

Ser destê çepê yê tabloyê, derîyek hesin ê wek şeh di nav hev re derbaz bûyî tê dîtin, ku lûla topekê jê derketiye ji der ve. Eva han li gor vê mîmarîya kelê ye, ku Ewliya Çelebî di rûpela 106'an de behs kirîye. Ewliya Çelebî wiha dibêje: "*Di jêrê wê re rîya çûna nav bajêr heyê. Sê qat derîyê hesin ê mezin jê re çêkirîye, ku di nav derîyan de gelek cûre çek amade kirî ne*". Yanî çekên wek topê tê de çêkirî ne. Wek çawan eva han di wênê de tê xuyakirin. Di dema Şerefyan yan em bêjin ya Mîr İbrahîm de, top di kelê de hebûne. Ev tabloya han belgcyek aşkera ya vê babetê ye. Bi vî terzê mîmarîya kelan di dewra Şerefyan yan di pêş wî de jî hebûye û ne di dema Evdalxan de hatîye çêkirin. Vêca em dikarin bêjin, ku Ewliya Çelebî jî wesfê vê yeka han kirîye, ev tabloya han vê yekê îspatdike, ku ew wênên di Şerefyanê de hene, li ser bîngehekî rasteqînî hatine çêkirin.

TABLOYA PANZDEHAN

MECLİSA ŞEREFXANÊ BEDLÎSÎ

Tabloya panzdehan di rûpela 144'an de ye û li ser **Fermanrewatiya Şerefxanê kurê Mîr Şemseddîn e**. Yanî bapîrê (kalê) Şerefxanê dîroknivîs, ku ne tenê mirovekî xwende, lê mîrê Bedlîsê yê herî bidesthilat jî bûye. Wek ku Şerefxan jî nivîsandîye; li ser zanistîya sitêrnasî û remlê gelek pêş de bûye. Di sala 940'ê koçî (1533-1534'zayînî) de bi eskerên Osmanîyan re şer dike û bi 700 kes eskerên xwe ve tê kûştin.

Ev tabloya han li ser meclisa Şerefxan e. Yê navê wî derbaz bûyî, di nav baxekî de li ser kursîyekê rûniştîye û mirovên wî li der-dora wî sekinîne. Şerefxan di wênê de çarmil û dirêj tê xuyakirin. Ne dûr e Şerefxanê dîroknivîs, vî wesfê laşê bapîrê xwe ji babê xwe sehkiribe. Cilûbergên mîrîtiyê li Şerefxan in, serkulavekî spî yê mezin danîye serê xwe, ku gulingeyeke gelek mezin û serê wî qîtbûyî li ser heye û bi vî awayî gulinge ji bo qet tu Fermanrewayekî din çenekirîye. Vêca ez nizamim ev gulinga han ji birek perrên teyran, yan ji tiştek din hatîye durustkirin?.. Çav û rûyê Şerefxan, di wênê de heta radeyekê têk çûye. Li teniştê wî ya rastê surahîyek heye, ku ev cûre firaxên han ji bo şerab û gulavê hatine bikaranîn. Jinek û kurek dehdanzde salî li milê din, li ser pîyan sekinîne. Kurik (lawik) hinek ber bi jinikê ve çûye. Cilên jinikê renga-reng in û kewayekî bê mil û kirasekî dirêj ê jinan li ber e. Serkulavê wê wek ê mêran mezin e û ji eynî wî qumaşê xetdar hatîye çêkirin, ku ji

bo piranîya serkulavên mirovên di nav tabloyê de eynî qumaşî bikaranîye. Dûr nîne qumaşê serkulav hevrişim be. Wisa dixuyê, mertalekî şer jî li milê wê jînikê be, ku wek heleqeke mezin jî gulingê hatî çêkirin di navbera wê û Şerefexan de ye. Yanî, peywendîya herdukan bi hev re heye. Îhtîmal e mebesta wênekêş peywendîya jin û mêrî be, ku ev tiştê han di navbera herdukan de çêkirîye. Ji ber ku eva han Xatuna Şahbegê; keça Elî Begê Sasonî ye, ku jina Şerefexan û dapîra Şerefexanê dîroknivîs bûye. Vê jina han, di hewşa Mizgefta Şerefexan de, gumbetek ciwan a tûj û bilind li ser gora mêrê xwe ava kirîye û gora wê bi xwe jî di nav wê de ye. Dema ez çûm Bedlîsê û min xwest ez wêna nivîsîna li ser gora wan bikişînim da ku bixwînim, lê gelek mixabin, jî ber hazirnebûna micewrê wê û kilîtbûna derî, min nekarî ez vê mebesta xwe bi cî bînim.

Qet tu guman di vê de nîne, ku cilûbergên vê jina mîran, bi awakî rasteqînî hatiye çêkirin û yê dewra xelasiya nivîsîna Şerefnamê ye. Ewliya Çelebî jinên Bedlîsê nedîtîye, jî ber ku rûpêçayî bûne. Ewliya Çelebî di vî warî de wiha dibêje: "*Wek dostên min ji min re gotin; cilên wan spî ne û pêçe bikartînin. Taskulavên wan ên datînin serê xwe ji zêr yan zîv in û cilên wan sîyer û hevrişm in*"(51). Hêjayî gotinê ye, ku cilûbergên jinên Êzîdîyan jî kiras in û serkulavên wan jî spî ne, lê, ez nizanî ger niha hatibe guherandin. Di hinek navan re jinên beşekî Botan jî kirasên spî li xwe dikirin. Kirasên wan an wek ên jinên Ezîdîyan jî pertalên spî yên ji mainulat bûn yan jî ji cewên sîm yên sitûr bûn, ku jî pemboyê bûn û li gundên Botan dihatin çêkirin. Ji derveyî van li navça Torê û cîyên wek bajarê Mîdyat, Kercews û Hesenkêfê jî dihatin durustkirin. Evên han li van navçan dihatin çêkirin, qayîmtir jî bûn û li navçên Botan dihatin firotin. Heta sî sal berî niha, ne tenê li Torê, yanî navça rojhilat û bakûrê rojhilata bajarê Mêrdînê, li piranîya hinek navçên Kurdistana Tirkîyê jinan her kirasên spî li xwe dikirin, lê qutek û derpîyên wan spî nebûn. Ji bilî van kitankên (şaşkên) serê wan jî spî bûn. Kirasên mêran jî heta çokan yan hinek zêdetir dirêj bûn, lê herdu koşên wan hîn dirêjtir bûn. Ev kirasên han jî pemboyê spî yan jî ji bêzekî spî yê bi qîmet dihat durustkirin. Gelek li kiras û derpîyên Hindîyan

diçûn, lê kirasên wan rêkûpêktir bûn. Gelek kesan li derve bê şalwar li xwe dikirin, ji ber ku rewşa xelkê ya aborî nebaş bû.

PÊLAVÊN BÎ MORÎ

Awayê pêlavên (solên) di tabloyên nav Şerefnamê de ewqas ronî nînin, ku heta em bikarin li ser bisekinin û bizanin di wî wextî de li Kurdistanê pêlav çawan bûne û çend cure hebûne. Lê, di vê tabloyê de ferek ji pêlava Şahbegê Xatun ronî ye û baş tê dîtin. Rengê pêlava wê spî, yan rengêkî vekirî yê wek pembê vekirî ye, serê wê pan e, ne zirav e. Her wiha devê wê bi ser ve nehatîye tewandin. Wek di navekê re li Silêmanîyê yên wiha habûne û jê re panîbilind hatîye gotin. Çend mûrî bi pêlavê ve ne. Morîyên li ser wê pêlavê reş, yan şîn tèn xuyakirin. Hêjayî gotinê ye, ku Ewliya Çelebî di Seyahetname xwe, rûpela di 128'an de, behsa **nalînên sedefkarî** yên Bedlîsê kirîye. Ewliya Çelebî wiha dibêje: "*Xulamên Evdalxan, ku di Hemama Bax de kar dikirin, nalînên sedefkarî di pîyê wan de hebûn û ji bo wan kesên xwe dişûştin jî nalînên sedefkarî dianîn*". Di vir de em dibînin ku li Bedlîsê, nalînên sedefkarî û pêlavên bi mûrî hatine çêkirin.

Ew kurê li ber sênîya Şahbegê Xatun sekinîye, Şemseddîne babê Şerefxanê dîroknivîs e, ku kurê wî yê yekane bûye. Di vê tabloyê de kirasekî zerê bê pişkoc lê ye. Ji ber ku pêsîra wî vekirî nîne, yanî bê pişkoc e. Kefiyek avêtîye ser milê xwe û herdu serên wê di pêşî de ber bi jêr ve berda ye. Heta van demên han ên nêzîk jî, bi vî awayî kefi avêtina ser mil adet bû û niha jî li Kurdistanê Tirkîyê li gelek navçan wiha ye. Kurekî, bi destekî xwe mertal û bi destê xwe yê din jî tişteki dirêj û serê wê yê dirêj girtîye û wisa dixuyê ku eva han aletekî şer e. Di tabloya hejmara 13'an de jî tişteki wiha tê dîtin.

Li pişt Şerefxan, birek mirov sekinîne, sisê ji wan pasewan in û rim di destê wan de hene. Cilûbergên wan têkel in, lê, qumaşê serkulavên wan wek hev in. Eva han vê tîne bîra mirov, ku ev qumaşê han hevrişmê Îranê be, ku heta niha jî Kurdên li wir bikartînin. Ewliya Çelebî li ser mijara cilûbergên mêrên Bedlîsê wiha gotîye: "*Serkulavên wan zer, şîn, reş, sor û*

gewrên vekirî ne. Piranîya mirovên Evdalxan û kesên maqul ên dîn, kurkên samuran li xwe dikin". Di gelek cîyan de, wek mîsal; li ser behsa Melatyê û Dîyarbekrê jî behsa kurkên ji postên samuran kirîye. Çîna dewlemend ev kurkê han bikaranîye. Eva han jî wê îspat dike, ku di wî çaxî de ev yek li Kurdistanê hem zêde û hem jî bi qîmet bûye. Ewliya Çelebî di vî warî de gotina xwe bi vî awayî didomîne: "*Ewên di hêla rewşa aborî de nîvçehal in, şeyax li xwe dikin, ku eva han li Maden û li navça Şêrwan tên durustkirin*"(52). Yanî, Şêrwana bakûrê Sêrtê û Maden jî her îro jî bi eynî navî ye. Mebest ji şeyax, ku gotinek Tirkî ye; qumaşek û yan perçekî wek berrê sitûr e, ku bi taûderzî û ji hirîya renga-reng tê çêkirin û ji bo ser zîn û pişt zînê heywanan jî tê bikaranîn. Şeyax jî dirêj e û hinek caran heta ser çokan, yan jêrê çokan dirêj dibe. Xetên wê pan in û zivistanan ser cilûbergan tê li xwe kirin. Tê bîra min, li dor-berê 35 sal berî niha, ku me li hinek kesên xerîb didît, em bi wan dikenîyan. Di tabloya heftan a ser Hesenkêfê de, ew siwarê cilên dirêj li ber e û ji Dîclê derbaz dibe, cilên wî şeyax in. Ewliya Çelebî, di vî warî de wiha dibêje: "*Xelkên feqîr ên Bedlîsê boxas li xwe dikin*". Boxas jî gotinek Tirkî ye û tê mana kitanê tenik(53).

Di tabloyê de piştîniya pasewanê nîvekê baş tê xuyakirin. Vê bala min kişand; piştîni xetdar e û her ji wênê derdikeve, ku ji qumaşekî nerm ê bi qîmet e. Eva han her ew piştîniya hevrişm e, ku Ewliya Çelebî çend car behs kirîye. Ewliya Çelebî wiha dibêje: "*Li Kurdistanê piştîniyên hevrişm li piştta xelkê bûn*". Wextê li Bedlîsê çûye Hemama Baxê, bi dirêjahî behsa wê kirîye, ku bi çî awayî bi nexşê şûşeyî, eynik, kevirên mermer, seramik û kevirên sel ên fireh hatine raxistin. Heta wê derecê ku wextê Sultan Murad xwe tê de şûştîye, gotîye: "*Erê çî dibû li Stenbola min jî hemamek wiha hebûya*". Ewliya Çelebî bi vî awayî didomîne: "*Xulamên Evdalxan, ku Gurcî û Çerkez bûn, di hemamê de kar dikirin, kêr û xencerên cewherdarî kiribûn ber piştîniyên xwe yên hevrişim. Ev piştîniyên han di hêla awayê girêdanê de wiha bûn; li milê rastê li ser navêkê girêyek lê dihat dan û serê wê raste rast ber bi jêr de dihat berdan*". Ez di wê baweriyê de me, ku

niha bi wî awayî bi gelemperî girêdan nemaye. Lê, jinên çend navçên Kurdistanê, serên piştîniyên xwe di milê teniştaya xwe re berdidin.

Di tabloyê de, komek musîqajen li pêş Şerefexan hene (Musîqajên di tabloya rûpela din -a 145'an- de ye, lê ji bo ku bi hev ve ne bi şaşî li ser vê tabloyê hatiye hesabandin. n. J. N.). Ser destê çepê yê tabloyê, aletêkî bê tîl di destê mirovekî de heye, bejna wî aletî dirêj e û sandoqa wê qubbeyî ye, dişibe bi aletê musîqê yê çelo yê ku li Rojava tê bikaranîn. Mirovek din jî li teniştaya wî ye, dûr nîne ew jî musîqajen be. Bazewanek ser destê rastê yê tabloyê ye, lepik jî di destê wî de ye, teyrê nêçîrê li ser danîye û du mirovên din jî li balê ne. Li jorê tabloyê ser destê rastê, mirovek din jî teyrek nêçîrê ser destan heye. Teyrê nêçîrê, di çend tabloyên din de jî hene. Bêguman di wextê xwe de li Kurdistanê, bi teyr nêçîr kirin gelek belav bûye; bi taybetî jî di nav mirovên giregir de.

Di rûpela 122'an a Seyahetnamê de, Ewliya Çelebî, behsa navê panzdeh cûrê teyrên nêçîrê yê Evdaxanê Mîrê Bedlîsê kirîye. Wek; baz, şahîn, quş û her wiha baleban jî, ku eva han jî sinifa şahû (melik el-hezîn) ye(54). Heta van nêzîkahîyên han jî bi teyr nêçîrkirin di nav Kurdan de hebû. Berî Şêx Mehmûdê nemir esîr bikeve teyrên wî yên baz hebûn û pê nêçîr dikir. Xwedê jê razî be, Ebenewte, bazewanê wî bûye û Kerîmê Ardebare û Heme Ferecê birayê Ebenewte jî li Silêmanîyê bazewanîya Şêx kirine(55). Berêz Hamid Begê Mecîd Begê Caf, ku temenê wî 95 sal heta hîn zêdetir bû, wiha dibêje: "*Heta salên pêncîyan jî teyrên min ên nêçîrê hebûn.*" Li ba me nêçîr bi van teyran dihatin kirin; helo, baz, şahîn, tirunte û waş(başîq-başûk). Bi baz, şahîn û helo; nêçîra sak, kîrvoşk (kevroşk), qaz, purr, bet (çêrg, hebara) û teyrên din dihat kirin. Xortan bi waş û tirunte (tirumte), ku ev jî kotîrê(cinsek kevokê) mezintir e û ji waşê jî biçûktir û azatir e, nêçîra çolê pê dihat kirin. Wî çaxî baz û helo li Kurdistanê dihatin girtin û Şêxên Erebbên navçên Xelîcê ew dikirîn. Heta par ne pêrâr jî li navça Qeredaxê, teyrên nêçîrê bi 500 dînanan dihatin firotin.

TABLOYA ŞANZDEHAN

ŞAH TEHMASB LÎ BAJARÊ XELATÊ

Tabloya şanzdehan di rûpela 145'an de ye û behsa gihîştina Şah Tehmasbê kurê Şah Îsmailê Sefewî bo bajarê Xelatê dike. Şerefxan, di vî warî de wiha nivîsandîye: Di sala 938'ê koçî (1531/1532'ê zayînî) de Dewleta Osmanî di bin serokatîya Fîl Yaqub û Ulema (Ulma) de hêzek şand ser bapîrê wî, ku mîrê Bedlîsê bû, ji bo dagîrkirina Fermanrewatiya Bedlîs û ya Ruşkî (Rujkî). Şerefxan, Kela Bedlîsê û kelên din ên ku di bin desthilata wî de bûn, bi hêz û melzemên şer durust kir û Şemseddînê kurê xwe û jina xwe jî şand Kela Extemarê (ku niha ev kela han bi navê Dêra Extemarê bi nav û deng e. Di nav giraveka Gola Wanê de û nêzîkî bajarê Westanê ye. Evê dawîyê -mebest bajarê Westanê ye- keleka dewra Dewleta Urartuyan bûye). Şerefxan diçe bajarê Tebrîzê, ba Şah Tehmasb û daxwaza yarmetiyê jê dike. Şah bi xwe ber bi Bedlîsê de hat. Wextê Fîl Yaqûb û Ulema bi vî qasî hesîyan, hêzên xwe paş de kişandin û hinek topên xwe jî di cîh de hiştin. Şerefxan li bajarê Xelatê (dikeve ser qeraxê bakurê Gola Wanê û niha qezake wilayeta Bedlîsê ye) ji bo Şah şahîniyeka gelek mezin çêkir. Ji derveyî vê, ji pêncan yekê malhebûnên Fermanrewatiya Bedlîsê û li gel gelek diyariyên

bi qîmet pêşkêşî Şah kir. Şerefşanê dîroknivîs, bi dirêjahî behsa vê şahîniyê û dîyarîyan kirîye. Şah, roja 20'ê Seferê ya sala 939'ê koçî, 21'ê Îlona sala 1532'ê zayînî, li bajarê Xelatê bûye. Ji ber ku di wê rojê de fermanek nivîsandîye û Şerefşan kirîye Mîrêmîran ê Kurdistanê û li gor fermanê, Fermanrewatîya Bedlîsê jî bi Dewleta Sefewî ve girêdaye (rûpela 143-148'ê Şerefnamê ya bi destnivîs).

Di tabloyê de, Şah Tehmasb li ser textekî di bin çadireka jî nexşên giranbiha yên jî gîya hatî çêkirin, rûniştîye. Çadirek din li pişt çadira wî ye û nexşên gîya li ser tune. Şerefşan nivîsandîye, ku bapîrê wî çadirên mezin ên bi sed situn, yan sed gurîs û çadirên sor, şîn û yên gurîsên ku bi hevrişm hatî durust kirin, jî bo Şah û eskerên wî vegirtine. Textên zêr-zîv ên cew herdarî jî bo wî amade kirine. Şah di tabloyê de xurt tê xuyakirin, rî û simbêlên wî nînin û bi çavrûyê xwe ve bi goşt e. Şah, dîwankî rûniştîye, xeftanekî guldar li ser kirasekî dirêj li xwe kirîye. Pêşîya xeftan vekirîye û milên wî yên fireh û kurt heta nêzîkî enîşkên wî tîn... Ev cilên han jî kevin de mode bûne û xelîfên Ebbasîyan jî xeftan li xwe kirine. Edîbên bajarê Şamê jî gelek bikaranîne. Xeftan, bi piranî jî hevrişmê, yan jî jî teblesan dihat durust kirin(56). Di Kurmancî de jî kewayê jinan re xeftan tê gotin. Serkulavê Şah mezin û gilover e û ber bi jor de zirav bûye û kulavên kesên der-dorên wî jî wek yê wî ne. Di pêşî de me behsa serkulavên Sefewîyan kir, ku darek tê de dadiçikandin. Bi vî awayî serkulav di wênên dema Şah Tehmasb de tîn xuyakirin. Edî em nizanin navê Qizilbaşî -yanî sersor, ku jî bo sefewîyan hatîye bikaranîn, di wî çaxî de peyda bûye û heta îro jî jî bo Şîîyan tê gotin- jî ber vî darê sor bûye yan wek hinek dîroknivîsan gotîye; serkulavên wan her bi tevayî sor bûye? Mamostê dîroknivîs Mele Cemîlê Rojbeyanî jî bo min nivîsandîye, ku jî bo teqlîdkirina Şerê Sefîn, yanî cemaeta Îmamê Elî, perçekî jî qumaş li ser dipêçan. Di vê tabloyê de du carîye, yan du xulam, xwarinê yan fêkîyan jî bo Şah dibin. Du kes li teniştê wî sekinîne, yek jî wan, ku rim û şûr li ser heye, dişibe bi jinan. Du kesên din li pişt çadira dudu yan sekinîne, serkulavê yekî jî wan, li yê kesên der-dorên Şah naçe, jî ber ku wek yê Kurdan e. Yekî din jî li pişt çadira Şah

sekinîye, tê xuyakirin ku ev kesên dawîyê pasewan in. Çend gumgum, yan em bêjin surahî, li jêr textê Şah hatine danîn, ku evên han ji bo şerab û gulavê tên bikaranîn. Gurûbek musîqajen û dengbêj, di dawîya tabloyê û li pêşmiqabilê Şah rûniştine; yek ji wan li tenburê yê din jî li defê dixê. Didu, yan sisîyê wan jî distrên.. Piştîna sitranbêjê qelew baş tê dîtîn, xencerek bi ber de kirîye, cilek nîv mil ê bi pişkoy li xwe kirîye, ku cilên wiha di tabloyên Şerefnamê yên din de nayên dîtîn. Yeka jin li pişt sitranbêjan rûniştîye, ne dûr e, ku carîyek be û beşdarîya sitranbêjan dike.

Hêjayî gotinê ye, ku ev tabloya han li hemberê tabloya kurê Şerefxan danîye, lêbelê, wênekêş herdu terefan, yanî, Kurd û Farisan, ger çiqas di hemû milan de jî nebe, di awayê cilûberg û serkulavên de jî hev cuda kirine. Her wiha piştîniya Kurdan wek yên niha jî qumaş in, lê, yên Îranîyan kemer (kemerbest)in, wek çend wênên di vê tabloyê de, kemerên wan baş tên naskirin

TABLOYA HEVDEHAN SULTAN OSMAN

BEŞÊ YEKEM

Ji tabloya han heta tabloya hejmara bistan, di beşê diduyan ê Şerefnamê de hatine çêkirin û li ser sultanên Osmanî, paşayên Îranî û yê Turanîyên hevçaxê wan in. Ev tabloya han li gel behsa destpêka damezrandina Dewleta Osmanî hatiye. Li gor wê, eva han ji kurekî Sultan Osmanê kurê Ertuxrulê damezrênerê Dewleta Osmanî, ku piranîya dîroknivîsan ev tarîxa han ji sala 699'ê koçî (1299-1300'ê zayînî) didin destpêkirin, yan jî wek Şerefxan jî gotîye; sala 689'ê koçî (1290'ê zayînî) yan salek pêşîya wê bûye, hatiye damezrandin(57). Ev tabloya han du beş e û her beşek li ser rûpelekê ye û çarçovek taybetî jî ji wan re hatiye çêkirin. Lê, jê tê derêxistin, ku tabloya diduyan temamkerê ya yekem e. Di beşê yekemê tabloyê de xanîyek ji kerpîncan hatiye avakirin, tê dîtîn, ku qasî ji çaran yekê pêşîyê, seramîk yan mermerên çargoşe li ser raxistî ye, di awayekê sê goşeyî de hinek şerefe (qutke) li ser xanî bilind bûne. Osmanîyan, ev terzê rûkarên xanîçêkirinê ji Bîzansîyan girtine, lku uslubeke avasaziya Romanîyan e û berî hatina Îslamîyetê: li Suriyê belav bûye û av-

asazîya îbadetxanên bajarê Hezerê jî li ser vê regeza han hatine avakirin. Sultan Osman, li ber wî xanîyî, bi rî û simbêlekî reş ve li ser textekî rûniştîye. Serkulavekî mezin ê spî li serê wî ye, ku ji perçek rengê din bi tund û xweşik girêdaye. Kurkek bê mil, li ser kirasekî dirêj li xwe kirîye; ji siturîya wî tê naskirin, ku kurk e. Destê xwe yê rastê ber bi sînîyekê de birîye û destê xwe yê din jî ber bi erdê ve dirêj kirîye. Wek mebesta wî ji vê ew be, ku bêje; "*ez xwedîyê vê axê me* " yan "*ev erda han a min e*". (Di tabloya rengîn de destê rastê li se çonga wî û destê çepê jî bi riyê wî ve ye. n. J. N.)

Li gor wênê, li ser destê rastê sê xidam sekinîne (xwiya ye rismê di destê mamoste A. R. Yusuf de vaca hatiye kêşan çimkî ev xidam di tabloya rengîn de dikevin sermilê çepê. n. J. N.), ku ew carîye ne, yek ji wan sînîyek li ser destan e û xwarinê ji bo Sultan dibe, vî milê tabloyê hinek qetîya ye. Mirovek hinek ji wê wêde sekinîye, ji serkulavê wî tê zanîn, ku wezîrê wî ye. Ji ber ku ser-kulavê wezîrên Osmanîyan mezin in û di awayê çadiran de ne, yan em dikarin bêjin nêzikê awayê kîyark (kivark)an in. Mehfûrek li ber Sultan hatiye raxistin û wêna jin û mêrekî bejin kurt li ser hatiye nexşirin. Çend mirovên Osmanî li wê nîverastê ne, hinek ji wan cilûbergên sîvil (medenî) li wan in û yên din jî, ku fêş û şewqên eskerîyê li serê wan in, ew serbaz in. Yek ji wan serokê eskerî ye, ji ber ku ew şewqê eskerîyê, yan ew serkulavê ku ji kurk e, heta dawîya Şerê Cîhanê yê Yekem jî rêberên Osmanîyan didan serê xwe. Du kesên Osmanî rim di destê wan de ne, serê rimên wan li ser erdê ne û baş nayên dîtin. Du mirovên gundî yên mesîhî ji xelkê Anadolê, yan jî em dikarin bêjin; Bizansî, di tabloyê de tên xuyakirin. Şewqên Ew-rûpî danîne serê xwe, her milekî şewqên wan du liqên dirêj ên wek du şaxan in. Pasewanek jî li ser destê çepê sekinîye. Ne dût e, ku ew carîyek be. Ji ber ku nexşe qumaşe serkulavê wê li yê wan hersê carîyên din diçe û ev nexşên han jî ji çend belgên gîyayê wek sosin, ku dirêj û ji hev dût in, pêkhatiye. Eynî ji van nexşan di tabloya li ser Sultan Mehmed Fatîh û ya li ser Stenbol de jî, ser serkulavên xidaman, yan jî em bêjin yên carîyan hene. Îhtîmal e, ev nişaneke taybetî ya xidaman, an ên carîyên Osmanîyan bin. Ger

çiqas eynî ji van nexşan, yan ev nişanên han li ser serkulavê wî mirovê birî yê li pişt wezîrê Mehmed Fatîh jî heye. Ji ber vê yekê, tu bêjî gelo ev mirovê han berpirsiyarê xidam yan carîyan e?..

Eva han beşê yekem ê tabloya hevdehan e, ku li ser rûpeleke taybetî li hember beşê diduyan hatiye durustkirin; herdu yek mijar in û yek tablo tên hesêbkirin.

BEŞÊ DÏDUYAN

Beşê diduyan ê tabloya hevdehan du qism e, ku di rûpela 158'an û li hemberê beşê yekem hatiye çêkirin. Birek xelk li hewşa xaniyekî ku pencerên wî mezin in sekinîne. Ji cilûbergên wan tê zanîn, ji Faris, Tirkên Osmanî, Selçukî û regezên Ewropî têkelî nav hev in. Li gor serkulavê wan herdu mirovên, ku li ser destê rastê ê tabloyê ne, ew naşibin bi wan Tirkên di tabloya hejmara hevdehan a beşê yekem û yên di tabloya hejmara bîstan de. Evan darekî di serkulavê xwe de daçikandine, ku eva han nişaneke taybetî ya Îraniyên di wextê Dewleta Sefewîyan a dema Şah Tehmasb de ye, ku me di tabloya hejmara şanzdehan de behs kir. Her wiha piştîniyên wan li yên Tirkan naçin; wek yên Îraniyên di tabloya hejmara şanzdehan de ne û kemer in. Sernavik, yanî heleqa hesin a girêdana kemerê, serê wê pan e, ji derveyî vê, piştîniyên Tirkan ji qumaş in, sivik in û gelek mezin nînin. Kirasê yekî ji wan baş diyar e û heta çoka wî tê. Yên din jî ji pêşîra wan tê zanîn, ku eynî ne. Yekî din li pêşîya wan herdu kesan e. Cilûbergên wî wek yê Osmanîyan e û kirasekî dirêj wek ê di tabloya hejmara hevdehan de li ber e, heta li ser navîkê gelek pişkoke hene. Du kesên din di jêrê wan de ne, wêna yekî ji wan têkçûye, ya diduyan a li rexê wî teyrek nêçîrê ser destan e û ji serkulavê wî tê nasîkirin ku Selçukî ye. Serkulavê wî eynî wek yê Mîr Ertuqê Selçukî yê di tabloya hejmara sêzdehan de ye. Du kesên din ên nêzîkî van herduyan, awayê serkulavê wan baş derneketiye. Yek ji wan tişteke wek sîniyê li ser destan e û şûr jî li ser heye. Du kesên din li ser milê çepê yê tabloyê (ku eva han li ser rûpelekî taybetî ye) sekinîne. Serkulavên wan xetdar in, di awayê hêkê de ne, qeraxên wan bi awakî sê-çar car qatkirî bi

ser ve hatîye tewandin, ev cure serkulav ji çûxê ne, jê derdi-keve yên Tirkmanên kevin bin. Ji ber ku li yên Tirkmanên Yekîtiya Sovyet diçin, heta bi awayê xwe ve jî li yên Tirkmanan diçin. Îhtîmal e ku evên han gundîyên Osmanîyan bin. Du kes di navbera wan herdu kesên berê û hespan de ne. Serkulavên li serên wan, li yên Osmanîyan diçin. Yek ji wan -ku di navbera wan herdu teyrên nêçîrê de ye- tiştekan li ser destan e; di wênê de baş derneketîye. Li gor wan nişanên berê ku me behskirin, li cariyên Sultan diçin. Teyrek nêçîrê li ser destê yekî ji wan herdu kesan e. Li milê vî aliyê dawîyê du kesên din hene, şewqên Ewrûpîyan li serê wan in. Mimkun e evên han, ew Bizansîyên piştî dagirkirina axa wan, ku bûn berdestên Osmanîyan, bin. Yek ji wan ê dawîyê jî namek di dest de ye û li gel yê din diaxive.

Du hesp di tabloyê de dîyar in. Kesek li ser wan nîne û xulamêkî Sultan li ba wan sekinîye. Îhtîmal e, ev herdu hespên han yên wan herdu Îranîyên mêvan bin û heta awayê cilên hespên wan jî ji yê hespên Kurdan cîne ne..

Ez di wê baweriyê de me, ku armanca bingehîn a cûr bi cûr têkilîya van kesan wek di tabloyê de daye diyarkirin; pêşwazilêkirina nûnerêkî Îranê, yan em bêjin ê Îlhanîyan e, yan çend nûnerên din bin; hatine biçin ba Sultan Osman û hatina wî ya ser textê desthilatdariyê pîroz bikin, yanî serilêdana yekemîn Sultanê Osmanîyan e. Di tabloyê de dîyar e, ku dergevanekî Sultan bi pêş du Îranîyan ketîye û ber bi Sultan de diçin û Sultan jî ji dûr ve çaverîya wan dike û dike ber bi wan de biçê. Kesê diduyan ê ji wan nûneran tiştekan pan wek seetek danîye ser lepê destê xwe û ku wek jê tê zanîn, eva han dîyarîyek e û dixwaze pêşkêşê Sultan bike. Yekî din jî destê xwe daye hev û wek jê tê derêxistin, ku dîyarîyek di nav de be. Cîyê gotinê ye, ku wê çaxê Dewleta Îlhanî ya Moxolîyan li Îranê li ser text bû. Eger Osman sala 689'ê koçî bûbe Sultan, ev ew dem e, ku Erxunê kurê Abaqî kurê Hulago (683-690'ê koçî) hukmê Îran kirîye. Lê, ger sala 699'ê koçî be, eva han dema hukumkirina Sultan Mehmûdê Xazanî yê kurê Erxun (703-994'ê koçî) e. Yanî dibe ev nûnerên han ji aliyê yekî ji van herduyan ve hatibin şandin. Lê, yê wênekêş, ji ber ku ew nûner ji

Iranê hatine û ew melbend jî di bin desthilata Dewleta Îlxaniyan de bûye, her li gor cilûbergên Farisî yên dema xwe wênên wan kêşaye, yanî ne li gor serdema Moxolîyan û bi cilûbergên wan ve. Dûr nîne ew du Bîzansîyên, ku yek ji wan namêk di dest de ye û li gel yê din diaxive, nûnerên Bîzansîyan bin û berî nûnerên Îraniyan hatibin û ew name jî tehugek be û ji Sultan wergirtibin. Ji ber ku wek me got; du Bîzansîyên din jî di meclisa Sultan de ne û ihtimal e, her çar jî nûnerên Bîzansîyan bin. Her wiha dîr nîne ew herdu kesên, ku me got ser-kulavê wan li yê Turkmenan diçin, ew jî nûnerên taybetî bin.

CILÛBERGÊN OSMANÎYAN

Li gor wênên Şerefnamê û rastîya dîrokî ya di tabloyan de, ji derveyî fes û kulavên rêberên wan, serkulavên Osmanîyan spî û mezin in. Piraniya wan bi awakî dirêj, gilover û hilû ber bi jor ve diçin û nîvçe lûleyekê pêk tînin. Lê, yê wezîran jî yê hemûyan mezintir e, qismê xwarê di awayê çadir, yan em bê-jin; di awayê kumên feqîran de ye, ji yê Sultan sitûrtir e, lê kurtir e û naşibe bi pembo, kulavê wî jî hinek tûj e û hinek jî mêzerê ve derdikeve ji der ve. Dîroknivîsê Tirk Ahmet Rasîm, di kitêba xwe ya "Osmanli Tarihi" (Dîroka Osmanîyan) de (cilda yekem, perawêza hejmarên 556-565) behsa cilûbergên Osmanîyan kirîye. Ew di vî warî de wiha dibêje: "*Di dewra Sultan Osmanê kurê Ertuxrul de, kulavên wan wek yê derwêşên Mewlewîyan bûne, surmedar bûne û navê şaşika ku li der-dora wê dipêçan, sike bûye*". Car û baran jî serkulavên mirovên Sultan re "destar yusfi" dihat gotin, niha jî ev kulavên han ên serê wan dirêj li serê hinek dewrêşên Kurd ên Silêmanîyê hene. Ferîdunoğlu Arif Efendî yê neviyê (torinê) Mewlana Celaleddînê Rûmî, qatek cilûbergên derwêşê Mewlewîyan pêşkêşî Silêman Paşa yê rizgarkerê Rumelîyê kir(58), ku ji sike, ferace (curek cubbên tenik û fireh e-Elîşêr.), tennure (fistanên derwêşên Mewlewîyan-Elîşêr) û kemerê pêk hatibû. Sultanên Osmanîyan, heta dema Mehmed Fatîh, cil-bergên Mewlewîyan li xwe dikirin. Pişt re mêzerên xwe bi surme nexş

kîrin û jê re taqqetekye û navê tennure jî guherandin kîrin "qanûn quşağî", yanî piştîniya "qanûnî". Mêzera wezîrê mezin (wezîru'l 'azem) di awayê çadirê de bûye û ber bi pêş de meyîldar bûye. Mêzera Şeyxu'l İslam biçûk bûye. Hewce ye em vêya han jî bizanin, ku ferace wek kewa ye, bi milê alîyê piştê ve vekirîye ji alîyê pêşîyê ve jî girtîye û di wextê Dewleta Osmanî de cilûbergê zanyaran bûye. Niha di nav mirovên dîni yê gundan de ferace hene. Kemer jî curek piştînyek sêçar tîlî pan e û bi derzîyê ji hevrişmê renga-reng û hinek caran ji yê sîmdar jî tê durustkirin. Îhtimal e, ku di tabloya Mehmed Fatîh û ya Stenbolê de, Sultan jî kemer li piştê xwe girêdabe. Kemer, bi pîranî li ser kewa yan bi awakî din em bêjin; ser cilûbergên dirêj tê girêdan. Kemer, ne tenê di nav Osmanî û İraniyan de hebûye, ji ber ku Kurdan jî bi kar anîye. Wek mîsal; di wêneke tabloya yekem a Şerefnamê de, kemer heye. Ne dûr e, ew Asûriyê ku di tabloya hejmara diduyan de li ber deriyê Kela Dêzê ya li Hekarîyê, sekîniye, ewî jî kemer li piştê xwe girêdabe. Eva han jî heye, ku ew dikandarê di tabloya yanzdehan de yê nîverastê de ye, kemer li piştê hebe. Heta van salên dawîyê, li Kurdistanê kemerên Hemyane hatine bikaranîn. Bi taybetî kesên dewlemend yê bajaran li ser cilûbergên xwe yê dirêj girê didan. Ji ber ku ji piştîniyên qumaş qîmettir û bihatir bûne. Niha jî kemera Hewêz Hebîb Axayê Koysencaxî li ba min e. 150 cm. dirêj e û ji du perçan pêk hatîye; perça yekem di dema girêdanê de dikeve ser ya diduyan. Ji kitêlên(kêlên) dirûtina derzîyê yê renga reng ê ji hevrişmê hatîye çêkirin û gulingeyek bi rîşî li ser e û bi sê qayîş û avzêman tê qayîmkirin.

TABLOYA HEJDEHAN ŞERÊ EDİRNEYÊ

Ev tabloya han a di rûpela 173'an de (li gor tabloyên rengîn din. 172 û 173 yan de. n.J. N.), behsa Sultan Muradê kurê Orhanê kurê Osman û şerekî wî dike. Yanî; Sultan Muradê Yekem ê di navbera salên 1359-1389'an de hukum kirîye. Vêca, ji ber ku Şerê Edirne û dagîrkirina wî bajarî ji hemû bû-yerên dewra wî girîngtir bûye, ihtîmal e, ev tabloya han jî behsa wî şerî bike. Şerefxan, di rûpela 172'an a Şerefnamê de wiha dibêje: "*Di sala 763'ê koçî (1361/1362'ê zayîni) de Sultan Murad eskerek di bin serokatîya Lillahê Şahîn de şand ser Edirne, ku niha merkeza bajarekî Tirkîyê ye. Şerek gelek mezin li gel Bîzansîyan qewimî û pişt re Sultan bi xwe jî beş-darî şer bû, Kela Edirne abluqe kir û ji rûbarê Merîç derbaz bû. Tekurê rêberê Bîzansîyan bi belemê baz da û Sultan jî bajar dagîr kir.*" Ev gotinên Şerefxan, bi tevayî li gel tabloyê li hev tên. Wek di tabloyê de jî Sultan ji ava Merîçê derbaz bûye û gehîştîye ber kelê. Ji ber vê yekê ev dibe belge, ku ev tabloya han li ser Şerê Edirne ye, ne li ser Şerê Kela Bîrxoz ya Kela Xurlî yan jî li ser şerek di dema Sultan Murad de ye.

Li gor tabloyê, êrişa Osmanîyan di milê rastê de hatiye ser Bîzansîyan û ew ber bi şikestinê de ne, tirs û rev dikeve nav eskerên Bîzansîyan, ku ew bi şewqên serên xwe yên Ewrûpî tèn naskirin. Sereskerê hêza Osmanîyan li ser girekî bilind ê li hemberê Kela Edirne sekinîye û li şer dinêre. Lillahê Şahîn,

di nav wan de bi cilûbergek spî, yan nêzê wî, di wênê de tê xuyakirin, ku bi temen e, çend mirovên bi rim li rexê wî dîyar in. Ji ber ku di wê navê re Sultan Murad tê, wek Şerefxan jî dibêje; piştî şikestin û paş ve kêşandina Bîzansîyan Sultan tê nav kelê.

CURE TÎVINGEK

Ev yeka han di tabloyê de derdikeve, ku Bîzansî çekdarên agirbar in û Osmanî jî bê tiving in, eva han nebe, ku çekek agirbar li pişt Lillahê Şahîn de tê xuyakirin û du xwehrîfî di vê çekê de heye û devê wê, wek a aletê buqa eskerî (borezana eskerî) mezin e. İhtîmal e, eva han tivingek be, ku çend gulan têxin devê wê yan jî aletek e pê neft û agir tê avêtin. Yek ji Bîzansîyan li ser kelê tivinga xwe ber bi wî aletê şerê yê Osmanîyan ve dirêj kirîye, ku eva han di awayê tivingên qinnase (tivingên bi dûrbîn) de ye û mimkun e wî çaxî qet nebe, lê di dema Şerefxan de qinnaseya bi dûrbîn hebe. Ji vê wêdetir, tivingdarek di pencerekê de tivinga xwe girtîye û ber bi Osmanîyan de diteqîne. Ev tivinga han gelek dirêj e û devê wê gilover tê xuyakirin, yanî bazindekî hesin li dora devê wê ye. Di xwarê kelê de, tivingeka kurt di destê Bîzansîyekî de ye. Di wê tabloyê de, sê, yan çar cur tiving tên xuyakirin, wisa tê kivşê, ku di wî wextî de Bîzansî zêdetir xwedî tiving bûne. Bêguman, di wî wextî de tiving hebûne, ji ber ku dîroknivîsê mezin ê şaristanîyeta İslamîyetê George Zêdan, di kitêba xwe ya bi navê "Tarîx Temeddun el-İslamî" cilda yekem di rûpelên 201-202'an de, wiha nivîsandîye: "*Xelkên Marokoyê jî di sala 1118'ê zayînî de şer bi çekên agirbar kirine*". Ji İbnê Xaldun jî eva han wergirtîye; "ehlên welatê Mexribê di sala 762'ê koçî (1273'ê zayînî) de şer bi tivingan kirine". Di ecêbmayîna malumatên İbnê Xaldun de derdikeve, ku wê çaxê çekekî degmen bûye. Edî ez nizanim di vî şerî de tiving tune be, û wî hunermendê Kurd li gor hoyê karê wênê çêkirîye, ku belkî li ser hebûn û şiklê çend cûre tivingên di sedsala şanzdehan de ye. Ev a han jî nimuneke din a giranbiha ji giringîya wênên Şerefnamê ye.

TABLOYA NOZDEHAN

SULTAN MEHMED FATİH Û STENBOL

Ev tabloya han di rûpela 190'an de (190-191), li ser dagîrkirina Stenbola paytexta Dewleta Osmanî ya di sala 857'ê koçî (1453'ê za-yîni) de ji aliyê Sultan Mehmed Fatîh de hatî kirin e. Wêna Behra Marmarê di tabloyê de hatîye çêkirin. Sultan Mehmed Fatîh, bi rîyek reş û serkulavekî spî, yê mezin û lûlekî, li hewşa xaniyekî li ser kursiyekê rûniştiye. Yek, ji serkulavê wî tê zanîn, ku wezîrê wî ye, nivîsek di dest de ye û li milê wî yê çepê sekinîye. Ji wî hinekî wêdetir, mirovek rûniştiye, ihtîmal e dergevanê Sultan be, yan bi gotinek din; serokê carî-yan be. Ji ber ku ew nexşê wek sosinê bi serkulavê wî ve ye; nişana xulam û cariyên Sultanên Osmanîyan in, wek me di tabloya hevdehan de behsa vê yeka han kiribû. Çar xizmetkar, ku ne dût e carîye bin, bi wan nişanan ve di tabloyê de dîyar in. Sisê ji wan li ser destê rastê yê Sultan Mehmed in û yê çaran jî serê xwe ji derî ve anîye der. Çend kes li milê pêşî li hemberê Sultan in, wisa dixuyê yek ji wan xezemek di kepîyê wî de ye. Fes li serê wan hene û qumaşek tenik ê xetdar li dora fesên xwe pêçane. Gulingek dirêj bi fesên wan, ve, yan

perçek taybetî wek gulinge, li milê alîyê piştê li ser milê wan ber bi jêr de hatîye xwarê. Ev fesên han ên eskerî ne. Ji ber ku ev cûre fesên han li serê mirovên eskerî yên Osmanîyan hene. Ev cûre fesên han di tabloya Şerê Çaldiranê de jî tên xuyakirin.

Xanîyek di nav behrê de ye û çend kesên din jî di tabloyê de dîyar in. Yek ji wan sîdarek (şewqên eskeran ên ku li pêşîya wan sîper heye-Elîşêr) di awayê sîdara eskerên niha li serî ye, ku evê han dişibe bi şewqên eskerên Iraqê yê sinifa eskerên tanq(debabe)an, yek ji wan jî ku dişibe bi mirovekî feqîr, serkulavek biçûk li serî ye. Bi vî awayî du cure serkulav, cara yekemîn di tabloyên Şerefnamê de tên dîtin.

Ev pêşçavxistina jorê, tenê beşê yekem ê tabloyê bû, ku li ser rûpelek taybetî hatîye çêkirin. Beşê duduyan ê tabloyê, li ser rûpelekî li hemberê wê ye û cardin wêna behrekê ye. Di tabloyê de, mizgeftê li ser qeraxê behrê ye û du minare jî di koşên rojhilat û rojavayê minarê de ne. Du mirovên dîni di wênê de ne; yek ji wan xwedî serkulav û cilûbergek spî (zer. n. J. N.) ye û li ber pencerekê rûniştîye. Yê din xwedî serkulav û cilûbergek reş (şînê tarî, n. J. N.) e û li ber pencereke din e. Mirovek din ê dîni, ku xwedî rîyek spî û gelek dirêj e, li pişt vê beşa mizgeftê, di alîyê minara rojhilat de ye. Kur û keçek jî li milê minara koşa rojava ne. Destrûkeka rengîn li serê keçikê ye û destrûkeka din jî li der-dorê wê pêça ye. Kurik li der ve ye û keçik jî li ber pencera xanîyekî nexşdar e û li hev û du dînerin. Jinek li pişt pencera xanîyekî ye, ku li pişt vî xanîyî ye. Serkulavê wê wek yê keçikê ye, lê, destrûka serê wê spî ye û destrûkeka din a biçûk jî li der-dorê qayîm pêçaye. Ev cure destrûk girêdan ên jinên navsere ye.

XANIYÊN WAN

Di warê terzê mîmarîya xanîyan de em dikarin vê bi bêjin:

Dîwarê wî xanîyê ku Sultan Mehmed Fatîh li hewşa wî rûniştîye, ji kevirên spî yên çargoşe yên wek seramîk, yan her seramîk bi xwe ye li ser hatîye raxistin. Lêbelê, xanî jî kevirên adetî hatîye avakirin. Wek wî raste dîwarê li pişt Sul-

tan, ku di wênê de bi regekî reş (morê tarî. n. J. N.) derketîye. Rûkarên xanî ji bo rindî û spehîtiyê kirîye çar beş. Awayek sê goşe, bi awakî dirêjî di nîverasta dîwar de ye, tu dibêjî belkî ji bo nexşekê, yan nivî-sînekê terxan kirîye. Ger çiqas ev awayê han baş ne dîyar e, lê, wisa tê dîtin, ku birek şiklên gilover di nav vê sêgoşê de rêz kirine. Qubhên li ser bi bilindîya xanîyan dirêj û çargoşe ne. Osmanîyan gelek ji van cûre qubhan di bînasaziyên serayan de durust kirine û niha jî li Iraqê li ser vê rîyê diçin. Ewa me got mizgeft e ihtîmal e beşa wê ya piştê medrese be. Di wî wextî de serbanên wan wek sacên rojavayê bûne, yanî wek serbanên xanîyên Ewrûpayê. Niha jî serbanên piraniya xanîyên bajarên Tirkîyê bi vî awayî ne, yanî bi kêremît hatine girtin û siwax kirin. Beşa piştê, ku gumbeteke çav çav e û di şiklê hêkê de ye, mizgeft û minarên wê dikevin herdu koşên wê yên hewşê. Her minarek du kemerpêçên wê hene, kemera jorê bilindtir e. Ev minarên han û terzê bînasazîya minarên Osmanîyan yek û du nagrin û ne wek hev in.

TABLOYA BÎSTAN

ŞERÊ ÇALDIRANÊ

Ev tabloya han li ser wî şerê dîrokî yê di navbera Dewleta Osmanî û ya Sefewîyan de ye, ku li Çaldiranê, yanî; li Kurdistanê çêbû(59). Ev cîyê han li ser qeza Muradîyê(Bêgiri) ya ser bajarê Wanê, li Kurdistana Tirkîyê ye. Şer, roja sîyê meha Recebê ya sala 920'ê koçî (24'ê Tebaxa 1514'ê zayînî) destpêkir, ku nêzikê dused hezar, yan hîn zêdetir çekdarên ji xelkên Rojhilata Navîn bi herdu milan re beşdarî vî şerî bûn û xwîna hev rijandin. Nezmîzade di "Gulşenê Xulefa"; rûpela 185'an de wiha dibêje: *"Li der-dorê deh hezar kesan hatin kuştin. Piranîya mîrên Kurdan piştgirîya Dewleta Osmanî kirin û hêzên Kurdan rolek mezin di serkeftina Osmanîyan de listin û heta çend mîrên Kurdan di vî şerî de hatin kuştin"*. Hinek dîroknivîs, Şerê Çaldiranê dikin destpêka dîroka siyasî ya nû ya Kurdan. Ji ber ku Kurdistan, ji Kurdistana Bakur bigire heta Kerkûk, ku di bin destê Dewleta Sefewîyan de bû, ket bin destê Dewleta Osmanîyan. Ewa han jî li gor xwestin û daxwaza mîrên Kurdan bû. Ji ber ku nerchetîya wan li ser problema sunîtîyê hebû, ev jî ew bû ku sîyaseta Şah Îsmailê Sefewî a di vî warî de di cî de nedidîtin. Sultan Selîm jî ji bo vê piştgirîya han, biryar da ku sîyaseteke nerm li hemberê Kurdan bi-domîne. Ji ber vê, mîrên Kurdan ji bo rêvebirina senceqên xwe, bajarê Dîyarbêkrê wek paytext bijartin. Ji ber vê jî heryek ji wan kar û barên navçên fermanrewatîya xwe, ku pişt re bûn senceq, bi rê ve birin. Qet fermanberek Tirk di wan senceqan de nehatin danîn, ji derveyî walîyê wîlayetan ku ew Tirk bûn. Yanî em dikarin bêjin; hukumranîyeke wek serbixweyî ji wan mîrektîyên Kurdan re hat dan û di vî warî de Sultan Selîm

fermanek derêxist(60).

Tê dîtînan ku Şerê Çaldiranê, şûnewarek kargerîni li pişt xwe hiştîye. Heta hunermendên Îranî, Tirk û Kurd jî, sêsed salan piştî şer, wênên vî şerî di tabloyên xwe de nexşandine. Wek mîsal; Rîch, di roja 26'ê Tebaxa sala 1820'an de, tabloyeke vî şerî li bajarê Sine, li ser dîwarê koşka Emanalla Xan ê Mîrê Erdelan dîtîye(61). Ahmet Rasim ê dîroknivîsê Tirk jî, di rûpela 259'ê kitêba xwe ya "Osmanli Tarihi", di cilda duduyan de, tabloyek Şerê Çaldiranê çap kirîye. Lê, eva han wek tabloya Şerefnamê sipehî nîne û hemû zanyariyên li ser şerî tê de tunene.

Di vê tabloya Şerefnamê de, şerek gelek germ û tund têt ber çavan. Bi awakî wisa ku gulên top, tiving û seretîran di Deşta Çaldiranê de têkelî nav hev û du bûne. Eskerên Îranê li milê rastê ne û Şah Îsmail jî li ber devê çadira xwe di navbera du kesan de sekinîye. Ya milê rastê jina wî ye û yê milê çepê jî kurek e, ku ihtîmal e, kurê wî be. Şah, bi çavekî rikoyî li Sultan Selîm dinêre. Eskerên Osmanîyan di milê çepê yê tabloyê de hatine wênekirin. Di nav hêzên Osmanîyan de; Tirk bi fes, Ewrûpî bi şewqe û Kurd jî bi serkulavên xwe ve di meydana şer de tîn naskirin û ev hêzên han li ser birek hatine birêzkirin. Heta li gor cîyê Kurdan, wêne, bi awakî temamî li gel wan zanyariyên Nezmîza de yê dîroknivîs digoncin, ku di rûpela 185'ê "Gulşenê Xulefa" de wiha dibêje: *"Eskerên Rumeliyê, yanî beşê Ewrûpayê Tirkîyê û eskerên Dîyarbekirê, yanî eskerên Kurdan, di vî şerî de, herdu, di aliyê milê çepê yê eskerên Osmanîyan de cîyên xwe girtibûn"*.

Wêna Sultan Selîm di cergê eskerê Osmanîyan de têt dîtînan, ku siwarê hespekî mezin ê zengil di milê wî de ye û du kesên bivir di destê wan de, li pêşîya hespê wî dimeşin. Sultan bi awakî rikoyî li Şah dinêre, lêva xwe digeze û rimek mewcdar jî di destê wî de ye. Hêzên pîyade yên tivingdar jî li nêzîkê wê nîvcergê ne û top li pêşîya wan in. Ev a han jî li gel wan zanyariyên Ahmet Rasim digunçe, ku di "Osmanli Tarihi" cilda yekem di rûpela 265'an de, eva han gotîye: *"Sultan, bi hêzên xwe yên Yenî Çerî di nav cengê de bû û rêzek deveyên ku topên li ser ereban dikîşandin, li pêşîya wî bûn"*.

Osmanîyan, li gor tabloyê, topên xwe li milê rastê yên hêzên xwe kom kirine. Di dawîya tabloyê ya milê çepê de, topên xwe bi ereban ve girêdane û berên eskerên wan ber bi eskerên Îranê ve ne. Her wiha çend topên din jî di nav cengê de tên dîtîn. Bêguman ev topên han bi zincîr bi hev ve hatine girêdan. Lêbelê, hêzên siwarî yên Îranîyan, topên Osmanîyan jî hev veqetandine, yanî zincîrên wan qetandine, wek di nav cengê de tê xuyakirin, hespek bi lingên xwe ve zincîrê topan jî hev kirîye. Di wê nê de eva han jî daye nişandan, ku topên Osmanîyan zerarekî mezin dane hêzên Îranîyan ên ser destê çepê û ew ber bi şikandinê de birine. Eva han jî li gel zanyariyên Ahmet Rasim hevmebest e, ku di vî warî de wiha dibêje: *"Eskerên Mehmed Xan Estaclo, di milê çepê yê eskerên İranîyan re êriş bir ser milê rastê yê eskerên Osmanîyan, lê, Sînan Paşa, karî bi topan wê êrişê pûç bike û bi xurtî biçe ser wan. Mehmed Xan û kurê xwe di vê êrişê de hatin kuştin"*.

Di rastîya xwe de kuştina Mehmed Xan, ku li Dîyarbêkrê sereskerek Şah bû -yanî ew perça ku îro jê re Kurdistana Tirkîyê tê gotin- bû sebebê şikestinê, jî ber ku hêza milê çepê ya eskerên Îranê tûşî zerarek gelek giran bû. Ew zerarên ku Osmanîyan bi hoyê topên xwe ve di vî milî de li Îranê xistin, di tabloyê de xuya ne. Dûr nîne piştî kuştina Mehmed Xan, Şah bi xwe bû serokê milê çepê yê eskerên Kurdî, mimkun e piştî vê bûyerê ye, ku Şah birîndar bû û jî hespê xwe ket. Vêca piştî vê ye, hêza eskerên Yenî Çerî yên di nîverasta eskerên Osmanîyan de bûn, êrişî milê çepê yê Îranîyan kirin. Edî piştî vê, eskerên Îranîyan şikestin û jina Şah jî bi dîl hat girtin. Li milê çepê yê Osmanîyan top hebûn, lê, roleke çalakane li ser milê rastê listîye û bûye hoyê kuştina Mehmed Xan Estaclo, ku Şerefxan gelek caran navê wî bi bîr anîye û gelek zêde li ser wî sekinîye; jî ber ku peywendîya wî bi dîroka Kurdistanê ve hebûye. Piştî vê bûyerê gelek demek dirêj jî, her hêzên wî li Kela Dîyarbêkrê, Mêrdînê, Cizîrê û li kelên din ên Kurdistanê mabûn û xwe nedabûn dest. Nêzîkahîya du salan piştî vî şerî, vêca Osmanî û Kurdan bi awakî gelek zehmet, navçê rêk û pêk kirin. Her jî ber vê yeka han e, ku wênekêşê Şerefnamê, pîranîya wênên hêzên topan ên wî milî çêkirine. Di serbarê van

hemûyan de jî, ku hêza milê rastê ya eskerên Iranê, zerarek gelek zêde li topên milê çepê yê hêza Osmanîyan daye.

Cilûbergên hêzên siwarîyên Osmanîyan ji yê peyan cuda ne, jî ber ku cilên wan kurt in û serkulavên wan spî ne û çekên wan jî rim, tîr û şûr in. Yeka din jî, wêna çekên agirbar, ên wek top û tivingan, di nav Îranîyan de nekêşaye, tenê wêna rim, tîr û şûran kêşaye. Wisa dixuyê mebesta wî ji vê ew bûye, ku bide nîşandan; çekên agirbar ên Îranîyan gelek kê m û sist bûne, yan her qet topên wan tunebûne. Lê belê, li gor tabloyê çekên agirbar yê Osmanîyan gelek bi hêz bûne û bi taybetî jî top, ku bûye sebebê serekî yê şikestina Îranîyan û serkevtina Osmanîyan. Ahmet Rasim di vî warî de wiha dibêje: *"Hêzên siwarî yê Iranîyan gelek bi hêz bûne, fedayîyên wan gelek bûne, lê belê, hêzên wan yê zirxî lawaz bûn û topên wan jî tunebûne. Her wiha hêzên wan yê peya ne bi rêk û pêk bûne. Eşkera ye, hêzên siwarî yê Osmanîyan, ku li dora heştê hezar û yê peya jî çil hezar kes bûye, di alîyê rêxistinîyê de bi ser û ber bûye"*.

Şerefxan di Şerefnamê de, bi berfirehî behsa van zanyariyan kirîye. Ji ber ku evên han ku di tabloyê de wêna wan hatine kêşandin, deqa zanyariyên dîrokî ne û behsa bûyerên vî şerî dikin. Wek ku min di pêş de jî got; ew hunermendê ku wênên van tabloyan kêşaye, mimkun e, dîroknivîs be û zanyariyeke wî ya gelek rasteqînî û berfireh di warê vî şerî de hebe, vêca êdî wek tê xuyakirin; çî ser cûre hêzan û parvevekirina wan di meydana şer de û çî jî bizavî û bêhêzîya çekên herdu milan. Ji ber vê yekê ez her bi vî awayî lê dinêrim; ku wênekêşê vê tabloyê û yê din jî her Şerefxan bi xwe ye.

Di dawîyê de ez dixwazim spasî Kitêbxana Bodleian bikim, ku razîbûn nusxeyek ji ber vê nusxa bidestnivîs ya Şerefnamê, ji min re ji ber bê girtin. Lê, her çî hal be, neket destê min, ku heta kak Elî Kemal vî karê han ji min re hêsan kir û şand. Ez gelek spasî wî dikim û jîyana wî dirêj be. Her wiha ez gelek spas ji bo birayê rewşenbîr kak Sidîq Salih Ehmed dikim, ku bi Kurdîya xwe ya paqij ve di vî warî de alîkarîya min kir.

PERAWÊZ

(1) Di nusxa destnivîs a Mihemmedê kurê Osmanê Hesenkêfî de, 602-yê koçî û 1205/1206'ê zayînî, yanî sala koçkirina İbnu'l-Rizaz nivîsandî ye. Di vir de navê wî wiha hatîye: Bedî'uzzeman Ebu'l-'Ez Bin İsmâil Bin el-Rizazu'l-Cezerî.

Lê, di nusxa Ayasofyayê ya di bin reqema 3602'an de, ku di sala 755'ê koçî de hatîye nivîsandin, navê wî wiha ye: Bedî'uzzeman Ebu'l'Ezîz İsmâil Bin el-Rizazu'l-Cezerî. Nusxek wênekirî ya Ayasofyayê li ba min e. Zêdetir pişt bi ya Hesenkêfê têt qayîmkirin.

(2) Ev wêna han di kitêba Miqeddime'l 'İlm el-Mekanîk Fîl Hedarete el-Erebîyye, ya Macîd Ebdullah Şemsî de hatîye belav kirin. Kitêb, ji beşek kitêba bidestnivîs a İbnu'l-Rizaz û lêkolînê pêk hatîye. Di sala 1977'an de, li Bexdayê hatîye çapkirin. Cîyê gotinê ye, ku di wextê xwe de çend wênên kitêba İbnu'l-Rizaz a nusxa Kutubxana Ayasofyayê, ku di bin reqema 3606'an de ye, bi rîya Me'hed el-Mextutat a Qahîrê ket destê min. Ev li gel çend nivîsînên xwe ve, min da kak Aras Ebdulqadir ê xwendevanê Enstîtuya Hunerên Ciwanan a Bexdayê ji bo ku bide Şakir Hesênê mamostê huner. Lê mixabin, vî xwendevanê han, ew di hejmara el-Teaxî ya roja 13.11.1974'an de, bi navê xwe belav kirin.

(3) Li van serokanîyan binêre: Kovara Sumer, cilda 11'an, beşê yekem û rûpela 28'an. Gotara Zekî Mihemmed Hesên û Dîmanu'l-Fununu'l-İslamî, rûpel: 44. Hesên Paşa, el-Teswîru'l-İslamî Fî'l-'Usûru'l-Wusta, rûpel: 129, 141 û 145.

(4) Behsa vê destnivîsa Me'rîfetnamê, di kitêba Mextutatu'l-Musil, rûpela 74'an ya Dawid el-Çelebî de hatîye kirin.

Ez wisa dizanim, ku ev destnivîsa han, niha li Kutubxana Muzexana Îraqê ya li Bexdayê heye. Ji ber ku, min carek ji berêz Esamet Neqşîbendî yê berpîrsîyarê beşa destnivîsa kutubxanê re got, ku Me'rifetname bi wênekirî li balê ye. Min daxwaza hinek zanyariyên li ser Îbrahîm Heqqî û gundê wî Tillo jê kir. Her çendî hinek zanyarî dan min, lê, di hinek waran de ber bi çewtîyê de çûbû. Wek, ku Tillo li ser Kurdistanê Îraqê hesibandibû. Di rastîya xwe de, Îbrahîm Heqqî kurê Osman e û ji gundê Tilloyê yê nezîkî bajarê Sêrtê ye.

Tillo, li ser bilindayek rasta ava Botan e. Îbrahîm Heqqî, di sala 1195'ê koçî (1780-yê zayînî) koça dawîyê kirîye. Sala 1170-yê koçî nivîsandina sala Me'rifetnamê ye, ku bi Tirkî li ser çend zanistî nivîsandîne. Di kitêba bidestnivîs a me de, E'lam el-Kurd we Kurdistan, cilda yekem, wergera hejmara 45'an de, me navê 35 kitêbên Îbrahîm Heqqî nivîsandine.

Ser vê mijarê binêre; Îsmâîl Paşa Baban, Hedîye'l-Arifîn, rûpel: 4 û her wiha cardin Îsmâîl Paşa Baban, Eda'e'l-Meknûn Fî'l-Zeyl'la Keşfu'l-Zunûn, rûpel: 152-511 (Ez bawer im, ku di van reqeman de şaşîtiyek çapê heye-Elişêr).

Di roja 14'ê Tebaxa sala 1977'an de, ez çûm bajarê Sêrtê, ku bajarekî Kurdistanê Tirkîyê ye. Min dît, ku ji bo sersala koçkirina Îbrahîm Heqqî agahdarî bi dîwaran ve zeliqandine. Dema ez çûm mizgefta Sêrtê ji bo dîtina Mele Bedrîyê Tilloyî, feqîyên wî ji min re gotin; çûye Tilloyê ji bo sazkirina şahîyê. Eva han hemû salan li wir tê kirin. Her wiha eva han jî gotin; nusxeke Me'rifetnamê ya bidestxetê Îbrahîm Heqqî li Tillo heye. Mele Bedrî jî yek ji wan şêxên Tilloyê ye û ji binemala Feqîhullah e, ku bi navê Sultan jî bi nav û deng e, ew melayek baş û naskirî ye. Wî çaxê tarîxa koça dawîyê ya Îbrahîm Heqqî di agahnameyên xwe de berhev kiribû; lê, mixabin di bîra min de nemaye ka çend bû. Min di kitêba xwe ya bidestnivîs ya "Geştek Arkeolojî li Kurdistanê Bakûr", rûpela 583'an de, behsa vê şahîniya han kirîye.

(5) Ewliya Çelebî, Seyahetname, cilda çaran, rûpel: 121, 124 û 284, wergerandina Kurdî, Seîd Nakem.

(6) Berêz Dr. Kemal Mezher, di kitêba xwe ya bi navê "Mêjû" di rûpela 11'an de, nivîsiye, ku Şerefyan, di dorûberê

dawîya meha Tebaxê yan destpêka meha Îlona sala 1598'an, cilda diduyan a kitêba xwe temam kirîye. Ev zanyariya jî ji pêşgotina cilda diduyan a çapa yekemîn a Şerefnamê wer-girtiye. Vêca ne dûr e di nusxeke din a Şerefnamê de sirinceke wiha hebe; lê, di vê nusxa bidestnivîs a di destê min de, tiştek wiha nîne.

(7) V.Vilyaminov Zirnov, di pêşgotina xwe ya ji bo Şerefnamê ya çapa Rusî ya sala 1860'an de, wiha gotiye; nusxa Xanikov, Mehmud Rizayê kurê Sabir Eliyê Kerbelayî di sala 1252-yê koçî (1838'ê zayînî)de, li ber nusxeke ya bidestxetê Şerefxan bi xwe nivîsandîye, ku di dawîya Muhەرrema 1007'ê koçî dawiyê bi nivîsandinê anîye. Her di vî warî de wiha gotiye: "*Nusxa bidestnivîs ya Kutubxana Qeyser a li Petersburgê, ku di vir de sala 1007'ê koçî nivîsandîye, Şerefxan ev nusxe redakte kirîye*". Lê, ev nusxa han jî serî heta binî kê m û şaşîti tê de hene. Binêre; pêşgotina Zirnov, rûpela 14-16'an a çapa Qahîrê, ku hemû seretayî pê re çapkirîne. Hêjayê gotinê ye, Bursali Mihemmed Tahir, di kitêba xwe ya "Osmanli Muellifleri", cilda sisîyan, rûpela 72'an de, wiha dibêje: "Nusxa eslî ya Şerefnamê li gundê Tilloyê ye". Wek me got; ev gundê han li nêzikê bajarê Sêrtê li Kurdistana Tirkîyê ye. Min ji ba xwe hewlê bi destxistina wê kirîye.

(8) Ewliya Çelebî, Seyahetname, cilda çaran, rûpel: 278, wergerandina Seîd Nakem. Her wiha rûpela 242-ya nusxa bi Tirkî ya çapa sala 1314'ê koçî, Stenbol. Di wergera Kurdî de, werger, her jî ber xwe de gotin û "çend beyt şîir" li ser zêde kirîye, ku di nusxa Tirkî de tûne. Ji derveyî vê, li gor bawerîya min hinek tiştên din jî li ser zêde kirine.

Hewce bû, wergerandin mezintir bûya. Li gel tev van tiştan jî, Seîd Nakem, jî bo wergerandina vê kitêba biçûk xizmetek mezin kirîye.

(9) Ewliya Çelebî, Seyahetname, cilda çaran, rûpela 251'ê, nusxa Tirkî û rûpela 251'ê wergerandina Kurdî.

(10) K.C.Rîch, Seyahetname Rîch, rûpel: 107-108..

(11) Di derbarê zanyariya cilûbergên Kurdî de, min îstîfade ji van berêzan wergirtiye:

Şêx Mihemmedê Şêx Kerîmê Berzencî yê terzî, hoste Resûl

Mihemmedê terzî, hoste Mihemmed Elî Dewle yê terzî, hoste Ebdullah Mihemmedê Baneyî yê terzî, Hamî Begê Caf, Mele Ebdulkerîmê Şêx Hisînê Qeredaxî, Mamoste Ehmed Xoce, Mihemmed Seîd Mihemmed Ciwamêr, Xwedê jê razî be, Elî Dede, Mele Ezîzê Mele Elîyê seh haf, Elî Derwêş Mihemmed, Mihemmedê Hacî Maruf, Şukrîxana keça Lale Kerîm û jina Mele Musa Hamid, evên han xelkê Silêmanîyê ne. Ji xelkên Koyê jî; Naciye Mihemmed, Mistefa Hacî Elî û kak Tewfîq Mele Sidîq Hacî Elî.

Ev korteka han, ku ji ber pîrozîya wê wek teberik maye, ji qumaşekî bi qîmet ku jê re şalê tûrmeyî tê gotin, hatîye durustkirin. Rengê wê di navbera zer û spî de ye. Xetdar e (kitêldayî ye) û kitêlên wê bi derzîyê ji tayên sor, zer û hinek jî ji şîn pêkhatîye. Dirêjahîya piştê 120 santîm e, navmilê wê 36 santîm pan e û milê wê jî 19 santîm hatîye birîn, situîriya pembo yê ku kirîye navê 8 milîmêtre ye. Qismê xwarê tengtir tê xuyakirin.

Ya di vê kortekê de tê xuyakirin eva han e, ku hinek ji pêşîra wê ya rûyê milê çepê, dorê du santîman, yan hîn zêdetir pantir dibe, ji bo ku milê çepê bikeve ser milê rastê. Di kortekên din de ev yeka han nayê dîtin. Em dikarin bêjin; ev korteka Kak Ehmedê Şêx, nimûneke herî giring ên kortekan e. Tê dîtin, ku di warê dirûtinê de hîn ji vê jî baştir hene. Wek mîsal; korteka Hacî Seyîd Hesenê mamê Şêx Mehmûd, yanî neviyê (torunê) kak Ehmedê Şêx, ku di Şerê Derbendê Bazîyan ê di sala 1919'an de, bi gulê topên Îngilîzan şehîd bû. Eva han ne tenê di hêla dirûtinê de, di birîna xwe de jî ji hemûyan baştir û qîmettir e û bi dirûnên (kitêlên) biçûk û çendîn nexş li ser hatine durustkirin. Lê, min korteka Kak Ehmedê Şêx kir nimûne, ji ber ku eva han hein sadetir e, hem jî ji korteka çîna navendî û ya destxetê xelkê Kurdistanê re nêzîktir e.

Em dikarin bejna Kak Ehmedê Şêx, bi wasita vê kortekê bidin dîyar kirin, ku dibe li dora 170-175 santîmetran. Ev korteka han, niha li mala Kak Babe Resûlê Şêx Nurî ye. Babe Resûl, ji Silêmanîyê ye. Milekî vê kortekê nemaye. Ji ber ku di wextê xwe de, jina Xelîl Kenne, ku ji binemaleka mezin a ji xelkê Bexdayê ye, ev korteka han ji ber teberik û pîrozîyê ji bo demek ji Hefsexanê Neqîb girtîye û nivê milê çepê jê kirîye, ji

bo teberikîya wê li ba xwe hildaye. Her di van salên dawîyê de jî, yek ji xelkê Silêmanîyê ji bo derd-nexweşîya xwe pê bide şifa kirin, birîye û keça wî jî milekî wê jê kirîye û li ba xwe girtîye. Korteka Hacı Seyîd Hesenê mamê Şêx Mehmûd jî, ku min behs kir, ji qumaşekî zer ê bi qîmet e û niha li mala Faruqê Seyîd Mihemmedê nevîyê wî ye. Min du-sê wêne ji ber wê girtîye.

(12) Ewliya Çelebî, Seyahetname, cilda çaran, rûpela 251'ê Tirkî û 290'ê Kurdî.

(13) Selah Hiseyn el-'Ubeydî, el-Melabîsu'l'Erebîyye el-Îslamîyye Fî'l-'Esri'l-'Ebbasî Min el-Mesadirî'l-Tarîxîyye we'l-'Esriyye, rûpel: 108.

(14) Ewliya Çelebî, Seyahetname, cilda çaran, rûpel: 50, Kurdî.

(15) Ewliya Çelebî, Seyahetname..

(16) Di vî warî de li wênekêşên Sefewîyan binêre. Ni'met Îsmail; Funûnu'l-Şerqu'l-Ewset Fî 'Usurî'l-Îslamîyye, rûpel: 215 û 220

(17) Arnist; el-Fen el-Îslamî, rûpel: 146.

(18) Dr.Zekî Mihemmed Hesen, Medrese Bexdad Fî'l-Teswîrî'l-Îslamiyye, rûpel: 27

(19) Binêre; tabloya Wasit, di kitêba Meqamatu'l-Heriri el-Musewwere, ya Nahîde Ebdulfettah el-Ne'îmi

(20) Ni'met Îsmail; Fununî'l-Şerqu'l-Ewset Fî'l-'Usurî'l-Îslamîyye, rûpel: 200.

(21) Dr.Zeki Mihemmed Hesen, Medreset Bexdad Fî'l-'Usurî'l-Îslamiyye, rûpel: 32-37.

Nahide Ebdulfettah Ne'îmî; Meqamatu'l-Herîrî el-Musewwere, rûpel: 60. Eva han a dawîyê di bin tesîra hunerê Dibbanî ya Rojhilat û Farisî de maye û wênên xwe li gor vê regezê çêkirîye.

(22) Ji bo naskirin û teswîrkirina çend wênan, min ji wênên van hunermendan îstîfade kir; kak Îsmail Xeyat, ku ev nebûya ez ê ber bi şaşîtiyek mezin de biçûma, kak Qadir Mîrxan, kak Azad Hemdî, kak Muhsin Hisên Pîro. Ji bo aletê musîqayê yê tenburê jî min ji mamostê musîqayê Wilyam Yuhenna îstîfade kir. Ji bo aletê musîqayê yê tabloya 16'an, min pirs ji

kak Ferensî Dawud kir û ewî ji min re got; ku ev aletê han dişibe bi aletê çelo ya Avrupîyan. Ev kesê han li ser musîqayê pîspor e.

(23) İbnî Batuta, Seyahetnameya İbnî Batuta, rûpel: 238.

(24) Şerefşan, di rûpela 107-109'an de, behsa Fermanrewatîya Dunbulî dike û wiha dibêje: "Ewa rast her ew e, ku ev eşîreta han di eslê xwe de Êzîdî bûne, ji Azerbeycana Rojava hatine Botan, navça Hekarîyê û Xoyê. Akkoyunluyan qismek ji navça Hekarîyê da Şêx Ehmed Begê Isa. Di dewra Dewleta Sefewîyan de, Şah Tehmasb navça Xoyê da Dunbulîyan û ewan jî Fermanrewatîya xwe tê de damezirandin". Ji vê gotina Şerefşan derdikeve, ku ev bûyera han a dîrokî di dema Şêx Ehmed Beg de bûye. Fermanrewatîya Dunbulîyan jî bi sedan sal di navça Xoyê de maye û dîroka wan jî gelek ronî ye.

(25) Mehfüz Omer, di rûpela 62-63'an a kitêba İmaret Behdînan el-Ebasîyye de wiha dibêje: "Seyîd Xan Beg di sala 970-yê hicrî (1562/1563-yê zayînî) koça dawîyê kirîye". Lê, di perawêza rûpela 63'an de, wiha dibêje: " Di kitêba el-Ekrad Fî Behdînan a Enwer Mayî de, sala 1029'ê koçî ji bo koça dawîyê hatîye nivîsandin"; lê, di perawêza rûpela 42'an a vê nusxa Şerefnamê ya bidestnivîs de, nivîskarekî nenas, di vî warî de wiha nivîsandîye: "Hafiz Ehmed Paşa, di sala 1035'ê koçî (1625/1626 zayînî)de di êrîşa ser Bexdayê de, bi gunehkarîya serîhildanê gunehkar kir û kuşt". Ez jî wiha dibêjim; di wê salê de Sultan Murad, ji bo dagîrkirina Bexdayê hêzeke mezin şand, ku wî çaxî di bin rikêfa hêzên Ebbas de bû. Hêzên Hafiz şikestin, wek ku cara berê jî şikestibûn, li ser vê, Şah karî heta Musilê dagîr bike û bêxe bin destê Xan Ehmedê Xanê Erdelan. Li gor Şerefnamê û perawêza wê, Seyîd Xan piştî vê, mîrîtî jî mamê xwe stend û çil û du salan hikum kir.

(26) Dr.Subhî Enwer Reşîd, el-Aletu'l-Musiqiyye Fi'l-'Usur f'l-İslamîyye, rûpel: 289.

(27) Di rûpela 385'an a serokanîya pêşî li wênên Cizîrî binêre.

(28) Dawud el-Entakî, Tezkire Ūla el-Bab Wel Cami'i Lî'l 'Eceb el-'Ecaib. Behsa "İrsa" yê, 198.

(29) Di hejmarên 88-92'an ên Kovara Rewşenbîrî Nwê de, li

ser vî warê behsa nû, me pênc qisim li ser "Bizişkî Le Kurde-warî de", belav kir, ku me tê de dermanên van çend bizişkan û yan hinin din jî li gel dermanên bizişkên wek Huneyn Bin Eshaq, Razi, Ibnu'l-Bitar, el-Entakî, Mele Mehmedê Kurdî û yên hinekî din muqayese kir. Ev karê han, heta niha cara yekem e bi vî awayî bi kurî di xebata bizişkî ya millî ya Kurd de tê kirin.

(30) Di Rewşenbîrê Nwê hejmara 112'an de, me fermaneke Ebdulmecid a di derbarê medresên bi qubuh de li gel wesf û pîvanên wê, wênek û çend belgên din jî belav kir.

(31) Di kitêba Hedaret el-Dewle'l-Dostkiyye Fî Kurdistan'l-Wuste, cilda diduyan û rûpelên 380-402'an de, min bi dirêjahî behsa nexweşxana Farqînê (Meya-farqîn) û dibistana bizişkiyê ya wê kirîye. Dewleta Dostkiyan di sedsala 11'ê zayîni de hatiye danîn.

*Bersîsê Evdal, bi xetê Mihemmed Elî Hacî Reşîd, 1969, ev nusxe li ba min heye.

(32) Şerefxan, bi dirêjî behsa wê kirîye, ku çawan Mîr Şeref bi gelek zehmet karîye Fermanrewatîya Botan bi dest bixê û Mîr Ezîz û Mîr Hawend ji holê rake.

Melayê Cizîrî jî di Dîwana xwe de behsa vî Mîr Şerefi kirîye. Mela wiha dibêje:

"Sef sef me dîn Hindî û Zeng
Cengîzê hat Teymurê Leng
Xefwan reşand li dil xedeng
Teşbîhê tirên Xan Şeref".

Hinek di wê bawerîyê de ne, ku Melayê Cizîrî şiiira "Ey Şahînşahê Mi'ezzem" û ya "Xanê Xanan", ji ber rewan-gotîne, ji bo sitayîşa Mîr Şeref gotîye. Binêre; rûpela 266'an a Dîwana Cizîrî, lêkolîna Sadiq Bahaeddîn, 1977.

Ev mîrê han ku Şerefxan behsa azayeti û zîrektîya wî kirîye, heta meha Şe'bana sala 1015'ê koçî (1606/1607'ê zayîni) sax bûye. Li gel Nesuh Paşayê Walîyê Dîyarbêkrê hatiye ji bo vemirandina tevgera Mihemmed Bin Ehmed el-Tewil ê dagîrkerê Bexdayê, lê, şikestine û paş de vegeeriyane. Mîr Şeref, mîrên Kurdan qayil dike, ku alîkarîya Nesuh Paşa bikin. Yek ji wan Seyîdxanê kurê Qubatxanê Behdînanî bûye. Lê, Seyîd-

xan di bin re li gel İbnî Tewîl li hev kiribû. Roja sisîyê Şe'bana wê salê, herdu hêz; ên Nesuh Paşa û yên Mîr Şeref, gehîştin ber surhên Bexdayê. Binêre; Ce'fer el-Xeyat, Suwer Min Tarixî'l-İraq Fî'l-'Usurî'l-Mezleme, rûpel: 47, 1971. Lê, Nezmîzade di Gulşenê Xulefa û rûpela 211'an de wiha dibêjê: Şerê Bexdayê di sala 1117'ê koçî de bûye.

Hêjayê gotinê ye, Mîr İmadeddînê şair, ku guftûgoyeke wî ya helbestê ya giring li gel Melayê Cizîrî heye, li gor nivîsandina ser kêla gora wî, kurê vî Mîr Şerefî bûye. Gora wî li gel ya Melayê Cizîrî di nav gumbeteke Medresa Sor a Cizîra Botan de ye. Ji zanyarên wekî -Xwedê jê razî be- Muftî Mela Mehmudê Huserê û Muftî Seyîd Abdurrehmanê kurê Seyîd Elîyê Findikî hatîye sehkirin û zanîn, ku tu nivîsandin li ser gora Melayê Cizîrî tune û kêla wî biçûk e, di milê bakurê gumbetê de ye. Roja 10'ê Tîrmeha sala 1977'an, ez, Mele Xelefê Bateyî, Seyîd Ebdullahê kurê Şêx Mihemmedê Findikî û Mele Ehmedê Cizîrî di kevnebanê qata yekem re çûn nav gumbetê. Ji ber ku derîyê wê di ser de girtîye.

(33) Hesenkêf, ku niha Kurd jê re Eskîf dibêjin, dîroka wê diçe digihîje dewra Asurîyan û navê wê di nivîsandinê bizmarî yên wî çaxî de Hisnadekîf hatîye. Wek eva han di mad-da Hesenkêyf a di Ansîklopedîya İslamê de jî derbaz dibe. İbn Şedad, di kitêba xwe ya destnivîs; el-Ehlaqul-Xetîre Fî Zikr Umera-î el-Şam we'l-Cezîre, di rûpela 130-131'an de, wiha dibêje: *"Sê medrese(dibistan, qutabxane), çar hemam tê de ne, keleka gelek asê ye û heft derîyên Hesenkêfê hene. Her wiha serav (sirabat, serab), ku di bin de tunel heye, di nav kelê de ye û di kevir de hatîye kolan, bi pêlekanaan bi awakî fetil fetil wek helezonî heta ser Dîclê tê. Di van kunên mezin re bê ku haya dijmin pê hebe, bi devan ji Dîclê av ji kesên di nav kelê re tanîn"*. Kitubxana Bodleian jî di vî warî de zanyarîyek baş xistîye ber dest. Evên han ku behsa wan têkirin ên sedsala 13'an in.

(34) İbn Şedad; el-Ehlaq el-Xetîre Fî Zikrî Umera-î'l-Şam we 'l-Cezîre, rûpel 130. Hinek serokanîyên dîrokî yên İslamê di vî warî de wiha dibêjin: *"Bingeha vê pirê di sedsala 12'an de ji alîyê Fexreddîn Qereaslanê Ertuqî ve hatîye danîn"*. Ma-

jor Soane, bi kelekê ji Dîyarbêkrê di Dîclê de hatîye û ev pira mezin dîtîye û wiha gotîye: "*Kevanên pîyên wê yên mezin entîke ne*". Ser vê pirê gotina xwe bi vî awayî didomîne: "*Sen'etên van kevanan ji me re vê didin zanîn, ku mirov bi çendan cild, bi awakî sebir û berfirehî, ancax dikare pesnê dîroka vê netewa han a kevnare û jêhatî bide*". Hinek ji xelkê ji dibêjin: "*Romayîyan ev pira han çêkirîye*". Binêre: Major Soane, Rehle Mutenekkir el-Bilad Mabeyn el-Nehreyn we Kurdistan, cild;1, rûpel: 106, wergerandina Erebi, Fuad Cemil.

Metranê berê niha ê Mêrdînê -Xwedê jê razî be- Henna Dulpenû wiha dibêje: "*Di çend serokanîyan de hatîye nivîsandin, ku Qerearslan di sala 510'ê koçî (1116/1117'ê zayînî) de pira Hesenkêfê çêkirîye. Ew çax, yê navê wî derbaz bûyî li ser text nebûye, Dawudê babê wî fermanrewa bûye*". Binêre: rûpela 184'an a kitêba "Mardin Tarihi" (Dîroka Mêrdînê), bi Tirkî ye û di sala 1972'an de hatîye çapkirin. Nusxek ji wê di rîya berêz Cibraîl Xelef ê Metranê Mêrdînê re bi destê min ket.

(35) Binêre: Basri Konyar; Dîyarbakir Tarîhî, cilda sisîyan, rûpel: 266-279. Her wiha; Şevket Beysanoğlu, Bütûn Cephelerîyle Dîyarbakir, rûpel: 73. Ev herdu kitêbên han bi Tirkî ne.

Di sedsala 11'ê zayînî de di dema Dewleta Dostkî ya Kurdî de, gundê Benî Nuh ê ser pasewana Egil, Catre û Yemanî hat weqîf kirin. Ji ber ku ev hersê kelên Dewleta Dostkîyan nêzîkî sînorê Dewleta Bîzansiyan bûn û bi çavekî girîng li wan dihat nêrîn. İbn Bihat, ku bazirganekî mezin ê bajarê Farqînê bû, ev gundê han bi 500 dînarê Bîzansiyan kirî, eva han qazanca yek rojê tiştên xam ên firotinên wî gundî bû û kir weqfa van hersê kelên han. Binêre: Ehmed Bîn Yusuf Bîn Elî Bîn el-Ezraq el-Fariqî; Tarîx el-Fariqî, Beyrut 1974, rûpel: 167. Her wiha Hedaret el-Dewle'l-Dostkîyye Fî Kurdistanî'l-Wuste, cilda diduyan, rûpel: 324.

(36) Gotina senc (sinc), wek sulcan û sehrîc Erebi nîne, evan kirine Erebi. Ji derveyî vê, di zimanê Erebi de tîpa "sad" û "cîm" di gotinek de nayên ba hev. Eva han ji gotina sencê hatîye, ku gotinekê Farisî ye. İhtîmal e, di eynî wextê de Kurdî ji be, her di kevin de, sinc di Kurdî de hebe.

(37) Binêre: Dr.Subhî Enwer Reşîd; el-Aletu'l-Musîqîyye

Fî'l-Usurî'l-Îslamîyye, wêna 154'an a di rûpela 260'an, ya 80'an a di rûpela 379'an û ya di rûpela 259'an jî.

(38) Binêre: Wêna 88'an a di rûpela 385'an a eynî serokanîyê.

(39) Dr.Hiseyn Elî Mehfuze; Qamus el-Musîqa el-Erebîyye, 1975, rûpel: 101.

(40) Binêre: İbn Ebî Heclê, Enmuzec el-Qîtal Fî Neqlî'l-'Ewal, rûpel: 32-43.

(41) Di rûpela 76'an a Şerefnama bidestnivîs de, guherandînek bi ferq bi ya Şerefnama çapa Qahîrê û bi ya Şerefnama jî alîyê Hejarê Mukriyanî de hatî wergerandin bi zimanê Kurdî, ku eva han jî çapa Qahîrê hatîye wergerandin, heye.

Qel'eyî Xîzan nîs eslan muşahibet bî qela'i bilad Ekrad ne-daret we bî terz 'İmarat biladî 'Ecem.

Di ya bidestnivîs de ev guherîna han heye, di yê din de nîne.

Ev yeka han di rûpela 274'ê çapa Qahîrê de wiha ye: "*We biyutat derûn Qel'era nîv bi terz resit terih kirdedanet*". Yanî di cîyê "*biyutat*" de "*İmarat*" hatîye. Berêz Hejar di rûpela 402'an de wiha wergerandîye: "*jorî qela wek rîwange estîrenasan helxirawe*". (yanî; "xanîyên kelê wek rasatxanên sitêrnasîyê hatine avakirin"-Elişêr). Yanî, di vir de, di şûna "*imarat*" de "*jor*" (xanî) ên kelê bikaranîye, mebesta Şerefxan di vir de ev nîne, jî ber ku xanîyên di nav kela Hîzanê de, ku hemû xanîyên nav surha Kela Hîzanê digre nav xwe, jî bajarê Hîzanê pêk tê, yanî mebest jî vê ne tenê binayên di nav kelê de ne. Ev mebesta han, di guherîna nusxa bidestnivîs de bi başî ronî ye. Gelek car dîroknivîsan bajar bi navê "kele" bi nav kirine. Wek mîsal; Ewliya Çelebî, di şûna bajarê Mêrdînê, bajarê Sincarê û ya Wanê de, Kela Mêrdînê, Kela Sincarê û Kela Wanê bi kar anîye. Mexset jî bajar û kel wek hev in.

(42) Di rastiya xwe de, Hîzan, ku di scrokanîyan de bi awa-yê Xîzan jî hatîye binavkirin, wek bajar û melbendê navçeyekê, di pêşîya Îslamîyetê de hebûye. Weqdî, di Fituh el-Şam, cilda diduyan, rûpel: 168-169'an de wiha dibêje: "*Hîzan, Maden, Sêrt û çend melbendên din, di sala 18'ê koçî (639'ê zayînî) de di alîyê 'Iyad Bin Xenîm de hatin rizgar kirin.*"

Basil Nikitin, di kitêba xwe ya el-Ekrad (Kurd) di rûpela 129'an de, wiha dibêje: "*Hîzan, di dema Romanîyan de melbendeke herêma Miksê bûye, niha jî keleka Romanîyan di dola Hîzanê de tê dîtin*". Hîzan, li pêş dewra Hulago û dewra Nesreddîn el-Tusî û di zemanê Îslamîyetê de, navê wê di van kitêban de; Asaru'l- Bilad we Exbaru'l-Îbad, di rûpela 36'an a Zekerîya Qezwîn, Mu'cemu'l-Buldan a Yaqut el-Hemewî di behsa "Hîzan" de û di kitêba el-Lubab Fî Tehrîrî'l-Ensab a Ibn el-Esîr a di warê "Hîzan" de, bi navê "Hîzan" hatîye binav kirin.

Rê lê diçe mirov bêje, ku fêkîyên Hîzanê di wextê Hulaku de hatine danîn. Lê, fêkîyên wek bindeq(findeq) û şahbelut berî wî jî hebûne. Kesên wek Qezwînî û Yaqut el-Hemewî jî behsa vê yeka han kirine. Ji derveyê vê, ev fêkîyên han li gundê Bêdarê, Ewzîm û Xînukê yên navça Berwarê a ser qeza Xesxêrê a bakûrê navça Hîzanê jî hene. Îhtîmal e van ji Hîzan wergirtîbin, dûr nîne, di wextê Îslamîyetê de bi awakî berfirehî dest ser Hîzan de hatibe anîn û ji nû de hatibe avakirin. Eva han jî ne dûr e, ku evên han di bîra xelkê de mane. Ez wisa dizanim, ku paşvemayîyên niha yên surhên Hîzanê gelek kevn nînin, yên zemanê Îslamîyetê ne. Ji derveyê vê, ne gelek kevn e, kevirên wê jî ne neqarkirî ne, ne jî mezin in.

Hêjayê gotinê ye, ku wextê ez bi Muhemmed Wasiqê Zivingî re çûm Hîzanê, xelkê wir ji min re gotin; ev beşa rojavayê Kela Hîzanê, ku niha girîngtirîn beşa wê ye û ji kevirên spî yên neqarkirî bingeha wê hatîye danîn, ev Burca Cîhan Şah e û mala Cîhan Şah bûye. Wextê em çûn ser gora Sînem jî, ku stîran û çîrokên gelek zêde li ser hene û heta wê derecê, ku belav bûne û gehîştine navçên Mukrîyan, Hewlêr û Koyê jî, ji min re gotin; eva han xanîyê Cîhan Şahê babê Sînem e, ku gora wê di nav beşeka goristana li milê rojavayê kelê ye.

Vêca êdî ez nizanim, ev Cîhan Şahê han mîrekî Hîzanê yê piştî zemanê Şerefyan bûye, yan yekî din e û Kela Hîzanê û bi surhên wê ve jî ewî avakirîye? Di dîrokê de sê kesên navên wan Cîhan Şah in di bîra min de hene, ku ez bikarim bêjim; ne dûr e dest bi ser Hîzanê de anîbin, yanî restûre kirîbin û ev surha han jî her bi navê wan be. Yekemîn; Cîhan Şahê kurê

Mexî-şeddîn Tuxrul Şahê kurê Qiliç Arslan e, ku ji Selçukîyên Romê ye û paytextê desthilatdariya wî bajarê Kurdistanê; Erzurum bûye, di navbera salên 622-627'ê koçî (1225-1229/1230'ê zayî-nî) de hikum kirîye. Yê diduyan; Cihan Şahê kurê Qere Yusufê Qerekoyunlu ye, ku wextekî gelek zêde li Îran, Iraq û Kurdistanê fermanrewatî kirîye, di sala 872'ê koçî (1467/1468'ê zayîni) de li navça Muşê ya bakurê Bedlîsê hatiye kuştin. Yê sisîyan jî; Cihan Şahê kurê Qere Osmanê mamê Hesenê Dirêj ê Akkoyunlu ye. Di navekê re mîrên Akkoyunluyan serkariya navça Hîzanê jî kirine. Jiyana wî Cihan Şahê han ne ronî ye, evî wekî şahekî desthilatdarî nekirîye. Ez dûr nabînim Cihan Şahê Qere Yusuf, ku xwedîyê Merax û Tebrîzê jî bûye, kel û surhên Hîzanê ava, yan resture kiribe. Lê, min sehnekirîye, ku Hîzan kiribe cîyê rûniştandina xwe. Eva han jî ne ihtîmalek dûr e, ku surhên Hîzanê jî sedsala 15'an ber bi jêrtir bin.

Her çendin Cihan Şahê Qerekoyunlu, mizgefta mezin a bajarê Wanê a kevin bi minara wê ve avakirîye, ku evên han li ba Kela Wanê ne. Ewliya Çelebî di rûpela 212'ê Seyahetname (çapa Kurdî) xwe de bi nexş û nîgar behs kirîye. Lê, şûna ku bêje Cihan Şahê Qerekoyunlu, bi şaşî gotîye; Cihan Şahê Akkoyunlu.

(43) Georg Zeydan; Tarîxu'l-Temeddûn el-İslamî, cilda pêncan, rûpel: 180.

(44) Ehmedê Xanî, Mem û Zîn, Hewlêr 1968, rûpel: 101.

Rêzên şîra Mem û Zînê eva ye;

Westan û nêrgizî û seqlan

Derwaze û ew merî û meydan.

(45) Ewliya Çelebî, Seyahetname, cilda çaran, rûpel: 144, çapa Kurdî.

(46) Mem û Zîn, rûpel: 139.

(47) 'Eze Çawuş, di hêla aborî de rewşa wî baş û hespekî wî yê baş jî hebûye. Ferec Çawuş li Koyê zurne lêdixist, pişt re hat Ranîyê û dorberê du sal berî niha koça dawîyê kir. Wî çaxî nêçîr bi tajîyan dihat kirin, ne bi teyrên nêçîrê. Ev zan-yariyên min ên niha yên di derbarê listika qaşwanê de, min jî kak Tewfîqê Mele Sidîq wergirtin. Ez wisa dizanim; "qaşo-

qaşwan" ji gotina "kaşo" hatiye girtin. Ji ber ku li gelek cîyên Kurdistanê jê re kaşo tê gotin, wek li Behdînan û bi Farisî jî jê re kaşo tê gotin.

(48) Bi navê Ertuqê kurê Ekseb(Eksebo-Ekse) jî di hinek serokaniyan de hatiye. Di sala 477'ê koçî (1084/1085'ê zayîni) de Sultan Melik Şahê Selçukî, hêzek di bin serokatîya Mîr Ertuq de ji bo alikariya wan hêzên din şand, ku ewan alikariya dagîrkirina Dewleta Dostkî ya Kurd jî kiribûn. Ewan, sala din ev dagîrkirin pêk anîn. Ertuq, di sala 484'ê koçî (1091/1092'ê zayîni) de koça dawiyê kiriye, Sekmanê kurê wî di sala 495'ê koçî de bûye Mîrê Hesenkêfê û pişt re kur û neviyên wî dest danîn ser hemû navçên Mêrdîn û Dîyarbekrê.

Vêca ji ber vê yekê, Ertuq, fermanrewatî di nav van navçan de nekirîye, mimkun e, ew mîrê Ertuqî yê babê keçikê, yek ji wan kur, yan neviyên Ertuq be, ne Ertuq bi xwe be. Binêre: Dr. Ehmed Seîd, Tarîxu'l-Dewle'u'l-Îslamiyye we Mu'cemu'l-Esratu'l-Hakime, cilda diduyan, rûpel: 350-353. Her wiha, kitêba min, el-Dewle'l-Dostkîye Fî Kurdistanî'l-Wusta, cilda yekem, rûpel: 291.

(49) Di rûpela 90'ê destnivîsa Şerefnamê de navê wî "Seyîd Hiseyn" hatiye nivîsandin, yanî Seyîd Hiseynê kurê Şêx Hesên. Lê, di Şerefnama çapa Qahîrê di rûpela 324 an de, di cîyê "Seyîd Hiseyn" de "Seyîd Hesên" hatiye nivîsandin. Eşkera ye, ku nusxa bidestnivîs rastir e. Şerefxan, di pêş de wiha nivîsandîye: "*Şêx Hesênê Zerqî, keça Mîrê Ertuqî li xwe mahr kir*". Binêre: Rûpela 86'an a bidestnivîsê û rûpela 309'an a çapa Qahîrê. Heta li gor temenê Şêx jî eva han her rast be, ku ew keçik li kurê xwe mahr kiribe.

(50) Seyahetname, rûpel: 244.

(51) Seyahetname, rûpel: 114.

(52) Seyahetname, rûpel: 114.

(53) El-Mu'cem el-Turkî el-Erebî, cilda çaran, rûpel: 218, cilda yekem, rûpel: 250.

(54) Di rûpela 101'ê Seyahetnamê ya Tirkî de navê "baleban" derbaz dibe. Mamoste Seîd Nakam, li gel navên din ên teyran her navê wî bi xwe nivîsandîye û Kurdîya wî nenivîsandîye. "Baleban", di el-Mu'cem el-Turkî el-Erebî de, bi

Erebî "waq" e, ku ji sinifa "malik el-hezîn" e. Berêz Hamî Begê Caf wiha dibêje: *"Bi Kurdî navê 'baleban' helo(eylo) ye, ku bi mezinî têt girtin û li mal têt terbîyekirin. Ji ber ku mezinên wan bi dawikan têt girtin. Ger helo bi biçûkî di hêlîna xwe de bê girtin û xwedî kirin û gava mezin bibe her ji vî re jî helo têt gotin"*.

(55) Bazên Şêx Salihê kurê Seyîd Mihemmedê Muftî kurê Şêx Elî kurê Babe Resulê Berzencî, Ehmed paşayê Ebdurrehman Axa û yên Heme Axayê Ewrehman Axa li Silêmanîyê hebûne. Ebenewte û Heme Ferecê birayê wî, bazevanî ji wan re kirine. Wî wextî xercê bazewan û yên mala wî li ser xwedîyê baz bûye. Ji ber ku nedikarîn ji derveyî wî karî karekî din bikin. Divê baz xwedî û hînî nêçîrê bike. Ewan destikek dikirin destê xwe û li ser destê xwe li bazarê digelandin, **heta dibirin çayxanan jî û didanîn ser hesinekî ku bi xwe re dibirin. Ji ber ku rutubet tesîreke gelek mezin li ser bazan dike, ji ber nazîkîyê gelek zû dimrin. Bazên mezin rojê mirîşk û nîv dixwin û xwarina wan her goştê mirîşkê ye. Şêx Mehmudê nemir, li Gundê Darîkelî, baz, helo û teyrên din ên nêçîrê didan girtin û ji bo şêxên Ereban ên Xelîcê dîyarî dikirin. Lê, bi xwe nêçîr pê nedikir, ji ber ku wî çaxî bi tajîyan nêçîr dikirin. Kerîmê Ardebarêyî yê bazevan, li dorûberê sala 1920'an, Ebenewete dorê 1934'an û Heme Ferecê birayê wî jî dorê sala 1952'an de, koça dawîyê kirine. Min ev zanyariyên han ji berêz Şêx Raufê Şêx Nuriyê Neqîb -Xwedê jê razî be- ji Elî Dede (Elî Salihê Sore) wergirtine. Kak Elî, di roja 30.12.1986'an de, li Silêmanîyê koça dawîyê kir. Bîranînên wî yên gelek zêde hebûn, min û kak Ekremê Salihê Reşe, gelek feyde jê dîtin. Ji derveyî van, zanyariyên wî yên gelek zêde li ser keleporên Kurdî hebûn. Hezar rehmet li gora wî be.**

(56) Dr.Salih Hiseyn el-'Ebîdî, el-Melabîs el-Erebîyye el-Îslamîyye Fî'l-'Esrî'l-'Ebbasî, rûpel: 253. Her wiha binêre; Zinhart Dozi, Tekmîlet el-Mu'cem el-Erebîyye, cilda çaran, rûpel: 147-149.

(57) Şerefname (ya bidestnivîs), rûpel: 157 û 159. Her wiha Dr.Ehmed Seîd, Tarîx el-Duwel el-Îslamîyye we Mu'cem el-User el-Hakime, cilda diduyan, rûpel: 441-442. Şerefxan

wiha dibêje: "Sultan Osman, di sala 688'ê koçî de, serxwebûna xwe ya bi temamî wergirt". Lê, di eynî wextî de wiha jî gofiye: Sala 689'ê koçî, destpêka hatina wî ya ser textê selenetê bûye.

(58) Dr. Salih Hiseyn el-'Ebîdî, el-Melabis el-Erebîyye, rûpel: 278.


(59) Min wisa dizanî, ku Çaldiran, Çaldirana navça Wanê ye, ku niha melbendek nahîya Çaldiranê û girêdayî qeza Muradiyê (Bêgirî) yê ser bajarê Wanê û hevsînore navça Bazîdê (Bayezîd) ye. Lê belê, Mamoste Mele Cemîl, ku zanayê vê mijarê ye, di vî warî de wiha dibêje; di eslê xwe de Çaldiran, Çarderan e, yanî çar şîw (çar dol) e, li der-dorê Maku ye, yanî li Kurdistana Îranê ye. Ev çar dolên han ev in: Qizilçay, Çaldiran, Qenat û Çeşmesar e û navçeke çiyayî ye û jî 84 gundan pêk hatiye.

(60) Xwedê jê razî be, M. Elî Ewnî, di perawêza rûpela 172-175'ê "Mêjû" ya M.Emîn Zekî Beg de, deqa fermana Sultan Selîm bi Tirkî belav kirîye û wergerandîye jî. Ji ber ku dîroknivîsê mezin M.Emîn Zekî, di rûpela 164-171'an de, bi dirêjahî li ser Şerê Çaldiranê û rêkevtina Kurdan û Sultan Selîm sekinîye.

(61) Seyahetnameya Rîch, rûpel: 144.



Tablo 1: Manzarayek Nêçîrê li Hekariyê



Tablo 2: Dagirkirina Kela Dizê



Tablo 3: Amediyê



Tablo 4: Dibistaneke Nexweşxanê û Bizîşkîyê li Amediyê,
Dêmena Duduyan: Lîstika Qaşwanê



Tablo 5: Cizîra Botan û Mem û Zîn



Tablo 6: Meclisa Mirê Botan



Tablo 7. Kela Hesenkêfê




Tablo 8: Bajarê Hesenkêfê




Tablo 9: Kela Egilê (Gêl)



Tablo 10: Cardin Egil



Tablo 11: Bajarê Hîzanê Problemeke Avasaziyê



Tablo 12: Hızan



Tablo 13: Nexweşîya Demargirîyê
(Esabî-Sinîr) Çareserkirina Wê ya bi Dua




Tablo 14: Abloqa Kela Bedlisé ji Aliyê Akkoyunluyan ve



Tablo 15: Meclîsa Şerefhanê Bedlîsî




Tablo 16: Şah Tehmasb li Bajarê Xelatê



Tablo 17: Beşa Yekem; Sultan Osman



Tablo 18: Şerê Edîrmeyê



Tablo 19: Sultan Mehmed Fatih û Stenbol



Tablo 20: Şerê Çaldiranê

Jina Nû Yayınları

1-Images du Kurdistan de Turquie, **Şuayip Adhğ**

2-Dêngê Xêzkan, **Mamoste**

3-1925 Kürt Ayaklanması (Şeyh Sait Hareketi), **Prof. M. A. Hasretyan, Dr. K. Ahmad, M. Ciwan**

4-Ronahi (1942-1945 yılları arasında çıkmış olan Ronahi dergisinin tüm sayılarının bir arada tıpkıbasımı)

5-Jiyana Rewşenbîrî û Siyasî ya Kurdan (Dî Dawiya Sedşala 19'a û Destpêka Sedşala 20'a de), **Dr. Celîlê Celîl**

6-Büyük Anayurt Savaşında Kürtler (1941-1945), **H. M. Çetoev**

7-Komara Demokratik a Kurdistan (Mehabad), **Kerîmî Husamî**

8-Roja Nû (1943-1946 yılları arasında çıkmış olan Roja Nû gazetesinin tüm sayılarının bir arada tıpkıbasımı)

9-Le Bîrewerîyekanîm-I, **Kerîmî Husamî**

10-Yüzyılımızın Başlarında Kürt Milliyetçiliği ve Dr. Abdullah Cevdet, **Malmîsanîj**

11-Hêsir û Baran (kurteçîrok), **Bavê Nazê**

12-Zazaca-Türkçe Sözlük (Ferhengê Dimilki-Tirkî), **Malmîsanîj**

13-Agirê Sînema Amûdê, **M. Ahmedê Namî**

14-Na Xumxum a..., Arêkerdox: **Koyo Berz**

15-Bir Kürtle Konuşma (şîr), **Adonis Buduris**

16-Herakleitos (şîr), **Malmîsanîj**

17-Dîwana Rûhî, Şêx **Abdurrehmanê Axtepî**

18-Şairên Klasîk ên Kurd, **Abdulreşîb Yûsuf**

19-Li Kurdistanê Bakur û li Tirkiyê Rojnamegeriya Kurdi (1908-1981), **Malmîsanîj & Mahmûd Lewendî**

20-Zargotîna Kurdên Sûriyê, Amadekar: **Dr. Celîlê Celîl**

21-İki Dünya Savaşı Arasında Irak'ta Kürt Sorunu, **Prof. Şakirê Xidoyê Mihoyan**

22-Zîmanê Min-I, **Haydar Diljen**

23- Saîd-î Nursî ve Kürt Sorunu, **Malmîsanîj**

